# Li ser felsefeya jiyane civakê kurd li kurdistanê

*Abdusamet Yîgît*

*Weşanên Soran*

.
.
.
.

*Abdusamet yigit*
*Li ser felsefeya jiyane civakê kurd li kurdistanê*
*Çap 2*
*Berlin/1. hezirena-2016*
Weşanên soran
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan :
HAN-GRAFIK Verlag & Werbeagentur
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
. Tel:0049(0)3023552540
Fax:0049(0)3023552541
ISBN 978-3-940997-34-6

**Li ser felsefeya jîyane civakê kurd li Kurdistanê.**

Felsefeya civake kurd, weke felsefeyeka dîrokî ya bi hezaran salan a. Em dema ku bidest dîroka nivîsandina wê bikin, em divê ku ji destpêka serdemên şariştanîyê û her wusa serdemên berî şariştaniyên bikombûna mirovan li hevdû re mirov dikarê werênê ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman ku rewşa pêşveçûnên civakî ên li kurdistanê ku em weke ku bi civate kurd re kifş dikin, wê di zikhevdû de û bi hevdû re wê bimeşîn. Awayek û rengekî pêşketinê û pêşveçûnê ê pirrdîmenî wê di zikhevdû de wê hebûna xwe bide domandin. Em dema ku van dîmenan ji hevdû dernexin û nekin ku fahm bikin, emê nikaribin bi awayekî bibaşî hebûna civate kurd bi dîrok û pêşveçûn û her wusa têkiliyên wên navxweyî re wê fahm bikin. Bo ku em wê bi awayekî rast karibin fahm bikin û hildina li dest jî, divê ku mirov bi dîroka wê re li ser wan dîmenên wê yên di zikhevdû de jî serwaxt û xwediyê fahmkirineka bi dîrokê re bê.

Heta roja me jî, dema ku em li rewşa civake kurd dinerin, em dibînin ku ew rewşa wê ya pirrdîmenî wê xwe bide nîşandin. Di roja me de civake kurd a ku hebûna wê hê di bin hêrîşên xadar ên weke yên rejima tirk û hwd de jî wê, ev hêrîşên ku ew dikin wê li hebûna wê ya dîrokî û ji aliyê hebûna xwe ve ku pirrdîmenîya wê bibê. Ev rewşê civake kurdistanê ku heta roja me dijî, weke minaqek bêhempa ya. Em dema ku wê rastîya wê bi awayekî baş fahm bikin, emê bibînin ku serdemên wê yên pirrkevn ên berî dema şariştanîyê, dema şariştaniyê û her wusa serdemên kevnera(´antikk´) ên civakî mirov bi wê re kifş dike. Serdema mîtannî ya Medîya, wê weke serdemek giring a kevnera a civake kurdistanê bê. Her wusa, mirov dikarê vê serdema kevnera li ser dema hûrîyan û gûtîyan re hinekî din jî kevn bibê. Lê ev demên wê, wê weke demna ku ew êdî li ser aqil re dihê pêşxistin in. Her wusa, rewşên pêşketina ola êzdayî, mîtrayî û her wusa berhemên weke yên Zerdeşt ên bi navê ´zend avêsta´ û hwd, wê di vê çerçoveyê de di derbarê wê rastî û rastteqînîya wê de wê, aqilekî baş bidina me.

Di çerçoveya têgîna felsefeya civakî a civate kurd de mirov, divê ku rewşa jîyane ´koçerîyê´ weke berhemek civakî a dîrokî û pirr kevn ku wê bi mejûya civakê re hertimî xwe daya jîyandin û hanîya heta roja me jî, mirov dikarê werênê ser ziman. Her wusa, destpêka vê pergela jîyanê a

koçerîyê wê di nava xwe de wê, rewşa jîyane seretayî(´îlkel´) jî wê di xwe de wê bihawênê. Her wusa jîyane destpêkê a seretayî a demên destpêkê ku wê pêşbikevin di destpêkê de wê, ev rewşa jîyane civatkî, wê hizrekê jî bide me.

Serdemên seretayî(´îlkel´) ên destpêka civate kurd, wê her wusa, di vê çerçoveyê de bi wê jîyane wê ya bixwezayê re wê hizirna baş bibina. Jîyane civatî a li kurdistanê, wê hertimî, lingekî wê li ´deştê´ bê û lingê din wê li ´zozana´ li nava xwezayê bê. Di vê çerçoveyê de wê, pergalek ekolojikî a xwezayî wê bi jîyane civatê re wê xwe bide dîyarkirin. Em dema ku dîmenê jîyane civatî ê kurd ê seretayî(´îlkel´) bikin ku wê hildina li dest û fahm bikin, em divê ku di serî de wê jîyane koçerîyê wê baş hildina li dest û fahm bikin. Heta roja me, ev jîyane koçerîyê bi gotinên ´goçberî´ û ankû ´pênaberîya ji herêmên xwe´ re ku hatîya hanîn li ser ziman, di vê çerçoveyê de di aslê xwe de rastîya vê jîyane koçerîyê, ti carî ne hatîya hanîn li ser ziman. Tenê, hinek teorîyên bi vê rengê hatina afirandin û weke kiras, hatina xwestin ku ew li wê jîyane koçerîyê werina kirin. Lê ev kiras jî, hertimî li rastîya jîyane koçerîyê tang berevajî hatîya. Rastîya wê, nekarîya ku werênê ser ziman. Bo vê yekê, hertimî, pirsgirêka fahmkirinê li ser rengê jîyane civatî a kurd re wê, xwe bide dîyarkirin. Ev pirsgirêka fahmkirinê ku ew bi zanebûnî bê, û ne bizanebûnî bê ku ew hatibû afirandin, wê weke pirsgirêkek esasî ya fahmkirina rastîya civatîya kurdistanê jî bê. Li vir, di serî de divê ku mirov rêbaza rast nêzîkatîyê bi fahmkirinê re pêşbixê û bi wê werênê ser ziman. Pirsgirêka nêzîkatîyê, wê weke pirsgirêkek **metodolojikî** wê xwe bide dîyarkirin. Nêzîkatîya rast, wê hertimî, nêzî rastiyê bike. Di aslê xwe de mirov, dikarê nêzîkatîya rast weke nêvî bi nêvî fahmkirina wê rastiyê jî bi wê re hilde li dest. Nêzîkatî, wê weke rastîyek teorîkî û felsefîkî wê xwe bi wê re werênê ser ziman. Bi rastîya civate kurd û serdemên wê yên berê û heta roja me re wê ev, zêdetirî xwe bi wê re bide dîyarkirin. Rastîya nêzîkatîyê, wê her wusa rastkirinê bi xwe re werênê li holê.

Li kurdistanê, pirsgirêkek mazin bi rast nêzîkatîyê re xwe dide dîyarkirin. Piştî ku civate kurd, serdestî û serwerîya xwe ji dest da, wê êdî ev pirsgirêk, xwe bide dîyarkirin. Bo vê yekê, weke aliyekî teorîkî û felsefîkî, bi gelek rêbazên wê yên fahmkirinê re divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi wê re nêzîkatîya wê hilde li dest. Dîroka civatê, wê bi xwe re wê rastîya wê bi awayên wê yên pêşketinê ên bi dîrokê re wê werênê ser ziman. Her wusa, dîroka civatê, wê rastîya jîyane wê ya dema

bûhûrî bê. Her wusa, ji pêşdîtinan dûr û bi awayekî zelal hildana vê li dest û fahmkirina wê, wê weke temenekî w yê giring ê civatî jî bê.

Pêvajoyên pêşketina civatî li kurdistanê, wê her wusa, bi dîroka wê re wê xwediyê mejûyek pirr demdirêj bê. Serdemên civatî n seretayî(´îlkel´) wê, her wusa bi rengên jîyane civatê û xûy û tevgerên wê re li ser rengên pêşketina aqilê wê re jî wê xwe bide nîşandin. Têgîna xalkitiyê, her wusa, dema ku ew pêş dikeve û pê de, wê rêgezên xwe pêşbixe û wê li ser wan rêgezan re wê rêkarîyek civatî wê hin bi hin bi demê re wê pêşbikeve û wê pêvajoyên xwe yên civatî wê bijî. Bi demê re bi pêşketina aqilê civatî re wê ev pêşveçûna civakê, wê xwe bide domandin. Pêşketina aqilê civakê, wê hinekî jî bi mejûya wê ya jîyayî re bê. Her civat, bi mirov bi mirov bi andamên xwe re wê jîyankirinê bike. Wê jîyane wan, weke fêr, cerb û ezmûnek civatî wê xwe bide dîyarkirin. Bi wê re jî, wê êdî ew bi pêşketina civatî re wê xwe bide nîşandin.

Li kurdistanê, jîyane civatî, dîrok û mejûya wê, pirr kevn diçêt. Dîroka wê, dema ku em hildina li dest, em divê ku bi şîroveya xwe re herina demên berî dema şariştaniyê û berî wê jî bi wê re bikin ku wê fahm bikin. Li ser van axan, berî pêşketina jîyane civatî, mirov çawa û bi çi derfetê dijîn û piştre dema ku jîyane civatê bidest pêşketina xwe kir û pê de, wê çi derfetan pêşbixin, her wusa, di vê çerçoveyê de wê weke mijarek fahmkirina vê jîyane civatî û xate wê ya pêşketinê bê.

Jîyane civatî, li kurdistanê, wê di destpêka wê de wê, li dora çemên wê yên weke diclê û firatê û herêmên wê yên avî wê bibê. Em bi wê re jî divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku em, weke ku bi jîyane koçerîyê re dibînin, wê her wusa wê jîyankirin li deverên avî û geş wê xwe bide hevdû. Minaq, ji herêmên kurdistanê ên weke serhedê, wê malbatên koçer, wê bi koçerî, wê herinan herêmên ber avê çemê diclê û firatê û li deverên wan ên baş ku gaya şîn a, wê li wan demsala xwe derbas bikin. Wê, di hundurê wê demsalê de jî wê sawalên xwe biçêrênin û wê ji sawalên xwe zêde şîr, hirî û hwd wê hildin. Ji şîr wê mast, panîr û hwd, bi gelek cûreyên din ên xwarinê re wê çê bikin. Hirî û hwd jî, dema ku ew hildan, wê ji wê ji xwe re cilikên li ser rûniştinê, li xwe kirinê û hwd, wê ji wan çê bikin. Bi vê rengê wê, jîyane xwe bidina domandin. Di vê çerçoveyê de wê jîyanek dewlemend bi xwezaye wê re wê derbas bikiran. Jîyane koçerîyê, wê di nava xwe de wê, gelek dewlemendiyan bi vê rengê wê bihawênê. Lê em divê ku vê yekê jî bi wê re werênina ser ziman ku wê, pirranîya dewlemendîyên wê, wê bi xwezayê û jîyane bi xwezayê ve girêdayî bin.

Di vê jîyanê û rengê wê de wê, destûr û zagonên xwezayê û jîyane xwezayê wê li wê serdest û serwer bin. Wê li gorî destûr û zagonên xwezayê wê werê jîyandin. Bo vê yekê, ku mirov hertimî vê jîyanê bi gotina jîyane xwezayî re werênê ser ziman jî wê ne xelat û rast bê.

Rastîya jîyane xwezayê ku mirov bi wê re û di nava wê de dijî, wê bi derfetên wê yên ku ew dide me re wê bi sînor bê. Bi vê re dema ku mirov bahse vê bike, divê ku mirov biawayekî binxatkirî bahse têgîn û fêrbûna jîyankirina bi xwezayê re bike. Mirov, dema ku ew, dinava jîyane xwezayê de dijî, êdî mirov fêrî wê dibê. Wê çawa bi wê re bijî û ji wê sûdbigirê, wê fêrî wê bibê. Li vir, fêrbûna bi xwe re wê, aliyekî giring ê vê jîyane bi xwezayê re bê. Jîyane xwezayî, di vê çerçoveyê de ku mirov, çendî dikarê ji wê sûdbigirê û bi wê re bijî, wê bi rengê fahmkirna ji xwezayê re wê biderfet bê. Mirov, dema ku di nava jîyanekê de bijî, fahmkirna wê jîyanê bi ezmûnan wê bi derfet bê. Bi heman rengî, wê di jîyankirina bi xwe re de jî wê wusa bê. Mirov, jîyan dike û ji wê jîyane ezmûn dike, bi wê ezmûnê re fêr dike û bi wê fêrkirinê re jî wê fahm bike. Bi vê rengê, wê pêvajoyek têgihiştinê bi jîyankirina bi jîyane bixwe re ku ew di ahengekê de ya wê, xwe bi mejiyê mirov re û di hundurê mejiyê mirov de wê bide pêşxistin û domandin. Destûreka jîyanê jî wê, bi ezmûnî û fêrbûnê bê.  Fêrbûna mirov a ji jîyane wê hertimî bi aqilê mirov re wê bibê.

Dîroka civake kurd a seretayî(´îlkel´) wê me bi xwe re bibê heta serdemên destpêkê. Her wusa, em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê ev rewşa civake kurd, wê hertimî li wê xwe bi serdestî bide dîyarkirin. Pêşveçûnên cvatî, wê ji xwe re xatekê bidina afirandin. Em dema ku her wusa, dihêne serdemên şariştaniyê, êdî em dikarin dem bi dem li gorî vê xatê wê werênina ser ziman. Dem bi dem çi pêşveçûn bi aqilî û hwd, derketina û çawa û bi çi şêwayê civat bi bandûrkirina, wê êdî bi wê re werê ser ziman. Civate kurd, î ro, dîroka wê ya şariştaniyê, em ku em werênina ser ziman, em divê ku bi demê re dem bi dem wê bi pêşketina wê re û bi wan pêvajoyên wê yên pêşketina bi şariştaniyî re werênina ser ziman.

Li vir, em divê ku vê yekê jî bi awayekî vekirî li vir werênina ser ziman ku wê civate kurd, dîroka wê bide nîşandin ku wê, ew hertimî bi dudîmenî biserekeyî wê xwe bide domandin. Dîmenek wê, li ser reng û xate pêşketina bi jîyane bi xwezayê a weke jîyane koçerîyê û hwd re bê. Dîmenê din ê duyem jî, wê li ser pêvajoyên şariştaniyê ên ku wê bibin wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, li vir, dema ku mirov bahse xate

şariştaniyê û pêvajoyên wê ên pêşketinê bike, wê têgînên civatî ên ku dem bi dem derketina li holê jî wê, di dewame wê de wê xwe bibîna berbîra mirov. Minaq, ji serdemên sûmerîyan, têgînên yazdanî û hwd ku di nava civate kurd de pêşketina û dem bi dem li dora hizrên wê yên ku wê, bi wê re werênina pêşxistin ku wê li dora wana bicivatî wê xwe birxistin bike, wê bibin. Ev jî, wê dem bi dem xwe bidina dîyarkirin.

Civate kurd, wê di vê çerçoveyê de weke civatek nûmîne ku em dikarin ji wê, gelek tiştên bitêgînî bi dîroka wê re kifş bikin, wê bibê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku têgîna yazdaniyê ku wê pêşbikeve, wê bi komelî û ankû civatî wê pêşbikeve. Wê temenê wê biafirênê. Pêvajoyên têgîna yazdaniyê, bi serdestî, li ser pêvajoyên şariştaniyê re wê ji serdemên sûmerîyan û hwd, wê xwe bidina dîyarkirin û domandin heta li roja me. Bi wê re jî wê, pêşketinê bi jîyane civatî re wê bidina afirandin.

Jîyane civatî, ku pêş dikeve, wê êdî ew bê temenê jîyankirina bi rêgezî a di nava destûr û zagonên jîyanê de. Ji xwe, jîyane şariştaniyê, wê weke jîyanek ku ew bi destûr û zagonan hatîya bi rêxistin kirin a. Emê vê yekê bi xate pêşveçûna jîyane civatî re dem bi dem wê kifş bikin. Jîyane civatî û her wusa mijara têgînên weke yên bawerîyî ên weke yên yazdanî û hwd, wê di vê çerçoveyê de weke mijaraka giring ku miirov divê ku wê baş fahm bike bê. Her wusa jîyane civatî, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastîyekê bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku jîyane civatî, piştî pêşketina jîyane şariştanî re wê mifteyên xwe yên bîrkirin û zanebûnê wê biafirênê. Her wusa destûr, zagon, şîrove û salixkirinên ku wê di vê çerçoveyê de werina kirin, wê vê rewşê wê bidina dîyarkirin. Em li vir, di nava jîyane civatî de wê rastiyê biawayekî vekirî kifş dikin ku jîyane civatî, wê hertimî di nava xwe de wê weke dareka ku hertimî çiqilên nû bi wê re şîn dibin û xwe didina li der, wê di nava wê de jî wê, bi vê rengê wê bi jîyane civatî re wê pêşveçûn wê bibin. Wê têgînên nû wê li ser aqil re wê dem bi dem wê derkevina li holê. Wê kom bi kom wê rêxistiniyên nû wê xwe bidina dîyarkirin. Li vir, weke destûreka jîyane civatî ku mirov ji xate pêşketina jîyane civatî a civate kurd fahm dike, wê ew bê ku wê hertimî, li bi hevdû re jîyankirinê wê were lêgerîn. Ev jî, biqasî ku ji wê sedema ku wê li herêmê gelek xalkên ku hebûna wan bi demê re derketîya li holê ku wê bi hevdû re bijîn, wilqasî jî wê ji sedema aramiya di nava jîyanê de ku ew dixwezin ku bi wê bijîn, wê ji wê were. Bi vê rengê, wê ev rewş êdî bi demê re dem bi dem, wê di temenê pêşxistina

têgîna jîyane bi hevdû re jîyînê re wê xwe bide dîyarkirin. Minaq, weke ku kurdan, çawa ku di nava jîyane xwe ya civatî de ji aliyekî jîyane li zozana a koçerîyê kirina ku wê bijîn û ji aliyê din ve jî ´jîyane li deştê´ ku em wê dikarin weke jîyane şariştaniyê û jîyankirina wê jî werênina ser ziman, wê ahengek di nava wan de were çêkirin. Her çendî ku weke du lingên jîyanî ên ku dem bi dem wê nakokîyê jî bi hevdû re wê bijîn bin jî, lê wê ev weke rewşna teybet ên bi pêvajoyî ên jîyane civatî bin. Bi demê re mirov, wê li jîyankirina xwe wê binerê. Kî çawa dijî û dema ku ew bi wê rengê dijî ku ew ancama wê baş a û ankû ne baş a, wê jî werina kifşkirin di mejî de. Ev, di aslê xwe de wê nîşanaka pêşketina xêva civatî a jîyanî jî bê.

Li vir ku em bahse xêva civatî bikin, emê li ser jîyankirin, ezmûn û fêrbûnan re herin. Ev wê, her wusa rastîya wê bi pêşveçûnên wê re bide dîyarkirin. Hebûna civatî, bi têgînî, wê xwe bi mejûya xwe re wê bide pêşxstin. Her jîyankirin, wê weke fêrekê wê xwe di mejiyê mirovê andamê civatê de bide rûnandin. Vêca piştî kifşkirin û bidest nivîsandinê kirin jî wê, rewşa xêvkirina civatî a di jîyanê de wê zêdetirî pêşbixe. Nivîsandin, wê karekî bi vî rengî jî wê bi xwe re wê bibînê.

Di destpêka pêşketina jîyane şariştanî de wê mirov, bi mejiyê xwe re tişta ku dît, wê xîz bike. Her wusa, ew xîzkirina ku pêşî li ser hêtên şikeftan ku wê bike, wê weke destpêkekê bê ji jîyane civatî a bihiş re. Piştre wê bi nivîsandinê bike. Her tişta ku hat xîzkirin û ankû piştre ku ew tê nivîsandin, wê bê malê girseyê. Wê bê aqilekî girseyê. Ev jî, wê her wusa wê hin bi hin hebûna girseyê bi derûnî û civaknasîya wê re pêşbixe û derxe li holê. Hebûna jîyane jîyankirina bi hev re a di destpêkê de wê du sedemên wê yên giştî û giring wê hebin. Yek, ew a ku mirov bi teneserê xwe li hemberî wê xwezaya mazin piçûk a û bêhêz a. Dema ku ew bi hevdû re bi hinek mirovên din re tevdigerihê, wê bi hêz bibê. Wê xwe bihêz hîs bike. Di nêçîrkirinê de wê bi hevdû re bikomî wê bikin. Her wusa, li hemberî hêrîşên ku wê bibin, wê mirov ne bi tenê bê. Ev rewş, wê weke rewşek teybet a giring ku mirov dikarê wê werênê ser ziman bê. Sedema din a duyem a bi hevdû re jîyankirinê, her wusa wê ji xizmtiyê û girêdana bi xwûnê destp bike. Mirov, li vir, bi ben û girêdanên fizyolojikî bi hevdû ve girêdayî ya. Rewşên weke dêyêkti(´dayiktî´), bavîtî, xwûşktî, biratî û hwd, wê bi rengê naqşaya xizmtiyê wê dirêj bibê. Di vê rewşa bi hevdû re jîyankirinê de wê mirov, lênepirsê ku ew çawa û çima bi wan re bikomî dijî. Ev rewşa xwe, wê hêstekê bi mirov re bide çêkirin. Mirov, dema ku di nava wê koma xwe

de ya, wê ew xwe bi hêstîyarî di germiyekê de hîs bike. Kengî mirov wê qadrê wê jîyane bi hevdû re di wê demê de wê kifş bike? Kengî ku ew ji komê dûrket û bi tenê ma. Hingî wê xwe bi tenê hîs bike. Wê bîra komê bike.

Mirovê ku bi malbatî bi hevdû re bi komî re dijîn, çendî ku bi girêdana fizyolojikî û biolojikî bi hevdû ve girêdayîna jî, lê wê hin bi hin li ser wê jîyankirinê re wê ben û şêwayên din ên girêdanê wê bi wê re biafirin. Minaq, bi hîs û derûnîyê, bi têkilîdanînên zayendî û civaknasîtîyê û hwd, wê girêdan bi mirov re biafirê. Mirov, di vê çerçoveyê de wê êdî bi şêwayên din wê bê girêdan. Bi demê re wê li ser jîyankirin û ezmûnên jîyankirinê re wê benên derûnî, civaknasî û hwd, wê zêdetirî derkevina li pêş. Di destpêkê de wê kom hemû weke komên malbatî bin. Weke ku çawa ku wê bi kurdan re weke ku wê bi şêwayê aşîrîyê û hwd re wê xwe bide domandin. Aşîrî, wê hertimî bi girêdana bi xwûn û xizmtiyê re wê xwediyê temen bê. Di nava malbatê de hin bi hin dema ku li malbatê endam zêde dibin, wê ev jî bi demê re wê bê temenê afirîna komînê û piştre aşîrtiyê. Ev rewş, her wusa, wê êdî pêşbikevin. Piştre jî, wê li ser wê re tenê têkiliyên têgihiştî ên serdest wê xwe bidina dîyarkirin. Ev şîwayên têkiliyan wê bi demê re wê weke şêwayê têkiliyan ê sereka wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser ziman ku em weke ya serdemên seretayî(´îlkel´) re kifş dikin, wê di nava civatên kurdan de jî wê hertimî wê kalîktî û ankû pîrîtî weke çîneke serdest wê hebe. Ev rewşa civatî, ku piştre bi têgîhiştin û hiş dibê û xwe dide domandin jî, wê weke rewşek giring a vê rengê jîyanê bê. Pîrîtî, wê piştre di nava rengên bawerîyên civatî ên ku wê pêşbikevin jî, wê weke sazîyeka bilind a bi sazûmanî û bi pêşengîyê dike û hertimî serdest a, wê were tefsîr kirin. Di destpêka jîyane komînal a bikomî de wê kom hin bi hin wê biafirin. Piştre jî wê ew kom, xwediyê serokna xweza bin. Ev jî, dapîr û bapîr û ankû mirovên weke wan in. Piştre jî, wê mirovên weke ku ew bihêz in û bi hêzîya xwe derdikevina li pêş wê derkevina li pêş. Ev jî, wê bi sedema parastin û karîna jîyankirin û ankû dana jîyankirinê a bi xwezayê re wê, di temenê wê de bê. Rewşa serdestbûna dapîr û bapîran di nava jîyane komê de wê weke rewşek teybet û giştî a civatî bê. Dapîr û bapîr, bi jîyankirina xwe re wê derkeve li pêş. Ew(´dapîr´ û ´bapîr´), mirovna temen dirêj in. Ew pirr jîyan a û di serê wan de gelek fêr û ezmûnên jîyankirinê hene. Wê ev jî ji wan re bê alikarî ku ew serdest bibin.

Rewşa dapîr û bapîran ku ew weke çînek serdest a civatî na, wê piştre ev rewş di nava pêşketina jîyane civatî a bi komî de wê, were bi têgihiştin kirin jî. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku bawerîyan civate kurd ên pirr kevn û xwediyê dîrokek bi hezaran salan a ên weke êzdatîyê, wê di wê de jî pîr weke dapîr û bapîr, wê bi ´pîrozî´ bina xwediyê mertebeyekê jî. Wê gotina wan newê lê pirsîn. Wê ew hertimî weke hêzek serdest bin. Ku ew ji andamên civatê ên din re bibêjin ku ew herina mirinê jî wê herina mirinê. Ev rewş, heta roja me jî, dinava civate kurd de weke rewşek bi têgînî û pîroz a rûnîştîya. Heta roja me jî, di nava civatê de wê ti kesekî nikarîya ku vê rewşê bike berlêpirsînê û li dijî wê gotinê bibêjê. Mirovê pîr, ku ew dapîr bê û ankû bapîr bê, wê di reng pêşeng û serokekî de bê, wê di reng û şêwayê bawermendekî de bê, wê di reng û şêwayê zane û filosofekî de bê û wê di reng û şêwayê mazinekî gihiştî û gihayî de bê. Ew hertimî weke yê li pêş rûniştî û ku wê mafê gotina pêşî a bi lêvkirinê wê ya wan bê.

Ev rewşa ku em di şêwayê jîyane mirovên komî ên berî demên şariştaniyê de dibînin, wê piştre jî di nava jîyane şariştaniyê de jî wê pêşbikeve û bi hiş û têgihiştin bibê. Wê ev rewş, weke rewşek teybet bê. Mirovê pîr, weke rastîyek jîyanê a bizane wê hertimî xwediyê pêşengîyek xweza bê.

Mirovê ku ew nû tê dûnyê û zêde ne bi fêr û ezmûn û zanebûn a, di wê rewşê de wê ev mirovê pîr, wê weke mirovê bi fêr, ezmûn û zanebûn bê. Her wusa di vê çerçoveyê de wê derkeve li pêş. Mirovê kal, wê ji wê girseya nezan, bêfêr û bêezmûn re wê bê fêr, ezmûn û zanebûn û wê rêya wan şanî wan bide. Wê herkesek wê li gorî gotina wan wê bi rê ve herê. Wê weke wan bike. Wê weke gotina wan bijî. Ev rewş, wê piştre li berdiclê û firatê, wê bi civate kurd re wê xwe bi hiş bike û bide domandin. Civate kurd, ew teybetîya wê ya ku ew hertimî bixwezayê re dijî û xwediyê jîyanekê ya, wê di vê çerçoveyê de wê êdî xûy û tevgerên xwezayî ên bi vî rengî ku ew berê hebûna, wê di nava wan de jî wê hebin û hebûna xwe bidina domandin.

Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de bawerîya yazdanî a civatên kurd, ku ew li ser wê re wê civatbûnekê bi têgînên hizrî û çandî bi wê êdî wê bi xwe re bidina çêkirin, wê di wê de jî ev rewşên ku em bi şêwayên jîyane seretayî(´îlkel´) re kifş dikin, emê bi wê re jî kifş bikin. Her wusa, wê sazûmanaka bi vê rengê ku ew xwezayê û jîyane xwezayê dike nava xwe de wê bi xwe re pêşbixe û têgihiştin bike.Hişmendîya jîyane civatî, wê di temenê xwe de hiş bihawênê. Dema ku jîyane civatî hişmendiyê bi xwe

re bihawênê, wê çaxê kê wê yê ku wê karibê wê hişmendiyê bi fêr û ezmûnên xwe re bide nîşandin bê? Wê ew dapîr û bapîr bin. Di nava jîyane civatî û destpêka pêşketina wê de wê, dapîr û bapîr, wê xwediyê weyn û serokatîyek sereka a bi jîyane civatî re bin.

Pêşketina jîyane civatî, li gorî vê encama ku em bi aqilê xwe digihinê de em, divê ku wê bi wê zanebûna dapîr û bapîran re bide destpêkirin. Divê ku em wê fêr, ezmûn û zanebûna wan ya bi temenê wan re di temenê wê pêşketinê de di destpêkê de hildina li dest. Ev, wê weke aliyekî giring ê ku em divê ku wê, weke aliyekî teybet hildina li dest û wê werina ser ziman bê. Li vir, divê ku mirov wê zanebûna wan bibîr bixin. Ew dapîr û bapîr, weke mirovna ku ew bi temenê xwe re dijîn û dibînin û fêrbin in. Bi wê re wê bina weke mirovna ku ew dibînin ku wê ya rast û ne rast wê çi bibê. Tişta rast û ne rast, wê li gorî lêhatin û lêkirina li pêşveçûnên jîyan mirov a keseyetî û civatî bê. Li vir, wê asta jîyankirina mirov û ya ku mirov wê ji xwe re rast dibînê û mirov dikarê xwe bi wê bide jîyankirin û jîyane xwe bide domandin, wê, weke pîvana wê rastiyê û nerastiyê bê. Di fahmkirina vê de jî wê pîr, weke mirovna temen dirêj ku ew bi ezmûn û cerbkirina bin. Wan bi jîyane xwe re jîyankirina û dîtina. Her wusa bi wê re jî êdî weke ku ew fêr û ankû ezmûn ezmûnkirina. Jîyan kirina. Bi wê re jî, ew ji çi re bi fêde ya û ne bi fêde ya, ew dîtîna û kifşkirina. Heta roja me, gotinaka giring ku ew di nava civatê de dihê gotin heya. Ew jî, zanebûnê didênê aliyekî û ezmûnkirina bi fêrbûna bi jîyankirinê re didênê aliyekî. Ew gotina civate kurd jî ew a ku ew bi vê rengê dibêjin ku ”yên ku zêde xwandina bizane na û yan yên ku pirr dîtina bizanebûn in.” Ev gotin, wê di demên piştre ên şariştaniyê de wê were gotin. Lê ev gotin, wê tiştekî pirr giring wê ji me re bibêjê. Ev gotin, wê ne gotineka roja me bê. Ev gotin, wê gotineka wê dema ku wê êdî zanebûn pêşbikeve û bihiş bibê û mirov êdî bi wê re zanebûna xwe dinivîsênê, di wê demê de hatîya gotin. Weke gotinaka giringîya fahmkirina ji zanebûnê jî dihênê ser ziman. Lê ji aliyê din ve jî wê, weke gotinaka ku wê fêrbûn, ezmûn û zanebûn li ser temendirêjehiyê re wê werênê ser ziman. Mirov, dema ku ew zêde dijî, ew fêr dike, biezmûn dike û bi wê bizanebûn dibê. Her timî hewldana çêkirina ahengê di nava mirovê temendirêj ê bi ezmûn û ê piştre ku bidest xwandinê kirî re wê xwestin ku ew were çêkirin. Wê fêrbûn, ezmûnkirin û zanebûna mirov a bidîtina mirov a bi temenê mirov re wê di asta xwandina di asta bilind de wê di nava civate kurd de wê, were hanîn li ser ziman. Ev gotin jî, gotineka vê rewşê ya ku ew bi wê êdî vê rewşê dihênina ser ziman.

Bêgûman, ev rewşa fêrbûna bixwandinê û ya bi dîtina bi temen re, em divê ku hinekî din jî di vê çerçoveyê de li ser wê bisekin in.

Di destpêkên şariştaniyê û pêvajoyên wê yên pêşî de wê, ezmûn û fêrbûn, temenê girtina zaninê bê. Her wusa, bi dîtin, jîyankirinê re wê mirov ezmûnê bike. Bi wê re jî wê fêr bike. Piştre jî wê bi wê re wê zanebûnê bidest bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de têkiliya jîyanê û zanebûnê wê bi jîyankirinê û ezmûnên wê re wê biafirê. Zanebûn, wê di vê çerçoveyê de wê bihiş, wê bikeve jîyane mirovan de. Mirov, wê bi kirinên xwe re wê, wê fêr bibê. Her wusa, wê bi dîtina xwe re wê nas bike. Di nava jîyanê de wê gelek sawal û ajal wê bijîn. Di nava xwezayê wê gelek tişt, sawal, ajal û nebet wê bijîn. Mirov wê van nas bike. Wê ji kîjan sawalê sûdbigirê wê fêrî wê bibê. Wê bibînê ku kîjan ajal bi zirer a. Bi wê re jî wê kifş bike ku kîjan nebet wê weke şînahî, wê baş bê û ne baş bê. Mirov, çendî ku wan fêr dibê, êdî wê bi wan wê bidest jîyankirina jîyane xwe bike. Mirov, vê bi vê rengê bi ezmûn û fêr bike.

Her wusa, fêrbûna bi xûy, tevger, kirin û nêzîkatîyên mirov re wê, derkeve li pêş. Her wusa, mirov wê tiştan bibînê û bi demê re xosletên wan kifş bike. Minaq, dema ku mirov birçîya, divê ku xwarinê bixwe. Dema ku tî ya, divê avê vexwe. Dema ku ew sar û cemidîya, wê li xwe bike. Bi v rengê wê li ser jîyankirin û rewşan re wê, kifş bike. Kifşkirina mirov a di jîyane mirov de wê, bi vê rengê wê bibê. Jîyane mirov, wê di vê çerçoveyê de ji destpêka wê û heta dawiya wê, wê weke pêvajoyek fêrbûnê bê. Mirov, piştî ku fêrî axiftinê bû û zimanê xwe pêşxist û pê de, wê bidest hanîna li ser ziman a serborîya xwe bike. Ev jî, wê bi serê xwe weke şoreşekê bê. Fêrbûna axiftin û nivîsandinê, wê êdî rewşekê din ya biast, rada û pîvan a jîyankirinê bê. Mirov, wê bidest nivîsandina serborîyên xwe bike. Weke ku gûtîyan bi jîyane keyê Urukî Gilgamêş re kir, wê her wusa êdî serborîyên jîyanî wê werina nivîsandin. Ya ku ew tên xwandin, wê ev bin. Ev serborî, wê serorîyên zanînî bin. Her nivîsandin, wê fêrek bê. Her wusa xwandin, wê bi xwe re girtinek bê. Lê mirov, heta ku tê wê astê ku ew bixwênê û di mejiyê xwe de bigirê, wê gelek pêvajoyên demdirêj ên bi fêrbûna bi ezmûnan ji jîyan û xwezayê wê derbas bike.

Heta ku dem werê dema nivîsandin û ji wê xwandinê û ji wê xwandinê girtinê, wê bi meji, laş, rêyên girtinê ên weke gûh, çav û hwd wê pêşveçûnên mazin ên fîzyolojikî wê bibin. Têkiliya dîtina çav, bihîstina gûh û hwd, a bi xêvê re wê zêdetirî bi ast, rada û pîvan bibê. Di çerçoveya rewşa girtina meji de wê, ev rêyên girtina mirovî, wê ew

koordînasyona ku bi xêvê re çê dikin, wê xwe li gorî wê amede bike. Her wusa, wê hêst û hîsa bi xwandinê a girtinê, wê zêdetirî wê xort bike. Wê mejî û di wê de xêv, wê karibê bi hevdû re di vê çerçoveyê de wê ahengekê çê bikin. Bi vê rengê, dema ku mejî xwand, wê bi wê xwandinê re wê mejî bi xêvê re wê girtinê bike. Her wusa, mejî wê li ser hişkirinê re wê êdî pêşbikeve. Bi xêvê re wê, rewşên weke jiberkirinê û hwd, wê pêşbikevin. Ev rewş, wê temenê xwandin û girtina ji wê, wê biafirênin. Li vir, rewşa jiberkirinê a bi xwandinê re teybet a. Afrînerîyek bi wê re heya. Xêv, wê afrînerîyê, bi wê re bikardihênê. Her wusa, her girtina mirov a ku ne weke ya ji wê hatina girtinê û ankû ew binetera ku hatî xwandin a, wê hinekî bi vê rewşa afirandina xêvê ve girêdayî bê.

Hişmendîya li ser ziman û ankû gotinên ziman re ku wê pêşbikeve, wê di vê çerçoveyê de wê hin bi hin derkeve li pêş. Mejî, di vê çerçoveyê de wê bi xwandinê re wê razberîyek şenber a xwe ya xwemalî wê biafirênê. Ji xwandinê girtin, hinekî jî wê bi şêwayê razberîyek şenber bê. Lê ev rewşa bi razberîya şenberî ku ew dibê, wê li ser dîtin û ezmûnan re wê bi şêwayê şenberîya razberî ku ew di afirê re bê. Bi xwandinê re wê mejî, fêrî wê hizra razber bi şenber bike bibê. Lê bi dîtina bi ezmûnê re wê mejî, bi rewşa ku wê dît re wê di mejî de wê bi wêne bike ji ya ku dît û wê ew dîtina wê, weke dîmenekê wê dimejî de wê hebûna xwe bide dîyar kirin.

Fêra bi ezmûna bi xwandinê re ya, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Lê fêra bi ezmûnê fêrkirinê wê bi jîyankirinê bê. Bi xwandinê, wê ew pêwîstîya jîyankirinê, wê li wê ew nebê. Lê ya jîyankirinê wê bi ezmûnkirinê re bê. Kal û pîrên ku ew temendirêj bûn, wan dijîya, bi wê re ezmûn dibûn û bi wê re fêr dibûn û piştre jî bi wê re digihiştin zanebûnê.

Kal û pîr, di her civatê de wê weke andamên wê civatê ên pîr wê hebin. Ankû, mirov dikarê bibêjê ku wê weke andamên wê civatê ên temen dirêj wê hebin. Pêvajoyên jîyanê ên ku ew dijîn û her wusa ezmûnên ku ew bi xwe re çê dikin, wê wan li wê jîyane civate wan jî serdest bike. Di vê çerçoveyê de wê ew jî weke beşek civatê ên ku bi zanebûna xwe serdest wê derkevina li holê.

Di serdemên berî demên şariştaniyê de wê kombûn ji nû ve bibê. Di wan deman wê de mirovê herî bihêz, bav û dê wê weke yên serdest wê hebin. Her wusa, dayik, wê di nava civatê de wê weke yek afrîner wê serdest wê hebe. Em dema ku li xate pêşketina civatî dinerin, em dibînin ku wê di demên destpêkê ên şariştaniyê û ankû berê wê, wê fîgûrên jinê

ên serdest û ankû weke serok wê derkevina li pêş. Her wusa, ji pêvajoyên destpka şariştaniyê, weke fîgûrna jinan ku ew li ser taxt rûniştî na û ku weke hêkel bi kevir hatina çêkirin mirov dibînê. Ev fîgûr, di derbarê jîyane demên bûhûrî ên civatî ya destpêkê de wê hizirna bide me.

Ev tiştekî wê bi xwe re bi têgînî bi me re bide çêkirin, ev jî ew a ku wê bê dîtin ku civatîtî, wê li dora jin, dê û bav di çerçoveya weke sazîyek civatî pêşketina malbatê re wê pêşbikeve. Malbat, temenê wê, wê hin bi hin were avêtin. Malbat, wê li dora dayikê û zarokên wê û bi wê re bi hebûna bav re wê xwe bide dîyarkirin. Dê bi zarokên xwe re wê li cihekê bê niştecih. Wê bicih bibê. Derfeta wê, zêde ji gerîn û geryanê re namênê. Bi heman rengî, çendî ku mêr derfeta wî ya gerîn û geryanê hebê jî, ew jî wê bi malbatê ve hin bi hin were girêdan. Di hundurê malbatê de wê ne tenê dê û zarok, weke yên ku ew bicih in wê hebin. Her wusa dapîra pîr û bapîrê pîr jî wê hebe. Ew jî, bi heman rengî wê hebin. Pîrîtî, çendî ku ji aliyê temen dirêjîya xwe ve bizanebûn û serdestiyê ji mirov re dihênê, biheman rengî, bi di nava wan salan de çûyînê re wê ew jî, wê kal bibê. Kalbûn, wê sînorê tevgerbûnê û aktivbûnê kêm bike. Mirov, wê nikaribê wusa zêde bi aktiv bê. Bo vê yekê, mirov, mihtacî bi wê dibînê ku mirov xwe li deverekê bicih bike û di aramiyê de bijî. Ev rewş, wê zêdetirî, ji aliyê bûna niştecih ve wê mirov, amede bike. Her wusa, di vê dema  mirov a pîrbûnê de wê hingî zarok û nêwîyên mirovê kal wê li dora wan bin. Bi vê rengê, wê bina malbatek mazin. Ev rewşên jîyanî, wê zêdetirî li gorî rewş û jîyane xwezayê bin. Çendî ku mirov, di nava jîyane xwezayê de wê, bigihijê derfetên xwe jîyankirinê, wê bi heman rengî wê gelek rewş û telûkeyên ku wê ji jîyane mirov re xaterîyê biafirênin, wê derkevina li holê. Ev jî, wê ji aliyekî din ve wê mirov, bike rewş û pozisyonekê de. Ev rewş û pozisyon, wê rewş û pozisyona parastina jîyane xwe bê. Çendî ku mirov karîya xwe biparêzê ji wan xaterîyên ku ew rastî wan tê, wê karibê jîyane xwe bide domandin. Ev jî, wê ib nasîna xwezayê re wê bibê. Fahmkirina sawal, ajal û her wusa her cûre zindiyên ku ew di wê demê de li dora jîyane mirov dijîn, wê temenekî xwe parastinê jî ji mirov re bide çêkirin û afirandin. Zanebûn, di vê çerçoveyê de wê ji aliyekî ve serdestîya mirov li xwezayê çêbike û ji aliyekî ve jî wê temenê xwe parastina mirov biafirênê. Tişta ku mirov zanibê ku ew telûkeya û wê xaterîyê ji jîyane mirov re çê bike, her wusa ew tişt, wê bo mirov bê weke tişta ku mirov xwe ji wê dûr bigirê bê.

Têgîna xweparastinê wê bo mirov weke têgînek xwezayî a jîyanî bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku mirov

wê têgîna xwe parastinê bi pêvajoyên jîyankirina xwe re bidest dixe. Mirovê kal, vê dizanê. Bo vê yekê, ew hertimî di rênîşandinê de wê bo mirovên li dora xwe wê ew weke serok bê. Wê gotina wî kifşkar bê.

Ev rewşên ku bi jîyane xwezayî a di destpêka kombûna civatkî de ku ew dibin, wê piştre di xate pêşketina jîyane civatî a li kurdistanê de wê xwe bidna domandin. Di vê çerçoveyê de teybetî û xosletên civate kurd ên bi jîyane wan ya bixwezayê re di vê çerçoveyê de wê têgînekê bi me re bidiina çêkirin ku ew ji serdemên berî ppêvajoyên şariştaniyê û heta yên piştre xwe di dewama hevdû de dana domandin in. Em dikarin, wan pêvajoyên pêşî ên bi jîyane xwezayê ên civate kurd, weke pêvajoyên seretayî(´îlkel´) jî werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de civate kurd, wê nûmîneyek baş bê me ku em bi wê di xatekê de wê pêvajoyê hildina li dest.

Civate kurd, heta ku ew dihê roja me jî, wê bi pirrdîmenî wê hebûna xwe bide domandin û nîşandin. Ev pirrdîmenîya wê, bi mejûya wê re afirîya. Dîroka wê, di vê çerçoveyê de wê xwediyê awayekî pêşketinê bin. Di xate civatê de wê, gelek jîyankirin wê werina jîyankirin. Her wusa, bi demê re wê ew jîyankirin, wê di mejiyê mirovan de wê weke xal û ankû nûqtayên xwe lê girtinê ên jîyane mirov din jî bin. Bi demê re ew vegotinn ´mîtîk´ ku wê biafirin û wê li dora wan, hin bi hin zanebûn di mejiyê mirovan de ku wê biafirin, wê li ser serborî û jîyankirina jîyane wan mirovên kal ên berê wan bê. Di vê çerçoveyê de em dikarin pêvajoya afirandina mîtan û ankû afêrendêrîyên mîtolojikî, li sê-pêvajoyan beş bikin. Pêvajoya pêşî a destpêkê, pêvajoya navîn a pêşketinê û bi hişkirinêê û pêvajoya dawî a biaqilkirinê ya. Di pêvajoya pêşî de wê weke ku em bi totemismê û anamîsmê re kifş dikin, wê bi çêkirina wan re wê bibin. Wê di vê demê de wê dager werina afirandin. Mejî, wê li dora wan xwe bigirê. Her wusa, wê hin bi hin ew kombûna li dora hevdû, wê vegerihê weke kombûna li dora wan dager û ankû totemên ku hatina çêkirin. Ev, wê bi pêvajoyî heta serdemên piştre ên bi pêşketina aqil ku wê di wan de wê êdî hebûna ´xwûdê´ wê were kifşkirin û pêşxistin, wê heta wan dem û serdeman wê hebûna xwe bide domandin. Li ser jîyane mirovên pîr û kal re wê zanebûn li navê ´xwûdê´ ku ew dihê kirin wê were baxş kirin.

Çendî ku ew demên destpêkê bi vî rengî pêş dikevin, wê gelek xwûdanên piçûk û mazin wê kifş bikin. Di aslê xwe de em, divê ku wê hebûna wan xwûdanan weke xêveka ku wê hertimî di jîyanê de û li ser hiş û aqil re ku wê bi xwe re bigirê jî em dikarin werênina ser ziman. Êdî

wê li ser wê re wê civatîtî li dora dager û têgînan wê bidest pêşketina xwe bikin. Ew kal û pîrên ku wê di serdemên pêşî de bi aqilê xwe û serborîyên xwe li pêş bin, wê di vê demê de jî weke ku em di nava civate kurd de dibînin, wê li pêş bin û wê vê vecarê wê weke şîrovevanna wan dager û têgînan wê bierkî wê derkevina li holê. Pîr û kal, her wusa wê çawa ku weke şîrovevanên wan dager û têgînan bin, piştre wê weke oldar û ankû şêwirmend, wê bi weyn û erk derkevina li pêşîya wê koma ku ew di nava wê de na. Ev pêvajoya ku wê kal û pîr bi vê rengê wê derkevina li pêş, wê weke pêvajoyek destpêkê a civatî bê. Hin bi hin civatîtî pêş dikeve. Pêvajoyên pêşî ên kombûna civatî, wê li ser temenê aşîr û bi wê re malbatîtîyê bin. Mirovên ku ew bi bendê xizmbûnê û ankû xwûnê ku ew bi hevdû ve girêdayîna. Pêvajoyên ku wê li ser van rewşên jîyankirina bi komî re wê derbas bibin, wê hin bi hin wê ezmûn û fêrê bi mirov re di mejiyê mirov de wê, bidê çêkirin. Ev pêvajoya pêşketina ezmûn û fêran wê heta dema pêşketina hiş, piştre aqil û bi wê re jî pêşxistina nivîsandin û xwandinê jî wê herê. Mirovê pêşî, ew dagerên ku çêkrina ji xwe re wê wan biwate bike. Li ser wê watekirinê kirinê re wê ji aliyekî ve wê temenê pêşketina nivîsandinê û xîzkirinê jî wê bixwe re di mejiyê xwe de biafirênê. Biwate kirin, wê di vê çerçoveyê de wê pêvajoya pêşî a vê pêvajoyê û pêşketina wê bê. Ev pêvajo, wê weke pêvajoyna ku wê li ser ezmûn û fêrên jîyanî re ku wê bimeşê bê.Dager, piştre li ser wan hişkirin û piştre aqil û şêwayên aqil wê pêşbikeve. Mirov, dema ku wê ji destpêka wê hilde li dest, wê li ser navaroka aqil re wê şêwayê **metafîzîka aqil** jî wê bi pêvajoyên pêşketina wê re wê xwe bide pêşxistin.

Aqil, wê temenê pêşketina reng civatîtîya ku wê ew civakçya şariştanî bê. Di vê çerçoveyê de aqil, wê bi serê xwe bi hebûna xwe re wê destpêka pêvajoyekê bê. Bi wê re jî wê bi serdestbûna wê re wê wê ev pêvajoyê evreyên xwe yên piştre ên bi pêşketina xwe re bi pêşketina civatîtîyê re wê bijî. Pêvajoyên piştre ên şariştaniyê, ku em bidest hildana li dest a wan bikin, em divê ku wê bi pêvajoyên şariştaniyê re werênê ser ziman. Ez li vir, divê ku vê yekê binxat bikin ku wê pêşî pêvajoya xalkîtîyê û xalknasiya wê were û bijî. Piştre jî, wê civaknasî û civaketîya wê, were û bijî.

Piştî ku pêvajoyên aqil û bi zanebûnê re wê destpê bikin, wê bi aqil re wê jîyan were adilandin. Ev pêvajoya biaqil adilandina jîyanê, wê pêvajoya jîyane bikomî a pirr piştre bê. Her wusa, mirov wê bi hiş li jîyanê bihizirê. Rastîya hiş û têkiliya wê ya bi fahmkirina jîyanê re wê bi serê xwe weke mijareka ku wê were hildan li dest bê. Her wusa, mirov

wê çawa fahm bike û ankû bihiş lê binerê. Ankû, mirov wê çawa bi hiş werênê ser ziman. Dîtin û nerîn, wê li vir, temenê cihrengîyên ji hevdû cuda bin.

Piştî ku aqil pêşket û pê de, wê mijara fahmkirinaka zelal a di derbarê jîyanê de wê xwe bide hanîn li ser ziman. Gelek mirovên ku wê bihizirin ên weke Mîtra û ankû Piştre Zerdeşt, wê li ser vê rewşê wê bihizirin. Wê bixwezin ku wê jîyane ku heya û hebûna xwe dide domandin fahm bikin. ´Jîyane dervî mirov û ankû dervî dîtin û nerîna mirov ku heya´, wê weke hizrekê xwe di mejiyê mirov de werênê ser ziman.

Li vir, ez divê ku vê yekê werênima ser ziman ku wê di ehengîya jîyanê de wê fahmkirin, hertimî wê car bi car temenê aramiyê jî bê. Lê ev jî wê hertimî weke mijaraka fahmkirinê bê, ku ya ku mirov ew fahmkiriya, ew çi ya, wê ew jî, weke mijaraka hizirkirinê bê. Ya ku mirov weke ji jîyanê fahmkiriya, çendî wê rewşa ku me ew aqil bi wê girtiya wê dihênê ser ziman weke hebûna wê û ankû weke ku ew rewş bûya. Aqil, wê hertimî afrînerîya wê jî di nava wê rewşa jîyanê de wê xwediyê kifşkirinekê bê.

Di jîyanê de wê hertimî, rastîyek wê hebe. Em divê ku wê rastiyê pêşî kifş bikin û herê bikin. Dema ku mirov ev ne kir, di destpêkê de ew rastîya bi jîyanê re kifşnekir, wê hingî mirov ji rastiya jîyanê dûr bikeve. Ev, wê di nêzîkatîya mirovî a di nava jîyanê civatî de jî wê wusa bê. Di serî de li vir, divê ku mirov rastîya jîyanê ”weke xwe” wê kifş bike û werênê ser ziman. Xate jîyanê a civatî, wê di dema jîyane civatî de w, ji ber ne rast fahmkirinên rastiyên jîyanî, wê rasti mudaheleyan wê were û heta ku di ancama wan mudahaleyan de wê gelek civatên dîrokî werina ji dîrokê birin û tûnakirin. Şer û pevçûnên ku bûna ên bo desthilatdarîyê, mirov dikarê rastrast weke şerên ku wê hebûna civatên dîrokê wê ji xwe re bikina armanc bin, werênê ser ziman. Bi wê re jî, mirov dikarê wan şeran fahm bike.

Di serî de şer û pevçûn, weke muhdaleyeka li jîyane civatî ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov rastiya wê werênê ser ziman. Jîyane civatî, her wusa, li vir, mirov divê ku wê bi teybetî hilde li dest. Em dema ku jîyane civatê bi rastîya wê re fahm nekin, emê hingî nikaribin bi wê rastiya wê re nêzîkatîyê li wê bikin. Hêsta desthilatdarîyê a bi serdestîyê re ku diafirê, ew ti carî mirov nikarê bi hebûna civatê re werênê ser ziman. Her wusa, ew hêsteka ku ew bihêz bûya û wê mudahaleyê li jîyane civatê bike bê. Pêvajoyên jîyane civatî ên di dema pêvajoyên şariştaniyê de ku wê biafirin, wê hertimî di vê çerçoveyê de

wê rastî hêrîşên desthilatdarîyê wê werin. Pirsgirêka civatan û desthilatdarîyan a bi hevdû re wê weke pirsgirêkek dayimî a demên şariştanî bê. Mirov, dikarê vê pirsgirêkê ji aliyê ramyarî, rêveberî, dadî û hwd re werênê ser ziman. **Emê li jêr bahse adilandina ku desthilatdarî li ser gotina ´dadê´ re dikin, emê li ser wê bisekin** in. Lê li vir, em hinekî divê ku bi gotinekê jî werênina ser ziman. Çendî ku wê navaroka gotina dadê, bi ya haqanîyetê û her wusa bi têgîna ´wekheviyê´ re wê bê kirin ku werê hanîn li ser ziman jî, lê di aslê xwe de wê ev ji aliyê rastîya civatan ve ku mirov li wê dinerê, mirov wê bibînê ku wê ne wusa bê. Dad bixwe, weke hêzek di destê desthilatdarîyan de ya di serdemên şariştaniyan de. Bi wê re wê mudahaleyan li jîyane civatan bikin. Her wusa, wê mudahaleyê li pêşketina wan bikin. Di vê çerçoveyê de di serdemên şariştaniyê ên bi aqilê felsefeyê de pêşketina zagon û ´dada pozitiv´, wê hinekî vê rastiyê baştirîn werênê ser ziman. Civak, di bin destê desthilatdarîyê de wê ne weke xwe bijî. W weke desthilatdarîyê ku ew dixwezê wê bijî. Ev jî, wê temenê pirsgirêkên civakî ên navxweyî ku wê bi wê re wê derkevin bin. Di serî de pirsgirêk, kengî bi civakê re rûdidin? Kengî ku mudahele li xwezaya civakê û pêşketina wê bûn, wê hingî pirsgirêk bo civatê biafirê. Hêzê di destê desthilatdarîyê de a weke ya bi pergale dadê, pergale perwerde, bi hêzên weke ên leşkerî û hwd re wê, bo ´adilandina´ civakê li gorî xwestekên desthilatdar wê werina bikarhanîn. Têgîna dad û haqaniyet û hwd, bina weke têgînna ku wê bina weke maske ji vê rastîya desthilatdarîyê re.

Em dema ku li serdemên şariştaniyê ên bi pêşketina civakê e li wan dinerin, wê her wusa wusa bê. Pêşketina aqil, wê ji gelek aliyan ve bo kirina xizmeta vê rastîya desthilatdarîyê de wê, were pêşxistin. Her wusa, têgîna jîyane xweza û ya jîyane ´pozitiv´ wê li ser kifşkirinên bi navaroka aqil re wê werina kirin, wê divê çerçoveyê de wê, xwedîyê hemwateyê bin.Her wusa li vir, gotina ´pozitiv ku me bi gotina ´jîyane pozitiv´ re hanî ser ziman, di rengê ´dada pozitiv´ a serdemê de em li vir bikardihênin. Her wusa, ev têgîna pozitiviyê, di çerçoveya kifşkirina ji derve li jîyanê, em bikardihênin. Xwezaya jîyanê û pêşveçûnên di nava wê de ku wê bi pêşketinî derkevina li holê, wê hertimî, bi wan nêzîkatîyên kifşkar ên li ser aqil re wê bikevina nava nakokî û ne wekheviyê de.

Li vir, bi heman rengî bi vê rengê gotina pozitiv re mirov dikarê ´gotina civake pozitiv´ jî biafirênê û werênê ser ziman. Her wusa, ev rengê pêşketina civatê ku ew a ku ew li ser têgînekê re ku ew di demekê

de her cûre amûrên desthilatdarî dihên bikarhanîn û ew dihê afirandin a. Wê ev rengê pêşketina civatî, çendî ku wê kalibê civateka xweza û dîrokî jî wê li wê were esas girtin jî, wê ew ne civakek dîrokî û xwezayî bê. Her wusa, di serdema me de wê, bi vê rengî pêşketinek were çêkirin û wê gelek civakên dîrokî bi rêbazên weke ên bişavtinê û ankû ´asimlasyonê´ re wê di nava wê civake ku hatî çêkirin de wê werina halandin. Ankû, em dikarin bibêjin ku ew dihêne tûnakirin. Di roja me de ew pirsgirêka civakî ku em bahse wê dikin, wê bi pirranî ji vê aliyê ve wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, em li vir, dema ku bi awayekî di xate pêşketina dîrokê re li mejûya bûhûrî dinerîn bi jîyane civatî û ya keseyetî û hwd re dinerin, em dinerin ku wê di vê çerçoveyê de pirsgirêk pirr zêde wê were dîtin. Dema ku mirov ji vê aliyê ve dinerê, ya ku mirov dibînê, ew a ku weke ku aqil û pêşketinên aqil ên bi zanebûnê re jî weke ku hatina xistin xizmeta wê tûnakirina civatên dîrokî de.

Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku civate dîrokî, di roja me de ku ev serdem weke serdemek ´ hemdem´ û ankû ´nûjen´ jî dihê hanîn li ser ziman, herî zêde wê ev gotin bina weke **goristana civakên dîrokî**. Heta ku wê dem û serdem were vê dem û serdema me, wê bi dehan çand û ziman bi hebûna wan ya civakî re wê ji dîrokê herin û ankû werina birin. Raportên NY(´neteweyên yekbûyî´)´yî ên û ankû UNECO ên di derbarê ziman, çand û civakên ji dîrokê çûna de jî wê vê rastiyê bi gotinên serdema me, wê piştrast bike.

Em dema ku li dîroka civakê dinerin, em dibînin ku wê ji serdemên destpêka pêvajoyên şariştaniyê ve wê weke temenê pirsgirêkên civakên dîrokî bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku civakên dîrokî, pirranîya wan, weke ku hatina halandin û her wusa li ser wê re civakna ´nû´ weke ku hatina halandin. Di roja me de ew destûrên bingihînîn ên rejim û ankû netewên vê serdemê ku hatina afirandin, wê tenê xizmetê ji vê rastiyê re wê bikin. Di vê çerçoveyê de wê ya ku wê were esasgirtin wê ne civat lê wê desthilatdar û bîrdozîya wê bê. Bo vê yekê ya ku wê hebûna desthilatdarîyê di roja me de wê li ser hebûna civakan re wê were girtin. Ev jî, weke ´nirxeke´ demê a şariştanî hatîya pêşxistin. Ev nêzîkatî, bi xwe re wê bi demê re wê ji şêwayên metingerîyê bigra û heta ku digihijê gelek şêwayên din ên bi vî rengî ên rêveberî û hwd, wê li ser serê civatan biafirênê û bide pêşxistin. Li vir, em divê ku vê yekê binxat bikin û bibêjin ku wê pirsgirêka civakan di destpêka avakirina rêveberî û ankû desthilatdarîyan de wê xwe bide dîyarkirin. Ji wê demê û pê de wê pêşbikeve û mazin bibê. Her wusa bi

wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê bi bûhûrîna demê re wê ew pirsgirêk, wê zêdetir û maztir bibê. Piştre jî wê pirsgirêk, were wê astê ku ew bixwe were wê astê ku ew bikeve dijberîya wê civake ku ew li ser serê wê bixwe ya. Bi wê re wê civak jî wê dijraberiyê li hemberî wê rêveberiyê wê pêşbixe bo ku ew ne li gorî rastîya wê ya. Yanî, ew rêveberî ber ku ew li hemberî hebûna wê ya.

Civak, weke rastîyek dîrokî, dema ku mirov li ser wê dihizirê, her wusa mirov bi mejûya wê re kifş dike ku civak, bi demê re pêvajoyên pêşketinê dijî. Pêvajoyên serdemên civakê ên berî dema pêşketina şariştaniyê, wê pêvajoyna pêşîya pêşketina pêvajoyên şariştaniyê na. Di van deman de wê kombûna mirovan wê, bibê, pêşketinê û pêvajoyên jîyanî derbas bike. Bi van pêvajoyan re wê ezmûn û fêr biafirê.

Di nava jîyane komî a ku pêşkeve de wê ew aşîrên hin bi hin wê di temenê de wê pêşbikevin, wê di nava wê de wê hin bi hin mirov wê biafirê. Malbat, dema ku ew diafirê, her wusa, ew aîdîyeta ku wê bi we re wê biafirê. Ev aîdîyeta malê, wê bi şêwayekî xwe yê din, wê di temenê aşîrîtîyê de wê werênê ser ziman. Mirov, çawa wê xwe aîdî wê jîyane bike û wusa hîs bike, wê malbat, di vê çerçoveyê de wê pirr zêde wê fêrker bê. Fêrbûnên malbatî, wê di vê çerçoveyê de giring bin ku mirov wan weke beşek temenî di nava şîroveya xwe ya li ser civakê de wê werênê ser ziman.

Li vir, em divê ku vê yekê werênê ser ziman, fahmkirina malbatê û pêvajoyên wê yên pêşketinê, wê ji aliyekî ve wê bina alikar ji fahmkirina mirov a ji aliyê civakê ve jî. Malbat, wê di vê çerçoveyê de wê bi pêşketina pêvajoyên xwe re wê hêst, hîs û hiş biafirênê. Ew hêst û hîsa malbatê wê di temenê girêdana mirov wê li wê jî bê. Girêdana mirov a bi malbatê ve wê ji aliyên weke hêstî, hîssî, hişmendî û her wusa biolojikî ve jî wê bibê. Malbat, bi van girêdanên xwe ve wê weke mene bingihînî a civatê jî bê. her mirov, wê bixwe aîdî malbatekê bê û xwe aîdî wê hîs bike. Bi wê re jî wê di vê çerçoveyê de wê bi hêst û hêstîyar bê. Wê bi hîs û hîsîyar bê. Wê bi hiş û hişiyar bê.

Mirov û malbat, têkiliya wan bi hevdû re wê rengê pêşketina civatî bi xwe re wê bi bandûr bike. Weke ku çawa malbat wê mene bingihînî a civatê bê, bi heman rengî wê mirov jî wê di wê çerçoveyê de wê xwediyê wate û rastiyekê bê. Girêdana mirov a bi malbatê ve wê, bi kifşkirinên wê ên di vê warê de wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, di nava malbatê de wê hin bi hin wê, mirov bi keseyetîya xwe re wê derkevina li pêş. Keseyetîya dê, keseyetîya bav, keseyetîya kûr, keseyetîya kêçê,

keseyetîya mam, keseyetîya metikê û hwd, bi vê rengê wê li dûv hevdû wê pêşbikevin û wê derkevina li holê. Ev şêwayên salixkirina keseyetîyê, wê ji aliyekî ve wê temenê girêdana malbatan û ankû andamên malbatan a bi hevdû ve jî wê biafirênê. Di vê çerçoveyê de wê naqşaya malbatê li dûv hevdû, wê derkeve li holê. Naqşaya malbatê mirov û malbatê, mirov dikarê bi hevdû re ji du aliyan ve wê fahm bike. Aliyek wê bi herikîna dîrokê a bi ber roja me ve bê. Aliyekî din jî, wê di wê dema ku mirov di wê de dijî û bi rewşa têkiliyên xwe yên malbatî ên ku ew heya re wê were ser ziman. Di wê dema malbatê de wê  mirov, aîdî malbatê bê. Wê her wusa bi wî û ankû wê re wê andamên din ên malbatê wê hebin. Wê bi wan re hevnasînê bike.

Keseyetîya ku wê mirov bi xwe re biafirênê, wê di vê demê de wê wê bi têkiliyên xwe yên li dora xwe re wê navenda xwe ya civakî û civaknasî wê bi wê re wê biafirênê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê naqşaya malbatê ya demê wê bi wê re wê xwe bide dîyarkirin. Naqşaya malbatê a demî ku rengê firehbûna wê re xwe dide nîşandin, wê rengê yê wê yê malbatî bide dîyarkirin. Mazin û ankû piçûk, hindik-andam û ankû pirr-endam û hwd.Bi vê rengê wê xwe werênê ser ziman. Civak, wê di vê demê de wê bi têkiliyên xwe yê bi firehî re wê, were ser ziman. Çendî ev malbatek fireh û mazin a wê were ser ziman. Dema ku mirov bi dîrokê re jî bahse wê bike, ew naqşaya wê ya bi dirêjehîya malbatê a mejûya wê re wê xwe werênê ser ziman. Her wusa, divê ku mirov bi herikîna malbatê a bi dîroka wê re bi ber roja me ve dirêjehîya wê û bi naqşaya wê ya demî a bi firehiya wê re wê xwe bide dîyarkirin. Malbat, di vê çerçoveyê de wê xwediyê rastiyekê bê. Mirovekî kurd, dema ku bahse kalkên xwe û ankû nefşên malbate xwe ên berî xwe dike, bahse gelek bavikan dike. Wan li dûv hevdû rêz dike. Ev dirêjiya malbatî a birakendî bi xwe re dihênê ser ziman. Aîdîyeta malbatê wê bi vê rengê bi rengê dirêjîya dîroka wê re wê were ser ziman. Dîroka malbatê, ji aliyê rastîya civakê û pşketina wê ve wê weke rastîyek temen bê. Em dema ku wê baş fahm bikn, emê rastîya civatê jî bi başî fahm bikin.

Em dema ku li ser gotinên ziman re herin, wê hinekî di şîrovekirinê de wê, cûdahî jî wê xwe bide dîyarkirin. Malbat, bi hêst, hîs, hiş û biolojikî ve bi hevdû ve girêdayî ya. Di rastiya malbatê û fahmkirina wê de wê, ev her çar rastîyên bi hêst, hîs, hiş û biolojiya malbatê re wê malbatê werênina ser ziman. Lê dema ku em em bahse rastîya civatê a bi şîrovekirina wê re bikin û hewl bidin ku wê fahm bikin, wê bi hiş re çand

û aqil,  her wusa bi hîskirinê re xwe aîdî wê civakê hîs kirin û hwd wê derkevina li holê. Kevneşopîyên çandî û hwd ên civatî wê li vir wê li ser gotina civakê re wê hin bi hin wê derkevina li pêş.

Kevneşopî û çand, wê bi civatên dîrokî re wê pirr zêde hebe û li pêş bê. Her wusa, wê zagon û destûrên xwe yên civakî wê bi wê kevneşopîya xwe re wê werênê ser ziman. Kevneşopî, li vir, wê ji gelek aliyan ve bi mejûya civatê a ku ew di hildê li nava xwe re wê giring bê. Em divê ku wê di vê çerçoveyê de wê hildina li dest. Çendî ku em nikarin, civatek dîrokî nikarin bê pêşketina kevneşopîya wê re bi başî fahm bikin, her wusa li ser wê rewşa wê ya dîrokî a kevneşopîkî re nîqaşkirina wê têgîna wê bi gotina ´hemdem´ û ankû ´nûjeniyê´ jî wê ewçendî wê bêwate bê. Nîqaşên bi gotinên weke ´hemdem´ û ´nûjeniyê´ re ku wê li ser kevneşopî, çand, heyîn û kevneşopîya civatek dîrokî ku wê werina kirin, çendî ku wê ji aliyê têgînî ve wê bêwate bin, biheman rengî redkirina nûjenî û hemdemîya civatên dîrokî a her demê jî wê bi heman rengî bêwate bê.

Di sedsale me de gotinên weke ´civake li şûn mayî´ û ankû ´paşverû´ bikarhanîna wan, di aslê xwe de wê, ji aliyekî ve weke şêwayekî hêrîşê jî bê li heyîn û nirxên civatên dîrokî. Gotinên weke ´hemdem´´ û ´nûjen´ û hwd, di roja me de weke şêwayna dayîna herêkirina rejimn roja me jî ya. Têgîna popûlerîteyê, hinekî jî wê vê rastîyê werênê ser ziman.Li vir, em divê ku wê jî werênina ser ziman ku wêke gotinên bi vî rengî bi wan nêzîkatî kirin, wê tenê bi xwe re ne fahmkirinekê bide nîşandin. Ji aliyekî ve jî wê, nîyeta mirov ya baş û ankû xirab bi xwe re werênê ser ziman.

Li vir, em vê yekê jî bi gotina ´civake kurd´ re werênna ser ziman. Civake kurd, weke civakek dîrokî ya pirr kevn a. Dîroka wê bi hezaran salan, heya. Dîroka wê ya bi pêşveçûnên pêşketinên şariştaniyê re wê heta serdemên sûmerîyan wê herin. Her wusa, wê dîroka civake kurd, li ser pergalên wê yên weke bi ´jîyane koçerîyê´ û hwd re wê heta berî serdemên şariştaniyê wê herê. Rastîya jîyane koçerîyê bi pergalî, dema ku mirov wê bike ku fahm bike, mirov wê di vê çerçoveyê de wê weke dîmenekî pêşketî  ê jîyanî ku dîroka wê ta serdemên neolîtîkê a dema berî şariştaniyê wê herê. Dema neolîtîkê, mirov dikarê weke demek bûhûrîner a li dem û serdemên şariştaniyê mirov dikarê werênê ser ziman. Di vê demê de wê jîyane bi civatî wê biafirê. Her wusa, zagon û destûrên wê jîyanê wê li gorî ya xwezayê bin, weke ku mirov bi jîyane koçerîyê re dibînin, wê mirov, li gorî xwezayê wê jîyane xwe ava bike. Wê hemû ezmûn û fêrên ku ew bidest dixe, wê di çerçoveya jîyane civatî a bi

xwezayê û li gorî rastîya xwezayê bê. Her tişt, wê jixwere û bixwere bê. Wê ti rewşên zêhnî ên weke bi rengî rewîstî û hwd ku alî didina dîyarkirin û ankû pêşîyê digirin wê tûna bin.

Zagonên wê jîyanê wê li gorî pêwîstî û pêwîstînîyên domandina jîyanê bin. Bi wê re jî, wê mirov li gorî xwe û pêdivîya xwe wê ji xwezayê wê ancam bigirê. Bi alikarîya bi hevdû re wê, jîyane xwe de bidina domandin. Di vê çerçoveyê de wê rewşa civatek vekirî a biminaq wê bi rengê pêşketina civatî a vê demê re wê xwe bide nîşandin û dîyarkirin. Civate neolîtîk, di aslê xwe de wê di vê çerçoveyê de wê bi xoslet û teybetmendiyên civatek vekirî wê bijî. Çendî ku civat, ji xwezayê û jîyankirin û têkiliya bi hevdû re vekirîya, wê bi xosletên **c**ivatek vekirî bê. Di aslê xwe de piştî serdemên neolîtîkê, dema ku mirov di bûhûrîna dema şariştaniyê û pêvajoyên wê dijîn, weke ku çawa jîyan û mejî li xwezayê tê girtin, wê bi heman rengî bi xosletên civatên girtî wê bijî. Ji hevdû re girtîbûn, wê temenê pevçûnên civatî ên piştre ku wê bi hevdû re rûbidin jî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de girtîbûn, di aslê xwe de bi pêşketina aqil û weke artarnatifek xwezayî bi karhanîna aqil û bi erk kirina wê, wê rastîya civate kurdî bi xwe re wê bide afirandin. Rengên têgînên rewîstî û hwd, li vir, divê ku mirov ji bîrnekê û werênê ser ziman ku wê bi demê re wê bi zagon û destûrên navaroka xwe re wê, jîyanê bi aliyekî de li gorî xwe bidina pêşxistin. Ev bi aliyekî pêşxistin, wê di aslê xwe de rastîya xosletên civake girtî jî bi xwe re werênê ser ziman. Ev rewş, di nava civate kurd re ya ku mirov bi wê re dibînê, ew a ku weke ku bi jîyane wê ya xwezayî re wê **jîyane koçerîyê**, bi zagon û destûrên xwe yên jîyanî ên weke ku ji dema neolîtîkê mana re wê xwediyê teybetîyên **civate vekirî** bê. Her wusa, li kurdistanê dema ku bahse jîyane koçerîyê dihê kirin, bahse lingê wê yê bi ´jîyane deştê´ re dihê kirin ku ev lingê şariştanbûyî ya. Lingê wê yê duyem jî wê bi ´jîyane zozana´ re wê were li holê ku ev jî jîyane ku dervî şariştaniyê maya û bi wê re dem bi dem weke ku bi pêşketina civate kurd a jîyane koçerîyê re jî hatîya dîtin bi jîyane şariştaniyê re bi nakokî jîya ya heta roja me.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku li kurdistanê jîyane şariştanî, di vê çerçoveyê de wê xwediyê cihêrenginiyekê bê. Em zêde nikarin bi zagon û destûrên şariştaniyê ên ku ew weke ast, rada û pîvan di roja me de dihênê ser ziman, bi wan bi tenê xate pêşketina jîyane civatî a li kurdistanê fahm bikin û wê werênina ser ziman. Li vir, dema ku em wê bikin, wê hertimî kêmesîyek di fahmkirin û bi wê re di hanîna li ser ziman de wê xwe bide dîyarkirin. Weke ku me di destpêka mijarê

de jî hanî ser ziman, rengê pêşketin û pêşveçûna civakîyê li kurdistanê wê pirr dîmenî bê. Her wusa, hem bi dîrokê û dirêjehiya wê re ew pirrdîmenîtî heya û hem jî bi wê firehîya wê ya demê re mirov rastî wê rastîya pirrdîmenîtîyê bi wê re dihê. Her wusa, ev rewş, wê weke minaqekê bê ji pêşveçûnên olî û bawerî jî li kurdistanê. Piştî pêvajoyên şariştaniyê, wê di nava civate kurd re wê, pirr zêde rengên ji hevdû cuda ên bi bawerî wê derkevin. Her rengekê ol û bawerîyî ku wê nêzîkatî li civakê kirîya, ji aliyekî ve kirîya. Bi vê rengê, tenê di roja me de jî, bi rengê firehiya wê ya demî re bawerîyên civatî ên kurdî û civate kurd, wê weke êzdayîtîyê, yarsanitî, şebekîtîyê, elewîtîyê, zerdeştitiyê, misilmantiyê û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Bi wê re jî wê gelek şîrove û têgînên hizbî û mezhebî ên di çerçoveyê de ku ew jî bi wê ast, rada û pîvanê pêşketina wê hebin. Di çerçoveya rastîya pêşketina civatîtîyê de ku mirov, mezhebîtîyê hilde li dest mirov wê wê baş fahm bike ku weke darek ku ew hertimî li wê çiqil lê zêde dibin û her çiqil bi rengekî xwe û şîroveya xwe dihênê ser ziman, wê bi wê rengî bi rengên pêşketin û pêşveçûnên nû re wê xwe bide nîşandin û dîyarkirin.

Civate kurd a roja me, ku ew hê bi koka xwe ya dîrokî re dijî, wê ji aliyekî ve xosletên civatek girtî bide nîşandin û wê ji aliyekî din ve jî wê xosletên civatek vekirî wê bi xwe re bide nîşandin û dîyarkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê, weke civakek bi pirrdîmenî ku ew pêş dikeve bê. Di aslê xwe de ev rewş, wê hertimî dem bi dem weke ku wê di serdema me de were dîtin, dema ku wê ji aliyê xosletîyên **civate girtî** ve li wê nêzîkatî were kirin, wê aliyê wê yê din wê pirsgirêk ji wê re xwe bidina dîyarkirin. Bi heman rengî jî wê, dema ku wê ji aliyê xosletîyên **civate vekirî** ve jî li wê nêzîkatî were kirin, wê pirsgirêk bo aliyekî din, were çêkirin. Ber ku civate kurd, bi xwe re ew nêzîkatîya xwe di van demên dawî de neda dîyarkirin û hertimî rejimên herêmê ên roja me, bi qalibên xwe çûna bi ser wê de wê, ev bê temenê pirsgirêkên dîrokî ên civatî jî bo wê. Hewldana kirina civatê di qalibekî de wê, bi bermeneyên weke bişavtinê û hwd bibê. Ev jî wê dem bi dem qûsandinê li ser pêşketin û pêşveçûna civakê bide çêkirin. Civak, weke sipîndareka ku ew di nava xwe de xwediyê pirr çiqil û aliyan a. Her wusa, di vê çerçoveyê de mirov nikarê tenê bi aliyekî, nêzîkatîyekê û her wusa ji rexekî ve nêzîkî wê bibê. Em weke ezmûneka civate kurd jî dikarin vê yekê werênina ser ziman, ya ku ew dihê dîtin ew a ku em dema ku ji aliyekî ve nêzîkî civate kurd dibîn, em di nêzîkatîyekê û tenê ji aliyekî ve nêzîkbûn û ankû bi qalibên pêşdîtinî nêzîkî wê bûn û bi wê hewldana kirina civakê

bi pêşketina wê re di nava qalibekê de ew hertimî bi wê re bûya weke pirsgirêka nêzîkatîyê ya li civakê. Hebûna civakê, ne li gorî pêşdîtinên mirov ên bi aqilane bi mejûya wê re di dîrokê de bi rê ve diçê. Wê li gorî ahenge xwe ya pêşketinî a jîyanî wê pêş de herê. Dema ku mirov, bi aqilê xwe re weke ku mirov di sedale me de dike ku ew xwe bi dîzaynkarê civakê bi erk bike, weke ku dibê ya wê jenosîdên civatan derxe li holê û yan jî wê civakan ji dîrokê bibê. Di her aliyan de jî wê civakên dîrokî werina ji dîrokê birin. Yan jî, wê bi rewşek bi vî rengî re wê rû bi rû bê mayîn. Em li vir di dewama wê de wê jî werênina ser ziman ku civak, desthilatdarî û ankû rêveberî, wê hertimî di vê xalê de werina berhevdû. Mejiyê desthilatdar, ku ew çendî dike ku bi aqilane bihizirê jî, wê hertimî li gorî hebûna civake dîrokî wê weke kiresekî tang bimênê. Bi vê rewşê re mirov dema ku wan mudahaleyên desthilatdarîy ku ew li jîyane civakê dike, mirov wê sedema hatina wê ya berhevdû a bi civakê re jî fahm dike. Pirsgirêka hebûna têgîna ´welat´ê jî wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Di dîrokê de welat, wê weke sazîyekê wê piştre di pêvajoyek piştre a pêşketî a serdema şariştaniyê de wê derkeve li pêş. Bo civatê, pirsgirêka rêvebirina **welêt**, şêwayê sazûmana wê, **zagon û destûrên** wê û hwd, w bi hemû aliyên xwe yên din re jî wê welat, piştî ku ew weke têgînekê derkeve li holê û serdest bû û pê de wê, wê bê navenda pirsgirê û ´îhtlafên´ bi dîrokê re jî. Hewldana ”**meşrû**” dîtina **têgîna welêt** li ser hebûna civatan re û bi wê re hewldana bi destûr û zagonên wê û hwd re dîzaynkirina civakê û ankû civakan di nava sînorekê de ´weke hevdû´, wê temenê pirsgirêka giştî a hebûnî ya civak û têgîna welêt a bi hevdû re bê.

Civak, hertimî dixwezê ku ew li ser koka xwe pêşbikeve. Ew bi pêşketina xwe re dikarê têgîna xwe ya dadî, ahengî û felsefîkî jî biafirênê. Ji dervî wê ve bi nêzîkatîyên adilandinê nêzîkatî li navaroka civatê û hebûna wê kirin, tenê û tenê ji civakê re pirsgirêkên hebûnî diafirênê. Î ro, gelek pirsgirêkên civatî ên civate kurd, hem di roja me de û hem jî di demên berê de, mirov kifş dike ku ew ji vê rewşê derdikevin li holê.

.

**Ji destpêka şariştaniyê, pêvajo û serdemên pêşveçûnên civake kurd**.

Em ku ji kîjan aliyê ve dikin ku hebûna civake kurd werênina ser ziman, li ser dîmen, şêwa û hebûna pêşveçûnên civatî ve mirov diçê serdemên berê şariştaniyê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werênê ser

ziman ku wê ji serdemên kombûnê ên berî şariştaniyê ve wê civatîtîya civake kurd wê pêvajoyên wê li kurdistanê li ber ava diclê û firatê wê pêşbikevin.

Her wusa, em dibînin ku rengê jîyane koçerîyê wê di serdemên civake kurd ên destpêka sûmerîyan û hwd jî wê xwe bide dîyarkirin. Em î ro di serdemên gûtî û qasîtîyan de gotinên weke ´zozan´a û hwd kifş dikin. Gotinên weke zozanan, wate wê, di kurdî de jîyane bixwezayê re ya. Di roja me de ev tê wê wateyê jî jî, jîyane bixwezayê re ku mirov bi hevdû re dijî ya. Jîyane bixwezayê ku ew dihê hanîn li ser ziman, wê ev bi çûyîna li nava wê re wê were hanîn li ser ziman. Civake kurd, em kifş dikin ku wê di serdemên destpêka şariştaniyê de wê sawalgerî û şîvanî, çohtkarî û çandînî, nêçîrvanî û nêçîrkirin û kedî kirin, wê pirr zêde bi wan re bi awayekî pirr zêde pêşketî wê hebe. Ji xwe, rengekî jîyane koçerîyê ku em hinekî li jor jî hanî ser ziman ê weke ´jîyane zozana´ û hwd, wê li ser lingê jîyane şîvaniyê û hwd wê rûniştî bê. Em vê yekê bi vê re bi demê re wê pirr baş kifş dikin.

Civatên destpêkê ku weke ew bidest pêşxistina jîyane xwe ya xalkitiyê di destpêkê de dikin, wê bi sawalgerîyê û kedîkirina van ve alaqadar bibin. Her wusa, wateya vê çî ya? Wateya alaqadarbûna bi sawalgerîyê û kedîkirina sawalan, wê temenê wê jîyane xalkitîyê a ku wê hin bi hin wê rûnihê jî wê biafirênê. Diafirênê jî. Xalkîtî, weke pêvajoyeka pêşî a jîyane civatî a bi xalkbûnê re ya. Her wusa xalkbûn, wê di destpêkê de wê xwe bide dîyarkirin. Di vegotinên dema sûmerîyan, gûtî û qasîtiyan de ew rengê jîyane ku mirov wê kifş dike, ew a ku ew bi wê rengê bidest pêşketina xwe ya jîyanî dike û pêvajoyên jîyanê derbas dike. Her wusa, destana gilgamêş, destana kawayê hesinkar û hwd, wê bi pirraniya destanên demên bûhûrî re wê heman rewş û rengê pêşketinê bixwe re werênina ser ziman. Li vir, em vê yekê jî kifş dikin ku wê hin bi hin têgîna bawerîyê wê li ser aqil re wê biafirê û wê jîyanê jî bike nava xwe de. Wê li wê serdest bibê. Bi demê re wê serdestîya wê, wê bi xwe re di vê çerçoveyê de wê pêşketina jîyane civatî jî wê bixwe re werênê. Rengê hizirkirinên ol û bawerî û biwê re jî ê aqil û hwd, wê bi şêwayê ji xwezayê û li ser xwezayê bin. Her wusa, em vê yekê jî kifş dikin ku wê pêşveçûnên xwezayê û jîyane wê, zêdetirî bi bandûrî hebûna xwe di nava wê rengê pêşketina bawerîyê de bide dîyarkirin. Pêvajoyên yazdaniyê û ankû ola êzdayîyê ên destpêkê, di vê çerçoveyê de wê pirr watedar bin û wê gelek têgînên baş di vê warê de wê bidina me. Her wusa, bi wê re mirov dikarê vê yekê jî werênê ser ziman ku yazdanî, pêvajoyên wê yên

destpêkê, bi têgînî wê ji afirîna xwezayê û heta rengê jîyane nêzîkbûna li xwezayê û hwd jî, wê di nava xwe de wê bike ku ew bide dîyarkirin. Xate ola êzdayî û ankû yazdanî, weke xate bawerîyê ya herî kevn a. Her wusa, berî cihûtîyê, mesihiyê û îslamê jî ya. Bo vê yekê, di şêwayekî bawerîyê bi vê rengê û bi pêşketina wê de fahmkirina navaroka ola êzdayîyê, wê pirr zêde têgînên fahmker wê bide me.

Ol û bawerîya êzdayî, wê di çerçoveya yek-xwûdayî ya yazdanî de wê di serdemên şariştaniyê piştre de wê li herêmên Asya jî wê belav bibê. Her wusa bawerîya **Bûda** bixwe jî, wê ji wê xwe derxe û pêşbixe û biafirênê. Ola êzdayî, weke têgîneka hemdem a civate kurd û kurdistanî wê di şêwayê pêşketina civate kurdistanê de wê pirr zêde wê kifşkar bê. Ji serdemên sûmerîyan û bi vir ve em, weke ku di serdemên gûtî û qasîtîyan de dibînin, wê çanda Elîl wê xwe pêşbixe û wê piştre di serdemên xwe yên dawî de wê di şêwayê ole yek-xwûdayî de wê li herêmê pêşketina herêmê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Her wusa, piştre, Îştar, Lîllît, Harbê ku ew weke kîbeleya dema hûrîyan a û yazdana dayîn û bereketê ya, wê xwe bide dîyarkirin.

Şêwayê pêşveçûnên civatî ên serdemn sûmerî, gûtî û qasîyan li kurdistanê, wê di rengê xalkîtîyek xwezayî de bê. Ew xosletên kombûna jîyane mirov ku em di destpêkê de kifş dikin, wê di nava wê reng jîyane civatî de wê kifşkir û serdest bin. Her wusa, di serdemên berê de weke nîşanaka xortbûna vê rengê jîyane civatî a xalkî û her wusa jîyane sawalgerîyê, kedîkirinê û ji wan sûdgirtinê, wê ´jîyane şêwînê´ wê pêşbikeve. Şêwînî, wê navê yazdanekî gûtîyan jî bê. Weke yazdanê wan ê ku ew dema ku ew derdikevina şêwînê û bi sawalên xwe ve ku mijul dibûn, ku wê ew biparasta bû. Lê wekî din jî, gotina şêwînî, bi dengzanî û koka wê re wê li ser gotina ´şev´ê wê rûniştî bê. Gotina şêwînê, dihê wateya ´jîyane di şevê de´ jî. Di demsale havînê de wê pirranîya malbatên kurd, wê li çolê ji xwe re koz û kozik çêkiriban û wê sawalên xwe di wan de bicihkiriban. Wê hemû gûndî û ahlên wê herêmê wê di rex hevdû û nêzîkî hevdû de wê kozên xwe yên şêwînê wê çêkiriban.Wê tenê bi **´kêl´ û ´şikêrên**(´şikêr´, wê koma keviran a bi armanca nîşandkirinê hatina danîn li ser hevdû bê. Lê ´kêl´ wê kevir bi kevir danîna ser hevdû û bilindkirina wê bê.)´ ku di navê de didanîn re wê sînorê xwe ji hevdû cuda bikiran. Ev demsal, dema ku di wê de sawal li şêwînê dihat hiştin, weke ´xwêdana sawalan´ jî dihat binavkirin. Wê hertimî jinên malê, wê piştî şîve xwe xwarin û pê de, wê rajina stilên xwe yên şîr û wê biketan rêyên çolê ên ku wê sawalên wan li wê li şêwînê maba. Dema ku ew

diçûn, wê li cihê ku wan li wê bo maxaltina sawalan li şêwînê kifşkirîya, wê sawal li wê maxalî ban. Ew jî, wê çûban nava salên maxalî û wê bidest dohtina wan bikiran. Piştî sawalên xwe dohtin, wê li wir, şîrê xwe bihaweyn bikiran û bikiran mast û ankû panir. Jîyane şêwînê, wê weke şêwayekî jîyanê ê ku wê hertimî herkesek li derve be. Di vê dema ku wê sawal li derve ba, wê zêde ti kesek li malên xwe ne maban. Wê herkesek li derve maba. Zarok û kalên ku ew li malê maban jî, ew dîsa di hundur de ne diman. Wê ji xwe re her malbatê, di wê demê de ´**taxt**´ çêkiriba û wê cih û ankû nivînên xwe li ser wê danîban û wê li ser wê razaha ban. Her malek, wê li ser banê wê û ankû li pêşîya wê, wê taxtê wê heba. Taxt, wê cihê razana her hevînê ba. Di şevên germ ên hevînê de wê ti kesek di hundur de nemaba. Wê herkesek li derve maba. Li derve raziha ba. Xwe li derve, pirr xweş bû. Di bin stêrên li azmana de û wê hînîkayîya şevê de wê razaha ban. Dê û bav û mazinên din ên malê wê hertimî li derve bisawalan ve li şêwînê maban. Carna caran ti carî bi şevê dê û bavê xwe ne dît. Ber ku ew di wê demê de hertimî pirr meşkul bûn. Sawalgerîya kurdistanê, di wan deman de jî wê pirr zêde pêşketî ba. Herwusa, bi wê re divê ku mirov vê yekê biteybetî binxat bike û werênê ser ziman ku wê sawalgerî, wê temenê jîyane malbatî ba. Her wusa, ji şîrê wan, wê xwarinên weke rûn, mast, panir û hwd çêkiriba. Di wê demê de wê sawalên xwe bi qusandan û hirîya wê jî ji ser wê hildan û wê di mala xwe de wê bikarhanîyan. Ji hirîyê, cil û bergên malê û ên li xwekirinê ên ahlên malê dihatina çêkirin. Her wusa, wê bi wê re jî, wê kîjan sawal bi qûranda û goştê wê ji xwe re bikiran xwarin, ew jî wê di vê demê de kifş kiriban. Di vê demê de dayikên kurd, wê pirr zêde xwarin çêkiriban. Hemû xwarina ku wê çêkiriban, wê ne ji bo xwarina wê ya di wê demê de bû. Wê xwarin çêkiriban, wê hilandiban. Yanî wê vêşartiban li demsala ku wê piştre biheta. Di demsala piştre de wê, ew xwarin bikarbihanîyan. Minaq, di hemû demsalan de wê bacanên sor û reş, îsot, pîvaz û hwd, ne hatiban dîtin. W xwarinên wan û torşîyên wan cuda bi cuda wê çêkiriban û hilandiban (´vêşartiban´). Di demsalên ku ew tiştên xwarinê ne dihatina dîtin, ew bihetan bikarhanîn. Wê bihetan amel kirin.

Minaq, di nava kurdan zûwa kirina goşt, pirr zêde hebû û li pêş bû. Bi wê re wê wê goşt, tenê pêşî bi wê li ser êgir sorkirina wê re wê çêkiriba û wê hilandiba. Ji vê re jî dihat gotin ”qalî.” Xwarina qalî û ankû goştê qalî, wê biheta çêkirin û wê bihata xistin li galonan û wê bihata vêşartin li deverek ku ew xwarinê kariba xwe biparêsta. Bi vê rengê hilandina xwarinê, weke kevneşopîyekê ya. Minaq, dayikên kurd, wê li şêwînê

panir çêkiriba û bixista galon û cêrên mazin de wê devê wan bigirta bi harîya sor û wê bi salan ew di binê ardê de vêşarî bihişta. Çendî ku ew panir, wusa di şoravka xwe de dima, wê hê zêdetirî xweştir bûba. Hinek caran wê ew panirê binardkirî, wê ser sê û ankû çar salan re jî wê wusa maba û ne hatiba vekirin. Bi vê rengê wê xwarin û panir û ´rûnê malê´ wê biheta çêkirin û hilandin. ´Rûnê malê´ ew rûnê ku dema ku dayikan mast dikir meşkan û di keyend de û ji wê bidest dixist bû. Jê re ´nîvişk´ jî dihat gotin. Ew rûn, di nava kurdan de ji wê re ´nîvişk´ dihat gotin. Hertimî, weke rûnê ku wê di taştêyan de wê biheta xwarin jî bû. Lê nîvişkê ku wê zêde maba jî wê xwê bikiran û bixistan denerûn de. ´**Denerûn**´, ew jî weke cêr bû. Lê denerûn, tenê li gorî ku ew rûnê nîvişkî ku ew di wê de teze bimênê, wê li gorî wê biheta çêkirin. Cêr, noqa wê firehtir ba û devê wê zirev û li hevdû gihayî hevdû û bi destik bû. Lê denerûn, ew jî, ji wê axa ku wê çêr ji wê biheta çêkirin û weke cêr dihat çêkirin. Lê ew devê wê pirr zêde ji yê cêr firehtir bû. **Cêr**, ji cêrên mazin re dihat gotin. Lê cêrên piçûk, ji wan re yan ´cêrk´ û yan jî ´**sevîl**´ dihat gotin. Cêr, dema ku wê av û ankû tiştekî din bi heta xistina hundurê wê de wê biza ba. Wateya bizabûna cêr, ew bû ku wê waxma wê ji hundur bidaba derve û wê dervehîya wê, weke ku wê şil bûba. Ji vê re dihat gotin ´zayîn.´ Sevîl, mirovan dikarî biser xwe bikira û ji devê wê av vexwerta. Ava cêr, çendî ku wê di wê tava hevînê de wê germ maba, bi heman rengî ya sevîl jî wê wusa maba. Carna jî, dew jî dihat xistin hundurê wê, bo ku teze û cemidî **maba**. Bi pirranî, bo her sibehê taştê bi nivişkê nû were kirin, wê berî kirina taştê wê meşk biheta keyendin.

Meşk, weke çermê sawalên weke mehan bû û dema ku ew sawal dihat gûrandin, pirr li wê heydibûn ku ew çermê sawêl di dema ji ser wê kirinê de ew newê qatandin û ankû qûl kirin. Wê ew çerm, piştre wê biheta xwêkirin û sekinendin, piştre jî wê biheta paqijkirin û wê li herdû serên meşkê wê darek pêve biheta kirin ku ew jî dayikên kurd ji wê re digotin”**dêlkew**.” Dêlkew, dema ku meşk dihat keyendin, wê dayikan ew bidest bigirta û ew bikeyenda. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê meşk, bikeyendan. Piştî ku dayikan meşka xwe ya keyend û dewê xwe yê ku ew di meşkê de çêbûya wê vala bikin û wê rûn û ankû nivîşkê xwe jî ji wê derxin û wê nivîşkê xwe bikevina nava ava cemidî de. Wê hingî nîvişk xweştir bûba. Her wusa, bo ku dew jî xira nebûba û ankû tirş neba, wê bikiran cêrna de û wê di nava ava cemidî a ku ew diherikî de bicih bikiran. Piştre jî w di hundurê rojê de wê ew bivexwertan.

Bi wê re jî, dayikên kurd, wê mast bi du awayan wê hildan da. Mastê ku ew dihat hilandin, wê pêşî bikiran kîs de û wê li deverek cemidî wê dalaqandan. Wê ava mast hemû ji wê biparzinîya. Wê ew mast, pirr zêde tîr bûba. Heta ku wê carna ji panir hişktir û tîrtir bûba. Ji wê mastê re dihat gotin **´mastê kîs.´** Mastê kîs, ew mastê ku wê bi rojan biheta hilandin û wê hin bi hin ew biheta xwarin bû. Çendî ku ew dima jî, wê têj û tahma wê xweştir bûba. Carna jî dayikan, wê mastê jî li deverek avî ya ku ew diherikî û cemidî wê bicih bikiran. Her wusa bi vê rengê, wê ew mast wê hem biheta parastin bi awayekî baş û hem jî wê hin bi hin teze wê bixwaran. Bi wê rengê, w mastê wan yê kîs, wê teze bima.

Bi vê re jî, em divê ku vê jî werênina ser ziman ku dayikên kurd di wan şêwînan de ew hirîya ku wan ji qûsandina sawalan bidest dixist, ew jî jî di wê navberê de çendî ku wan dem dîtiba, wê ji hevdû vekira û wê birêstina. Rêstina hirîyê wê bi teşîyê re bûba**. Teşî**, weke amûrekî dayikên kurd ê ku wan hertimî bikardihanî bû. Her keçika ku ew dihat zewicandin û ew diçû mala xwe w dayika wê û ankû hinek mazinên wê, wê mutlaqa wê teşîyek bikiran nava cehîzê wê de û bi wê re ji wê re bişandan. Axlabê jî wê dayikên kurd ên hinek pîr, wê hertimî demek xwe ji kirina teşîyê re vaqatandan û ew tekişî bikiran. Ew rêstina ku wan bi wê dikir, wê piştre ji wê ji xwe re bo ku ew ser rûnihin wê merş û mahfûr çê bikiran. Wê ji xwe re kincên weke kenze û hwd bo demsalên sar wê çê bikiran. Bi vê rengê, wê çi pêdîvîyan hebûya, wê ji wan rêstinên xwe yên ji hirîyê wê çêkiriban. Weke karekî destê jinên ciwan ên kurd ku wê bi jîyane wan re xwediyê kevneşopîyek bi hezaran salan bê, ´naqş´ û ankû ´naqş kirin´, wê hebe. Bi naqşkirinê re wê kevîyên **lihêf, balgih, doşek** û hwd wê bihetan çêkirin. Axlabê jî, wê xalîçeyên ku wan çê dikir û bi hundurê malê ve di dalaqand ên weke ´xalîçeya şahmaran´ û hwd wê biheta çêkirin. Hertimî wê tiştên xweşik bihetan çêkirin.

Dayikên kurd, wê hertimî dema xwe li şêwînê derbas bikiran. Ew mirovna ku wê hertimî berî derketina tava rojê wê ji nava nivînan rabûban û bi karûbarên mala xwe ve biçûyan. Piştî ku wan meşk dikeyend, wê piştre hevîrê xwe bihevîrta. Piştî ku hevîrê xwe hevîrtin, wê li tirşbûnê bihiştan û wê piştre çûban tanûrên xwe wê agir di wan de pêxistan û wê ew tanûr bisincirandan û wê piştre wê nanê xwe di wê de bipijan. Tanûr, wê ew jî weke teşî û meşkê wê kevneşopîyeka nanpijtinê a civate kurd a bi hezaran salan ba.

Di vê navberê de wê di malên kurdan de wê malbat, sawalên kedî wê xweyî bikin. Herwusa, wê mirîşk, alok, kew, kevok, qaz, ordek, çêlek,

ga, hasp, meh, bizin, mambiz û hwd, bi gelek sawalên din re wê bihetan kedî kirin di malê de wê bi wan jîyane xwe bidomandan. Dayikan, bo sawalên weke mirîkan kulîn çê dikirin. Bo sawalên mazin jî avir û ankû kox dihatina çêkirin. Bo kewan û hwd jî rêkew û ankû qefes dihatna çêkirin. Her wusa, teyrikên din ku dihatina kedîkirin ên weke sûskan û hwd, wê hêlina wan biheta çêkirin. Gotina ´hêlînê´ weke gotinaka kurdî ku ew tenê bo ´hêlîna teyrikan´ dihat bikarhanîn bû. Gotina hêlînê, cihê ku teyrik ji xwe re çê dikin û di wê de distirin ji wê re dihat gotin.

Rewşa jîyane civatî a civate kurd, wê bi demê re demsal bi demsal wê bi wê re gûharîn bûban. Di vê dema hevînê de wê ji bilî wê jî wê karê çandinîyê û yê li hevdû vedana wê, wê heba. Karê vedanê genim, nîsk, nahk û hwd, ji wê re palayî dihat gotin û palayîtî, wê pirr caran wê bi malbatî çend malbat bihetan cem hevdû û wê alikarî bidan hevdû û ankû wê alî hevdû bikiran di dayina li hevdû danê de. Ardê çandiniyê ê weke yê genim ku ew di wan de dihat çandin, wê gotina ´ard´ biheta bikarhanîn. Her wusa, ardên ku di wan de tiştên weke şebeş û hwd dihatina çandin ji wan re ´rez´ dihat gotin. Her wusa ardên ku di wan de tirî û hwd dihat çandin jî wê ji wê re ´warz´ biheta gotin. Bi wê re jî, baxçeyên bo çandina bacanên reş û sor, pîvaz, îsot û tiştên bi vî rengî jî hebû û ji wan re ´tayerê ankû ´teyere´ dihat gotin. Di hundurê tayarêyê de wê mişar bihetan çêkirin. Minaq, weke ´mişara bacanên sor´, ´mişara bacanên reş´, ´mişara îsotan´, ´mişara pîvazan´ û hwd.

Li vir, ez tiştekî din jî werênima ser ziman. Ew jî, karê çêkirina ardûyê şawatê bû. Kurdan di sermeya zivistanan de wê tenê dar ne şawitandin di sobeyên xwe xwe de. Wê zibilê sawalan ji cihê wan ên ku ew di wê de diman ji koxan biheta berhevdû kirin û wê ew biheta rehnkirin û wê ji wan **´tapik´** bihetan çêkirin. Hinek jî, wê ew rehnkirina zibilê sawalan wê bi hêt ve bikira û ji wê re **´pêvadan´** dihat gotin. Ew pêvadan û tapik wê bihatan zûwakirin û hişk kirin û wê piştre bikiran deverekê de û wê muhafeze bikiran ji zivistanê re. Hema bêja, bi vê rengê, her malê wê ji xwe bo şawate zivistanê wê tapik û pêvadan çê bikiran. Ev jî, wê her sibeh, dema ku koxa sawalan dihat paqijkirin, wê biheta çêkirin.

Piştî ku dayikan ev karên xwe dikirin, wê piştre xwarina xwe li ser ´tifik´an çê bikiran. Tifik, her malê ji xwe re ji harîya sor weke tanûran bi teybet çê dikir. Amûrê çêkirina tanûran û yê tifikan yek bû. Tifik, bo xwarina rojane a malê bû. Tanûr jî, bo çêkirina nanê malê ê rojane û ankû hefteyî bû. ´Nanê şikeva´ weke navê ku ew heveyn ne dihat xistin li navê

û ew hevîrê wê ne dihat tirş kirin bû. Lê navê ´hevîrê tirş´ ew jî weke navê hefteyî bû. Heta ku nanê hevîrê tirş, heyvekê dikarî bima. Çendî ku ew dima jî wê têj û tahma wê xweştir bûba. Lê nanê hevîrê ne tirş ku weke ´hevîrê nanê şikeva´ jî di nava civate kurd de dihê binavkirin, wê ew rojane biheta çêkirin. Dema ku em bahse nan û çêkirina wê bikin, wê gelek rengên wê yên ku di nava kurdan de dihatina çêkirin, wê bi teybetî, wê were dîtin. Weke nanê şikeva û nanê hevîrê tirş, wê ´nanê sêlê´ jî biheta çêkirin. Nanê sêlê jî wê di nava xwe de wê hinek cûreyên wê heba. Minaq, weke ´nanê şilikî´, ´nanê hevîrê hinekî hişk´, ´**nanê sêlê** yê hevîrê tirşkirî´ û hwd, wê biheta çêkirin. **Nanê şilikî**´, hevîrê wê pirr zêde rehn bû. Bi dest ne dikarin ew were girtin. Bo vê yekê, wê hertimî, pêşî pişta sêlê biheta rûnkirin û wê bii zerikê hevîrê wê biheta valakirin li ser sêlê. Ev nanê ku weke nanê şilikî´ di nava kurdan de dihat çêkirin û bi navkirin, weke navê kêfê jî dihat binavkirin. Dema ku ew galonên goştê qalî dihat vekirin, wê ew nanê şilikî, bi wê biheta xwarin. Têj û tahma wan, pirr zêde xweş bû bi hevdû re.

Dayikên kurd, ez dikarim bêjim ku ew ji vê aliyê çêkirina xwarina xweş ve weke ku ew bûbû bûna pîspor. Wê çawa çê bikin, di wê çerçoveyê de wan dizanî. Minaq, dema ku panirê xwe dimeyendin, wê şînahîyên weke sîrikê berhevdû bikin û wê bikina nav de ku ew panir hê xweştir bibê. Dayikên kurd, pirr zêde bizanebûn di derbarê şênîyên di nava xwezayê de. Wan, pirr baş dikarî ji wan sûdbigirin. Her wusa, ji vê aliyê ve wê dayikên kurd, wê xwediyê navdarîyekê bin.

Her şev, dayikên kurd, dema ku sîve xwe ya malê ji malbatê re ku çê dikirin, wê li cem wê miheqqeq wê şînahiyê jî çê bikin. Minaq, pirr zêde cûreyên şînahîyên ên weke **gûriz, kereng, tolik, xaldel, parpar, qîfar, siyebê, mendê, dendeloşk, çorî, şîrkeşîn, alo, catrê, çirîş, lîş, tûsî, guhbizink, karê, rêvas, dardoraq, mêhv, şoqil** û hwd, wê bihatan berhevdû kirin û wê ji wan xwarin bihetan çêkirin. Şênîyên weke şoqil, polik, polika mêrgê, polika gilover, polika zêdegan û hwd jî, wê cûreyna geya ên ku wê hundurê wan weke libên nahkan û dibêt ku hinekî ji nahkê piçûktir bin, wê bihetan xwarin û kirina nava xwarinê de jî. Weke van cûreyên şînahî (´geya´)yan bi sedan cûreyên din hebûn ku wan ew dizanî û nas dikirin û ew berhev dikirin û ji wan xwarinên xwe çêkirin. Yanî, bi vê rengê, xwarina xwe bi pirranî ji cûreyên şînahiyê jî çê dikirin. Weke van şînahîyên ku ew ji aliyê minarelîyê ve pirr dewlemend bûn, wê mirovan ji wan xwarinên xwe çê bikiran. Her wusa, ji bo sawalên xwe jî wê rêsî ji geyayê weke onca û ankû sewere, ket, koringe, hespist, argud,

**palax**, qamûş, **gihagûl**, genimok, gonî, keşol, baqilê xatûnî, lovî, wesmê, sûs, şembelîk, darcêwî, geyaşêrînk, **gilgil, şilêl** û ankû tarigan, çexdar, geyayê **dasî**, **nefel** û hwd, dihatina çêkirin û dibirin û dikirina ´kadînên ka´ de û dem bi dem di nava kayê´ de didana sawalan. Ger geyek ji van w gelek cûreyyên wan hebe, minaq weke ´nefele sipî´, ´nefele çarpel´ û ´nefele sor´ û hwd. Gihagûl, weke cûreyekî geya ku ew dihat dayîn li sawalên mazin ên weke çêlek, ga û golikan. Lê cûreyekê geyayê gilgil, weke garisan mazin dibê û heta ku nanê wê jî weke nanê garis dihat çêkirin. Hinek cûreyên weke yên gilgil jî bi navê baçîk, ji cureyên gilgil in. Bi giştî kurd toximê vê riwekê naxwin lê ji bo çêkirina gezikan bi kar dihênin. Dema ku malîyan diçûna palayîyê û ku wan di paleyîyê de genim, nîsk, nahk û hwd, berhevdû dikirin, ew niqişkên wan ji hevdû dikirin. Ew niqiş û qirşikên wan, piştre w hûr û hûr bikiran û wê bikiran ka. Her wusa, wê piştre ´kadîna kaye genim´, **kadîna ka**ye niskê´, kadîna kaye cê´, kadîna kaye nahkê´ û hwd, wê çêbikiran. Piştre jî wê ew ´ka´, dema ku wê sawal biheta hanîn li malê û bikiran hewşê de wê, pêşî bidohtan û piştre jî wê **´delev´** bihetan danîn û wê tişî ka bikira û wê hinek ´ce´ li ser bireşandan û piştre wê, sawal bihatan berdan li ser wê bixwaran. Dema ku sawal berdan ser delevan ku ew bên êmdan(´xwarin´, di kurdî de ji xwarina sawalan re li şûna ´xwarinê´ dihat gotin ´**êmdan**´ û ankû êmkirin´ tê gotin), wê çêlîkên wan jî bên berdan berdan ku ew hinekî dayikên xwe bimên. Hertimî, dema ku dayikan sawal di dohtin, wê hinek di memikên sawalan de bihêlin bo ku ew çêlîkên wan wê bimêyên. Piştî ku wan sawalan ji delevan kaya xwe xwar, wê êdî ew bên kirin koxên wan de. Lê wê çêlîyên wan bên xistin koxna din de ku ew êdî dayikên xwe ne meyên. `çêlî´, di kurdî de navê zaroyên sawalan û ajalan bû. Navê yê mirovan jî ´zarok´ dihat gotin. L car bi car li şûna hevdû jî hatîya bikarhanîn. Ber ku wê ji êvarî û heta sibehê, wê dîsa şîr di memikên wan de wê çê bibê û wê serê sibehê, dayik, wê carek din wan pêşî bidoşin û piştre wê wan bişênina çolê ku ew bên çêrandin. Şîrê ji êvarî û heta sibehê, hertimî wê weke şîrê ku ew bê kirin mast lê dihat nerîn. Ber ku ew dema ku sawal kayê dixwe, hingî şîrê baştir dibê. Wê piştre dema ku ew maştê wê hat xistin meşkê û keyendin, wê rûn zêdetir bibê. Şîrê, dema ku sawal li çolê ya û ku ew geya û ankû şînahiyê dixwê jî, li gorî şîrê ku ew dihat kirin weke panîr bû. Di vê çerçoveyê de wê pirr baş, li ser wê bisekinîyan. Dayikên kurd, wê di vê çerçoveyê de rewşa şîr li gorî deman wê ji hevdû vaqatandan. Her wusa, ew şîrê ku ew dikirina panîr, piştre wê ew panîr biheta parnizandin û hemû ava wê ji wê biheta

derxistin. Lê ew panîr çendî ku çêbû, wê piştre ji wê ava wê jî, wê panîr biheta çêkirin. Ew jî, wê bikelandin û wê ji wê panîrê lolikî û ankû **´jajî´** wê bi heta derxistin ku ev panîr jî dikirina cêr û galonan de û ew di binard dikirin. Wê ew panîr, herî hindik, ne bin şeş(´6´) mehan re wê biheta binardkirin. Lê dema ku ew dihat çêkirin ku ew biheta binardkirin, wê gelek geya û ankû şînahiyên weke sîrikê û hwd jî, wê bikiran nav de bo ku têj û tahma wê xweş bûba.

Çêkirina panîr, her wusa, wê weke kevneşopîyeka kevn ba. Bi wê re jî meyendina mast û piştre bo ku mast tîr û xweştir bibê kirina wê ya kîs de jî, wê bi heman rengî weke kevneşopîyeka pirr kevn bê. Jîyane bi sawalgerîyê ve ku mijul dibê, di vê çerçoveyê de wê bi demê re kevneşopîya xwe bizanebûna wê re pêşbixe. Ev jî, wê bi demê re li gorî demê û demsalan û her wusa reng û şêwayên xwezayê ew dihat bizanekirin û pêşxistin. Bi heman rengî, wê jîyanek pirr bitêr wê bi heta afirandin. Her mal, herî hindîk, ku wê dema ku ardek ji xwe re diçand, wê ji wê ardê, ku genim çandiba wê genim, ku nîsk çandiba wê niskê, ku nahk çandiba wê nahk û ku tiştekî çandiba, wê wê zêdetir duqat û ankû zêdetir jî wê bidest bixista. Di vê çerçoveyê de tenê bi çandiniyê re alaqadar nedibûn. Her wusa zad û tiştên ku tiştên ku wan zêde bidest dixist, wê çawa wê biparêzên ku ew weke xwe teze û baş bimênê jî wê li ser wê jî wê serî biwastandan. Di her malê de wê ´kuwar´ û ankû ´kûwar´ên genim, ce, nîsk, nahk û hwd, wê hatiban çêkirin. Kuwar, di cihên ku wê li gorî hewaya parastinê bihatan çêkirin. Kuwar, ji hariya sor dihatina çêkirin. Tişta ku ew dihatina xistin li hundurê kuwar´an de wê genim, nîsk, ce, nahk û her wusa tiştên bi vê rengê ban. Di kuwaran de wê sal bi sal maban û wê xiranebûban. Her wusa, her kuwarek, dikarê du qama mirovan bilind û biqasî qamekê jî fireh ba. Berî ku ew palayîy bikin, wê pêşî kuwarên xwe jî bo xistina hundurê a zad re wê biheta amede kirin. Bi wê re wê bêî ku zadê wan **kifnikî** bûba wê heta demsala din wê bi heta parastin.

Çêkirina kuwaran, wê bi gelek rengê wê bûba. Her wusa, wê her malê li gorî zad û rewş û derfetên xwe wê çêkiriba. Mirovên ku di çêkirina wan kuwaran de pîspor hebûn. Ew jî, axlabê jî, wê jinên pîr ên bi ezmûn ban. Kêm carna jî wê mirovên kal, dest biavêtan wan û çê bikiran. Di nava civate kurd de gotinên weke ´kuwarên genim,´, kuwarên ce´, ´kuwarên nîskê´, ´kuwarên nahkan û hwd, pirr navdar bûn. Her wusa, ev rewşa kuwaran, wê weke rewşek teybet bê. Ji gelek rewşan re wê kuwar bi hetan çêkirin. Hinek malbatan jî, wê li şûna ku wê panîrê xwe yê ku

wê binardkiriban û hilandiban, wê ji wan re kuwar çêkiriban li gorî rewşa wê û li cihê wê û wê di wan de panîrên xwe vêşartiban ji demsalên din re. Her wusa, zadên ku wan çê dikir, wê çawa demsal bi demsal bi heta parastin û wê çawa ew malbat sal bi sal, wê ew xwariba û wê pê dabara kiriba, ew temenê wê dihat çêkirin.

Di her malekê wê wê li pêşîya tanûr û tifika wê, di cihekî hundurê wê de wê kuwarên wê yên genim, nîsk, nahk û tiştên û hwd wê heban. Bi wê re jî wê kox û govên sawalan wê hatiban çêkirin. **Kox,** ji cihên sawalên mazin ên weke çêlek û hwd re dihat gotin. **´Gov´** jî wê ji cihê sawalên weke bizin, meh, kahrik, golik û hwd re biheta gotin. Wê gov, beş bi beş bihetan çêkirin di hundurê xwe de. Di hundurê her govekê de wê herî hindîk sê û ankû çar beşên ku wê bi wan sawal ji hevdû bi heta cudakirin wê heba. Minaq, di govê de beşa baranan, beşa nêrîyan, beşa bizinan, beşa mehan û her wusa beşên çêlîyên sawalan ên weke golik, gîsk, kahrik, berxik û hwd jî wê heba. Dema ku malbatan kerîyên sawalên xwe li şêwînê dihiştin, wê her wusa bi heman rengî li derve di kozên ku wan ji xwe re çêkirina de wê biheman rengî wê beşan ji sawalên xwe re çê bikin. Di vê çerçoveyê de wê jîyanek di ahengekê de wê ji xwe re ava kiriban. Ev rewşa bi alaqadarbûna bi sawalan û hwd re girêdayî dihatina pêşxistin. Bi heman rengî wê gelek tiştên cûda wê biheta çêkirin. Malbatan, wê ji xwe re hem raz û hem jî warz wê çêkiriba. ´Raz´, ardê ku wê di wê de tiştên weke genim, nîsk, nahk û hwd bi heta çandin bû. Her wusa, razên ku wê di wan de şînahîyên weke şebeş, tirozî û ankû acur, patîx, kundir û hwd jî bi heta çandin wê heban. Di her demsalên ku wê şênîyên xwe bihildan ji destê wê bo şebeş, patiz, tirozîyan û hwd, wê ´fireze´ wê bi hetan çêkirin û wê ew fireze, bi hewaya wê re wê li gorî rewşên parastinê bi hetan adilandin. Bi heman rengî wê firezeyên bo warzan jî wê bi heta çêkirin. ´Warz´ jî, ji ardê ku wê di wê de tirî û şênî û fêkiyê weke tirî û ankû tirh biheta çandin re dihat gotin. Ji darên tirî re di kurdî de tê gotin **´mêv´ û ankû ´mêw´,** ji darên tirî ên ku ew pirr mazin û bilind dibin û şaq didin jî ´dêlî´ tê gotin.  Di nava kurdan de zanebûna bi tirî, wê pirr zêde wê heba. Gelek cûreyên tirî dihatina çandin, her wusa tirîyê reş, tirîyê sipî, tirîyê mazrona û hwd a. Esirandin jî ji kirina Tirî li çiwal de û bi lingan diperçiqînin û ava wê diderxinê re tê gotin. Ji vê re tê gotin etf.  Piştî qurafa tirî, ji navê tiriyê ku wê di rezberê de çêdibe re tê gotin. Harsim, navê weşiyê (tiriyê) yê ku ew hê negihayî ya. Mehsere(´mahsir´) jî, navê cihê ku tirî lê  tê esirandin a. Miştaxe jî, navê cihê ku tirî ji bo hişkbûnê lê tê dayîn û **tirî** bi wê hişkkirinê re dihê kirin

mewûj û hwd a. **Qurafa tirî**, navê danhevdina tirî ya ji warz a. Weşî jî, navê guliya tirî ya. Hinek cûreyên tirîyên ku ew li kurdistanê çê dibûn jî navê wan **amobengîyo, balme, bilbizêkî**, bînetetî, devrovî, dêwanî, bisthêşin, ezazî, gewrikî, gozane, hemsî, hesenî, hewsorik, hewtop, hezîranî, kerkûşî, koxer, işqir, lipgolik, misepq, mezrone, nasirkî, payîzîkî, pozgolik, qerfok, qizlêr, sincêrî, sivnikî, tayîfîkî, tehnewîyîkî, tilhesenîkî, tirêçemîley reş, tirêbolmazû, tirêçemîle, tirêdomîle, tirêgundke, tirêkajaw, tirêmambiray mî, tirêpaşayî, tirê payîzî, tirêreşmirî, tirîreş, tirêsadanî, tirêsadanîy reş, tirêserqûleyî, tirêsipîkekî, tirêsûraw, tirêteyef, tirêxoşnaw, tirêzilkê, tirêzûres, tiriyê reqanîkî, topsipîkî, toranekî, tortork, xanoq û hwd in. Ev tenê çend ji wan cûreyên tirî na ku wê bihetan çandin bûn. Her wusa, teybetîyên kîja cûreyê tirî çawaya ew dihat zanîn û fahmkirin. Hinek ji wan cûreyên tirîyan, ji hinek nexweşîyan re jî wê dihat gotin ku baş dihat. Ev cûreyên tirî, wê di serdemên berê ên kevnera ên serdemên qasît, gûtî û hûrîyan re pirr zêde bihetan çandin. Her wusa, di van deman de biqasî ku em tê digihin tê dîtin ku kurdan ´şarab´ jî çê dikir. Hinek, cûreyên tirî, ku wê pirr baş bûba û şaraba wê pirr baş bûba, wê ew tenê bo çêkirina şarabê wê bi heta bikarhanîn. Her wusa, hinek tirî û cûreyên wan jî pirr baş û xweş bûn ew dema ku ew dihatin kirin weke mewûj. Mewûjên ji wan cûreyan pirr xweş bû. Hinek cûreyên tirî jî wê basîq û halîla wan pirr xweş bûba ku wê ji wan basîq û halîl bi heta çêkirin. Basîq, dema ku ew avatirî dihat kelendin û bi tevlîkirina hinek tiştan û ku ew dihat rijandin li ser paçekî, û ku ew piştre li zûwabûnê li ber tava rojê dihat danîn, wê piştre ji wê basîq çêbûba. Lê çêkirina halîlê, hinekî din cudatir bû, ew jî, hinekî pêvajoyên wê yên cuda hebûn. Hinek tirî jî pirr başbûn ji çêkirina dimsê re. Hertimî, weke şîranî, ku wê ji tirî biheta çêkirin, di nava kurdan de pênc tişt pirr navdar bûn.Ew jî, **basîq, halîl**, **dims**, **mewûj** û **kakil** bû. Kakil jî, navê xwe ji kakilê guzê digirt. Ji bilî tirî, ji xorma û tûyan jî dims dihat çêkirin. Dims an jî dimis, xwarin û vexwarinek ji tû an tiriyê esirandî ku hatiye kelandin û bûye pelûl çêdibe. Li kurdistanê, darên tûyan pirr zêde hebûn. Tûyên sipî û sor pirr zêde gelek danhev dikirin. Tûyên sor, şêrîn û miz bûn. Lê tûyên sipî, pirr zêde şêrîn dibûn. Bo vê yekê, **rêçel** jî dihat çêkirin. Guz dihat şikandin û hundurê wê ne dihat hiştin ku ew zirerê bibînê û were şikandin. Wê ew piştre bi ser tayan ve kiriban û wê ew ava ji tirî ku ew weke çawa ku ya dimsê dihat amede kirin ku ew jî dihat amede kirin, wê ew bo kakilan jî wusa biheta amede kirin û ew ´kaklên guzan´ û ankû ´kakilên guzan´ guzan ku bi ser ta ve

hatina kirin wê ji nava ava tirî a tîr ve ew biheta derbas kirin û wê piştre ew biheta dalandin û li zûwabûnê bihiştan. Ew kakilên guzan, bi salan wê maban û ew her çendî ku wê zêde maban jî wê têj û tahma wan xweştir bûban. Bi heman rengî, weke ku çawa di demên ku kurdan, berê şarab çê dikirin de ku ew şaraba ku çê dikirin di demên dirêj de didan hiştin, bi heman rengî, wê halîl, basîq, dims û kakil jî wusa bi hetan hiştin li demê. Bi salan wê maban. Her ku ew diman jî, têj û tahma wan xweştir dibû. Çendî ku ew di germiyê de jî û di sermeyê de jî maban jî wê xira nebûban. Ev rengên şîraniyê ku ji tirî dihatina çêkirin, bi teybetî wê bi zêdeyî di êvarê zivistanê ên sar de wê bi hetan xwarin. Ber ku wan, ew di laşê wan de germ dihişt. Bo vê yekê, wê hertimî ji van demên sar ên zivistanê re wê gelek tişt amede bikiran û hilandan ji şevên zivistanê ên sar ku wê di wan de bixwaran. Li kurdistanê, her çar demsalên ku ew dihatin û derbas dibûn, her yekê, wê li gorî hewaya wê, wê bi vî rengî tişt ji wê re amede bikiran. Di vê çerçoveyê de zanebûna xwezayê û ya jîyanê û jîyankirinê wê bi hevdû re di ahengekê de wê bi heta jîyankirin. Jîyane bixwezayê re wê di vê çerçoveyê de wê di ahenge xwe de wê xwe bide domandin. Ev rengên afirandina jinên kurd di nava civate wê de wê weke kevneşopîyekê bi zanebûn bibin û wê di her demê de wê xwe bidina domandin. Her wusa, kevneşopîya bi çêkirin, afirandin û hilandin û parastinê re wê di vê çerçoveyê de wê derkeve li pêş.

Lê weke van aliyên ku me hanîn li ser ziman, wê hê gelek aliyên din jî wê hebin. Em divê ku wan jî werênina ser ziman. Bi teybetî, ji aliyê xwarinên ku ew li kurdistanê di nava civate kurd de dihên çêkirin, bi teybetî weke tiştên ji meyendin, ji tirî esirandin, ji tiştên weke tirozî, bacan, îsot, kereng û hwd, wê weke tiştna ku re tên çêkirin ên ku ew zanebûna wan hatîya bidestxistîya. Minaq, ´tirş kirin´ weke tiştên ku wê soravka wan were çêkirin ji xwê û baharatên wê ên weke smakê, limonê û hwd, piştre wê tiştên ku wê werina tirşkirin wê werina xistin li navê û wê bên hilandin. Çanda tirşkirinê weke ya meyendin û esirandinê û hwd, wê di nava civate kurd de wê dîroka wê pirr kevn herê. Heta serdemên qasît, gûtî, hûrîyan û wê herê. Weke navê ´tûrşû´ di kurdî de wê ji gotina **´tirş´** û ankû ´tirşkirinê´ wê were derhanîn. Heta ku ev kevneşopîya ku ew di nava civate kurd de wê bi hezaran salan bijî, wê piştre di nava xalkên din jî bi navê xwe yê weke **´tûrşû´** û hwd wê bicih bibê.

Kurdan, navê ´tirşî´ li gelek xwarinên din jî dikirin. Minaq, xwarinên weke ku ew bi bacanên sor, reş, îsot û hinek cûreyên din ên weke ku wan tevlî hev dikin û ji wê re dibêjin tirşik jî wê çê bikiran. Ev rengên

xwarinê, wê weke xwarina nava rojê wê hertimî bi heta çêkirin. Tirşik, dema ku ew tê çêkirin, wê pêşî bacanên reş bi kêrê bi hetan birrîn(´qatkirin´) û w dinava rûn de wê qalandin, piştre wê îsot jî di cih de wê bi hinek tiştên din ên weke wan re wê wusa bikiran, piştî ku ew hat qalandin, wê piştre bacanên sor ên hatin qatkirin bi kêrê, wê bi avêtan nav û li kelandin bihiştan li ser êgir. Dema ku goşt jî dihat avêtin nav, wê pêşî goşt di beroşek din de wê hatiba sor kirin û wê biheta avêtin li nava wê. Wê êdî tirşik, wê hin bi hin çêbûba. Piştre wê xwarinên bi vî rengî ên ku wê werina çêkirin, w cûreyên wan zêdetir werina kifşkirin û çêkirin. Ev jî, wê bi demê re wê **bûba**.

Bi vê rengê çanda xwarinê û pêşxistina wê, hinekî jî rengê pêşketina şariştaniyê û pêvajoyên wê bûhûrîna jî wê di derbarê wan û pêşketina wan de wê têgîn û têgihiştinekê bide me. Her wusa, weke ji şîr, bi meyendinê çêkirina mast û panîr, ji tirî bi esirandinê çêkirina dimsê, ji tirşandinê çêkirina tiştên xwarinê ên weke tûrşû û hwd, wê were pêşxistin. Di vê çerçoveyê de ev çendên civatî, wê piştre jî bi civakên ku wê derkevina dika dîrokê re jî wê bicih bibin. Bi tirşkirinê re wê fêkî, di nava şoriyê de tên sekinandin û ev rêbaza han mejûyê bikaranînê dirêj dike. Ji demên pirr berê ve ev teknîk hatiye bikaranîn ku mirov bikaribin zivistanê jî fêkî û sebzeyan bixwûn. Ev şêwa, wê di demên pêşî ên şariştaniyê de wê bi sedema ku wê fêkî û tiştn xwarinê ên weke bacan, îsot û hwd, ku ji demsala wan hat bûhûrîn di demsalên piştre jî mirov karibin wan bixwûn, wê bi wê armancê pêşî wê were kirin. Lê piştre ev wê weke teknîk û şêwayek xwarinê wê were pêşxistin. Di demên berê de wê sarincok û hwd, bo cemidandinê û hwd, wê nebin. Mirov jî, wê li rê û rêbazên ku ew karibin di wê şêwayê de tiştan bo xwarinê dirêj bihêlin, wê van rêbazan bikarbênin. Bi heman rengî, mirov divê ku bibêjê ku tirî, piştî ku ji mêwên wê hatina qûtkirin û pê de wê zêde ne menê. Di dema kin de ew divê ku ew werê xwarin û bidawî kirin. Dema ku ew newê kirin, wê were avêtin. Her wusa, kifşkirina çêkirina tiştên xwarin û vexwarinê ên weke dimsê û hwd, wê weke bersivek aqilê mirov ji vê rewşê re jî bê. Bi heman rengî, mirov dikarê bo mastê ku ew hatî meyendin jî mirov dikarê werênê ser ziman. Piştî ku mast, hat meyendin û pê de, di demek kin de ew dema ku ne hat xwarin û xilaskirin, wê tirs bibê û wê tahma xwe xwe ya xweş wê winda bike. Weke rêbaza pêşîya wê girtinê jî wê kirina mast li kîs de wê were kifşkirin. Di vê çerçoveyê de wê, bi ceribandin û kifşkirinê re wê pêşxistin wê were kirin.

Di vê çerçoveyê de em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku civate kurd, zêde di serdemên me de mafê xwe pêşxistin û pêşde birinê ji wê r ene hat hiştin. Bo vê yekê jî kurdan, di çanda xwe ya xwarin, vexwarin, li xwekirin û jîyankirinê de bi kevneşopîkî li aqilên xwe yên civatî ên ku wan berê kifşkirina di jîyankirina wan de israr kirina. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê rengên jîyane xw eya berê wê bi xwe re wê bijîn. Wê hewl bidin ku wan di demên berê de çi kirina di jîyanê de bi kirinê re bidomênin. Xwarinên wan, wê hertimî weke xwarinên ku wê ji cûreyên şênîyên xwezayê bin. Î ro jî, em dema ku li xwarinên wan dinerin, wê di vê çerçoveyê de bijîn. Minaq, dema ku mêwên tirî çandina, ji wê tirî girtina. Piştre jî, ji wî tirîyî dims, basîq, halîl, şarab û hwd, çêkirina. Her wusa ji pelên mêwa tirî, xwarina ´piraxê´ çêkirina. **Pirax,** weke xwarinaka pirr kevn ya ku ew ji aliyê civate kurd ve dihat çêkirin a. Mirov dikarê vê xwarinê jî weke xwarinek civatî ya kurdan bi nav bike û werênê ser ziman. Pêşî peln mêwa tirî ber ku tirş bûn, savar û ankû birinc kirina nava wê de û ew bi rûn û avê re kelendina. Ev xwarin, wê piştre gelek cûreyên wê werina çêkirin. Her wusa, weke pelên mêwê, wê pelên xaldelê jî wê werina çêkirin. Pelên tolikê wê werina çêkirin. Ev jî, weke xwarinên ku wê çêkirina wan li ser genim ba. Kurdan, bo vê yekê, di nava xwe de bi kifşkarî wê şêwayên bi karhanîna genim, pirr zêde pêşbixin. Destar, wê weke kifşaka wan ya civatî a aslî bê. Her wusa, destar, ew bû ku wê ji kevir çê kiriban. Wê du kevir, gilover û xweşik bi hetan qawirandin û wê danîban ser hevdû û w yê şer qûl kiriban û darek xistibanê û wê zîvirandiban. Genim jî, dema ku wan ew kevirê ser di zîvirand, wê di nava herdû keviran de ku wan vala li ser dikir, wê hatiba hûrkirin. Piştî ku genim hat hûr kirin, wê ji wê genimê hûrkirî re wê bigotan ´savar.´ Çêkirina savarê jî, wê pêşî genim bi kelendan di nava vê de û wê piştre ew zûwa bikiran û piştre ew genimê kelendî û zûwakirî wê bi heta hêrtin di nava kevirên destêr de.

Savar, hebûn û xwarina wê di nava kurdan de weke xwarina ´bereketê´ tê bi navkirin. Di aslê xwe de pirranîya xwarinên weke ji genim çê dibin, wê wua werina dîtin. Minaq, ev weke kevneşopîyeka bi hezaran salan a civate kurd a, ku dema ku ew nanê xwe bixwûn û piçûk nanê wan ê ku ew dixwûn ku ew bikeve ardê de ew gûnah dihê dîtin. Bo vê yekê, ji serdemên kevnera ve kurdan, hertimî, cilikên ku wê li ser xwarina xwe dênin û wê bxwûn çêkirina. Ev kevneşopîya kurdan, di olên civatî ên pirr-yazdanî û yek-yazdanî de wusa heya.

**Savar**, weke xwarinaka teybet a kurdan a. Her wusa, ev xwarina savarê, wê di demên berê de wê li gorî rewşên jîyanê wê gelek cûreyên wê çê bikiran. Minaq, savar, ji xwarina savarê a ku ew hatîya çêkirin û hinek zûwa ya û ku bi goşt û hwd dihê xwarina re dihê gotin. Lê savara hinekî rehn jî ji wê re kurdan digot ´**danaxab**´ Danaxab, weke xwarina savarî a hinekî şil û rehn bû. Bi teybetî jî, ev cûreyê xwarinê, dema ku mirov li palayîyê dima, wê bixwara. Bi teybetî, wê carna jî goştê sor wê bi heta qalandina di miqilkê de wê biheta xistin di nava wê de. Piştî ku ew goştê sor di miqilkê de dihat sorkirin û qalandin, wê biheta xistin nava beroşa savara danaxabî de.Ev xwarin, weke xwarinek cihêreng bû. Car bi car jî, dema ku ev danaxab, dihat çêkirin geyayê weke xaldelê û hwd jî w bi heta xistin li di nav de. Lê xaldel ne bi pelên dihatina xistin di nav de wê, bi ra û qûrmmikên wê, biheta xistin di nav de. Pelên xaldelê wê ji çêkirina ´piraxan´ re wê pirr başban.

Di nava kurdan de weke çêkirina savarê û gelek cûreyên wê, wê bi genim jî wusa gelek cûreyên xwarinî bi hetan çêkirin. Minaq, xwarina ´**danûk**ê´ û ya ´**meyîr**ê´, mirov dikarê binav bike û li vir navê wan hilde. Ev herdû xwarin jî, wê ji genimê kelendî û ku hatî kûtayî di cêrn de wê biheta çêkirin.

Li vir, ev vê yekê bi teybetî binxat bikin û werênina ser ziman ku wê weke destar, teşî, tanûr, tifik û hwd ku ev di nava kurdan de hatina pêşxistin, wê her wusa ´cêrn bi mêkûtê wê re´ wê pirr zêde navê wê derketiba li pêş. **Cêrn**, ew jî ji kevir bû. Wê kevir, pirr xweşik hundurê wê bi heta qawartin. Piştre jî, wê bi heta rast kirin. Piştî ku ew hat çêkirin wê mêkûtê wê bi heta çêkirin. **Mêkût**, wê ji darê ba. Ew jî, bo ku dema ku genim hat xistin hundûrê cêrn de ku ew karîba ku biheta lêdan û ankû weke ku di nava kurdan de dihat gotin, wê biheta ´kûtandin.´ Dema ku genim di hat kelendin, wê piştre ew genim li zûwakirinê bi heta hiştin li ber tava rojê. Piştî ku ew genim hat zûwa kirin, w piştre bi heta xistin li hundûrê kîsan û wê weke hefteyek û ankû du hefteyan wê li hişkbûnê bihiştan. Heta ku ew genim cardin weke berê cardin hişkbû, êdî wê ew genim bihanîyan ber cêrn û wê piç bi piç wê bi heta valakirin li hûndûrê cêrn û wê bi heta lêdan û ankû kûtan. Kûtana wî genimî wê biheta kirin di cêrn de heta ku ew genim bi ´kelpikî´ bûba. **Kelpik**, ji w kalikê li ser genim ku ew piştî lêdanê di rabû re di hat gotin. Bo ku ew genim bûba savar, danaxab, danûk û meyîr û hwd, divîyabû ku ew **kelpîk**a li ser wê hemûyî hatiba rakirin. Ew **kelpik**, piştî ku ew rabû, wê piştre ew genim, weke ku ew êdî baş hatî kûtayî wê li heta nerîn û wê ji cêrn bi heta

derxistin û wê hinekî li ber tava rojê li zûwa bûnê bi hiştan. Ew kelpik jî, weke cûreyekî zad ê dewlemend dihat lê nerîn. Lê bi pirranî, wê ew kelpik ji aliyê dayikan ve wê bi heta danahev û wê ew biheta hilandin. Piştre jî, dema ku delevên sawalan ka dihat xistin wan û hinek ce bi ser dihat raşandin, wê bi wê re hinek ew kelpik jî wê, li ser wê kayê biheta raşandin ku ew sawal bixwûn. Dayikan bawer dikir ku ew kelpik, dewlemend a û wê pirr zêde şîr bi sawalên weke meh, bizin û çêlekan re bida çêkirin. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê dayikan, wê di dayina tiştên weha de wê pirr heyîdar ban. Minaq, bawer dikirin ku kelpika genim şîr zêde dike. Yên nîskê û nahkan jî, wê bi şêwayna din, wê bi heta bikarhanîn. Nîsk, dema ku ew ji ardê dihat hildan şîn a. Lê dema ku ew dihat hêrtin bi destar, wê sor bûba. Wê kelpika xwe ji xwe biavêta. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku dayikan, wê gelek cûreyên xwarinan bi nîskên nehêrtî ên şîn û ankû reş wê çê bikiran. Biheman rengî, wê bi nîskên hêrtî ên sor jî wê çê bikiran. Piştî ku hinekî ew genim hinek xûwa bû û pê de, wê êdî ew genim, wê di demek ku ba dihat de wê li ber bayê rojê ku ne zêde bihêz tê wê hildan û berdan ardê. Di wê demê de wê genimê ku libên wê hinekî giran wê biketa li cihê xwe û wê kelpika wê jî, li hinekî li rez wê biketa. Wê bi vê rengê ew kelpik û genimê ku ew ji hundûrê wê kelpikê derketî wê ji hevdû bi heta cûda kirin. Ev genimê ku hatî cuda kirin, wê li du beşan bi heta beş kirin. Beşa pêşî, wê wusa bihiştan ji çêkirina xwarinên weke meyîrê, danûkê, gebelorê û hwd re. Beşa duyem jî, wê birina ber destar wê bihêrtan. Genimêdi destar re di hat hêrtin, wê du şekl û awayê wê ji wê hêrtina wê derketiba. Şeklek û awayek, wê pirr zêde hûr ba ku ew ji ber ku pirr zêde hûra wê ji wê re bi heta gotin ”dank”. Lê ya ku zêde nehûr hatîya hêrtin jî ew jî savar bû. Dank, pirr zêde wê ji ber ku ew hatibû hêrtin û hûrkirin, wê ne hatiba bi karhanîn ji çêkirina xwarinên weke savarê re. Wê ev ´dankêhûr´, wê pirr zêde wê ji çêkirina xwarinên weke ´kûtilkan  hwd re bi heta hiştin. Xwarinên weke **kûtilk**an, divîyabû ku ew danê wê pirr zêde hûrba. Divîyabû ku libên mazin di navê de neba. Dema ku danê kûtilkê ava germ ket navê de divîyabû ku weke hevîr lê hatiba. Bi wê re jî jî divîyavû ku hevdû bigirta. Bo vê yekê, wê hertimî genimê ku wê dayikên kurd bi destar bi hêrta wê li du beşan beşkiriban. Beşa pêşî a wê êdî wê danê savarê ba. Beşa duyem jî w dankêhûr ê kûtilka û hwd ba. Di vê çerçoveyê de wê dema ku kûtilk çêkiriban jî, wê tiştên weke goştê hûr û hwd, wê bikiran hundûrê wê de.

Genimê ku hatî kelendin û piştre ew hatî kûtandin di cêrn de jî wê, ew genim ji wê xwarinên weke meyîr çê bikiran. Di nava kurdan de ber ku wê pirr zêde sawalgerî di nava wan de bi jîyanî li pêş bê. Wê ji wê şîr, mast û hwd jî wê pirr zêde hebûba. Her sibeh, wê meşk bi heyendan. Dewê ku wan ji meşkê derdixist, wê heta êvarî bikiran ku wan hinekî vexwera. Lê wê ti carî nikariban hemû devê ku di meşkê de çêkirina wê xilas bikiran. Car bi car, wê bikiran cêr û sevilan de ku ew cemîdî û teze maba. Lê dema ku wê dem hatiba berêvarî, wê her wusa, êdî ew dewê ku ji ber wan maya, wê pirr bûba ji çêkirina meyîrê re. Êdî wê ew danê meyîrê, wê pêşî bikiran nava avê û wê hinekî bi dest kelendinê bikiran. Piştre jî, wê êdî av ne berdan li ser û wê çendî ku av divîyabû ku berdaban li ser wê, wê li şûna wê dew berdaba li ser wê danê ku wan ew dikelend. Ew jî, wê piştre wê xwarina meyîrê, wê jê derketiba. Meyîr, piştî ku ew hat çêkirin, wê piştî çêkirinê, bi du cûreyan wê bi heta çêkirin. Cûreyê pêşî wê ´şortan´ wê bi heta xistan li navê de bo ku ew meyîr têj û tahma wê xweş bibê. Ev meyîra bi şortan, wê hertimî weke meyîra ku wê di şîvê de wê bixwaran ba. Şortan, wê hinekî meyîr, ji aliyê av û baharatên wê ve wê dewlemend bikira. Lê beşa din a meyîrê, wê şortan ne kiriban li navê, ew cûreyê meyîrê ku wan şortan ne kirîya navê de jî wê ew meyîr, weke meyîra ku wê di nava rojê de sar bixwaran. Carna jî ev cûreyê meyîr, dayikan di bir û li cihê herîkînên avê bi cih dikir bo ku ew baş bi cemidê. Wê meyîzendan kûdera avê pirr zêde cemîdîya, wê li wir meyîra xwe bicih bikira. Bi teybetî, dayikan, hertimî di herîkînên avê de wê ´kêzînên´ sergirtî di wê herîkîna avê de çê bikiran û ewder hertimî wê bo lê danîna xwarina xwe bikarbihanîyan. **`kêzîn**´, wê devera herîkîna avê a bi kevir û sergirtî ba. Di deverên ku av li wan diharikê de wê her mal wê ji xwe re kêzîna avê wê çê bikira. Herkesek kêzîneka wan ya avê di rex hevdû de hebû. Carna jî, wê malbatan bi hevdû re heman kêzîn wê bikarbihanîya. Li ser kêzînan û mast û xwarina ku wê were xistin li wan de wê, di nava civate kurd de wê gelek çîrok û çîvanok jî wê werina gotin. Herî zêde jî çîrokên ku wê di wê de bahse jinaka pîr bike ku ew hertimî mastê xwe dike hundurê kêzînê de û ku wê rovîyek fêrî wê cihê bibê û wê her roj bi dîîzîka wê herê ji mastê wê bixwê. Çîrokên bi vî rengî ên li ser avê û û hwd, wê di serdemên gûtî û hûrîyan de wê, zêdetir werina afirandin û ser ziman. Minaq, bi dev û lêv kirina ajalên avî û hwd, wê di vê çerçoveyê de werina vegotin. Meselokên ku wê li ser mirovên ku ew di avê de dijîn û dema ku jineka bizaro û xizan ku ew beroşa mastê xwe bi piçek mast dikê kêzînê û ew

dema ku tê ew dibînê ku wa beroşa wê tişî mast bûya, wê werina vegotin. Meselokên jinên ku ew li devê kêzînan li hevdû digihina li hevdû û ji hevdû re divebêjin û piştre di nava xalkê de belav dibin, wê weke çîrokên civatê wê di civatên jin û mêran de wê werina ser ziman. Her wusa, wê gelek çîrok jî li ser kêzînê ku wê jin dema ku herina kêzînê û ku wê beroşên xwe derxin, wê bibînin ku wa marekî xwe li beroşa wan pêçaya û ew mar yan ji wê beroşê divexwe û yan jî, hema wusa tenê xwe lê pêça ya.Bi zêdeyî, wê dew biheta xistin li kêzînan de bo cemidandinê. Di wê rewşê de jî wê bi wê re vegotin li ser rovî bi hetan vegotin ku rovî, diçê û ji wê divexwe. Vegotin û çîrokên li ser kêzînan û li dora kêzînan ku ew dihên vegotin, wê ti carî dawî li wan newê. Bi wê re jî, wê pirr bi zimanekî xweş û herikbar wê werina vegotin. Di hinek caran de wê avê di bin latên mazin de wê bi herîkîya. Ew latên mazin ku av di bin wan de di herîkî, wê dora wê bi kevirkên piçûk biadilandan û wê xwarina xwe li wir bicih bikiran. **Kêzîn**, hertimî weke sarinc(´bozdolabê´)a dayikên kurd bû. Wê karê wê ji wan re bidîta. Wê xwarina wan teze û cemidî hişta. Mirov dikarê weke sarniça xwezayê jî kêzînê werênê ser ziman.

Xwarinên weke meyîrê, mastê kîs û ankû mastê ne di kîs de, her wusa, gelek cûre xwarinên din ên bi vî rengî wê di wan kêzînan de biheta bicih kirin. Di nava rojê de dema ku dunya germ bû, wê tiştên weke tirozî, şebeş û hwd jî, wê di wan kêzînan de bi heta bicihkirin berî ku ew bihetan xwarin. Di nava rojê de w, tava rojê pirr germ bûba. Bo vê yekê, di vê demê de ku mirov çûban palayiyê jî, wê dev ji kar û barê xwe biqaraha û wê biheta male. Di malê xwe de wê ew li hundûrê ne sekinîyan. Wê ji derve cihn weke cihên kêfê û bêhnstandinê û li wê rûniştina bi civatî wê bi hetan çêkirin. Ji wan re jî cihên ´**arzêl**´ dihat gotin. `Arzêl´, cihên ku wê ser wê bigirtan ku tava rojê lê nedaba ba. Bi wê re jî wê hînik ba. Mirov ji wê li wê li hevdû bicivatî rûniştan. Di demasala hevînê de wê, weke ku çawa ku di her şevê de li hevdû bi civatî rûniştiban, wê di wê demê de jî wê bi civatî li hevdû rûniştiban. Di dema ku ew li hevdû rûniştina jî, wê xwarinên weke kakil, basîq, halîl, mewûj, şebeş û hwd jî wê bi hevdû re bixwaran û wê bi hevdû re bi axiftan. Di vê çerçoveyê de wê, kêfa xwe bikiran û têja û tahma wê derxistan. Ev dem, weke demna di hevînê de ku wê pirr germ ba. Bo vê yekê, wê kurdan, wê li wê jî hizirîyan. Dema ku diçûna kar, wê pêşî heta nêzî dema firevînê wê bixabitîban. Piştre jî, wê navber bidan. Ji vê re digotin ”navbera rojê.” Wê piştre jî wê bi hetan malên xwe, heta demên berêvarî wê biman, bêhn

bistandan, û wê piştre jî cardin wê biçûyan û wê hinekî din wê karê xwe bikiran.

Ev demên ku wê weke demên navbera rojê ban, wê demna xweş û geş ban. Çendî ku mirovan, wê ji derve xwe biavêtan li hundûr û wê li derve ne maban jî, lê wê ev dem ji xwe re xweş kiriban. Wê çûban civatên hevdû. Di bin wê sihwanên ku wan ji xwe re ew bo ku li bin wê bijîn, wê xwarinên xwe bixwaran, wê piştre li hevdû rûniştan û wê ji hevdû re biaxiftan. Di demên berê ên gûtî û hûrî û mîtannyan de wê kurdên mitrayî, wê di bin tava rojê ya germ de wê bi hevdû re bimeşîyan. Her wusa ev weke nîşanaka xwe şanî yazdanê mazin bidan û li ber wî biçûyan bergê, lê dinerîn.

Di nava jîyane rojê de wê, di vê demê de wê hinek kar û xabetên ku wê kiriban wê ji xwe re bidîtan. Bi teybetî, jinên pîr û kal, di demê de ew dema u rûniştin, wê axlabê, wê tiştên weke kenze û hwd wê bi hûnan. Keçikên ku gihayî na, wê li hevdû bicivîyan û wê hem ji hevdû re bi dengên xwe yên ku wan li hevdû dihanî wê mamik ji hevdû re bidengbêjî bigotan û wê di ber re jî wê naqşên xwe bikiran. Ew naqşên ku wan dikir, wê cehîzê wan ba. Hemûyan jî, di wê dema ciwanîya xwe de sandoqek wan hebû û hertiştên xwe yên ku wan bi naqş, hûnandinê û hwd, ku çê dikirin û xilas dikirin, wê bikiran wan deran. Her wusa, axlabe jî, wê jinên ciwan ên zewicî û ankû ên hinekî pîr jî dibê ku wan tevnên xwe li dar dabin û wê di wê dema rojê de wê herin tevnkirinê bikin. **Tevn**, wê weke karekî ku jinan bi hevdû re bi kêf dikir bû. Her wusa, wê hem bi xweşî weke bi dengbêjî wê bidina berhevdû û hem jî wê karê tevna xwe jî wê bikiran. Jin û dayikan, bi wan tevnan tiştên weke marş, berrik, mahfûr û hwd, wê çêkiriban. Her wusa, wê gelek cûreyên wan di nava xwe de wê çêbkiran. Her wusa, ev tiştên ku çê dikirin bo rûniştinê, wê her yekê bi deverekê ba. **Mahfûr**, wê weke marşa li ser rûniştinê a mezela mêhvanan ba. Ew pirr xweşik û bi qadr di hat çêkirin. **Marş**, wê weke marşa mezele ku wê dayikî wê biheta bikarhanîn bû. Her wusa cihên ku wê lê razahaban jî wê li wê marş danîban. **Berrik** jî, wê weke marşa li ser rûniştinê a wê li ser banan, li ser arzêlan, li deverên ku wan weke sihwan bo rûniştinê ji xwe re çê dikirin, wê li wan danîban û li ser wê rûniştiban. Berrik, ji tarîşên ku wê ji cilên kevn biheta çêkirin û bi teşîyê bi heta rîskirin jî dihat çêkirin. Lê marş, bi tayên hatina teşîkirin ew dihat çêkirin. Wê tevn bo wê hatiba li daxistin û wê marş bi wê biheta çêkirin. Ji hirîya sewalan dezî çêkirin, piştre wê rengên cuda dayîna wan deziyan û her wusa bi mehan çêkirina mahfûran ve mirov bi naqş û

afrînerên xwe yên hunerî pêk bênin. Tevnên marşan û darberên mahfûran ên ku wê bi wê mahfûr weina çêkirin, wê heba. Ji tevnên mahfûran ên ku ew ji ardê bi daran bi hêt bilind dibû, dihat gotin ´darber´. Wekî din ji tevnên marşan ku ew li ardê dirêj bi dirêj dihatina danîn jî, wê tevnên dirêj jî wê bi heta gotin.

Lê bi teybetî, bo zivistanan, wê axlabê, marşên mahfûrî û kûlav wê bi hetan çêkirin û wê bo ser wan rûniştiban. Ber ku ew di wan deman de pirr germ bûn. Marşên kûlavî, wê tenê ji hirîya sade, safî û zelal wê bi heta çêkirin. **Marşên kûlavî**, wê ew ne bi tevnê çêkiriban. Ew, wê li ser paçekî wele marşê, wê hirîya sade wê rastkiriban û ku bixwestan hinek naqşkirinan jî bidinênê de wê li ser zemîna bi hirîya sipî wê hirîya reş û ankû rengek din wê bi wê çêkiriban. Piştre jî, ku ew karê wan bi dawî bû, wê ew hîrya rastkirî wê hinekî av daban û wê li hevdû badaban. Piştî ku ew pirr xweşik û hişk li hevdû badan, wê biheman rengî bi benên qayîm jî wê ew pirr jidahî wê girêbidan. Piştre jî, wê weke bangor wê dest û mil bidan hevdû wê ew li ardê weke bangor wê bixindirandin. Herî hindik, wê sê mirov li aliyê pêş û sê mirov jî ji aliyê paş ban. Yên pêş wê bi aliyê yê paş de bixindiranda. Yên paş jî wê bi aliyê yên pêş de bixindiranda. Bi vê rengê wê bi ber hevdû ve bixindirandan. Lê dema ku ew kar dikirin jî, wê êdî bi dengbêjkî bê û ankû bi awayna din bê, wê bidan berhevdû. Bi vê rengê wê navbera xwe jî xweş bikiran. Herî zêde di vê rewşê de wê mirovan bi zêdeyî wê hanak wê li hevdû biikiran. Bi hanakan, wê laqirdiyên hevdû bikiran. Wê dev biavêtan hevdû. Wê li ser hevdû meselok bigotan û wê bi hevdû re bikenîyan û wê dilê xwe li hevdû û bi hevdû re wê xweş bikiran. Ev rewş, wê herî hindik, hefteyekê û ankû du hefteyan bi wê şêwayê xindirandina bi ba hevdû ve wê bikiran. Lê çendî ku wê di van demn xwe yên îstirahatê de wê ev kar bikiran jî, dem bi dem wê di êvarên sar ên zivistanê de wê ev kar bikiran. Ew sarbûna xwe, wê bi wê rengê wê li xwe germ bikiran. Wê xwe jî bi wê germ bikiran. Ev kar, weke karekî malbatî jî dihat kirin. Bi teybetî,jinan wê pêşî marşa kûlavî wê amede bikiran,wê hirîya wê rast bikiran û wê naqşên wê bi avêtina li ser wê, û wê piştre li hevdû badaban û wê bi benan jidahî wê girêdabidan. Lê ew karê xindirandinê, carna wê jinan bikiran. Lê axlabê, wê mêran ew xindirandin bi hevdû re bikiran. Heta ku wê mirovan, di nava rojê de xaber û agahî bidan hevdû û wê li hevdû bi civîyan û wê bi alikarî wê bi hevdû re bikiran. Ev kar jî, di nava xwe de di wergerandin li şêx û şengê di nava xwe de.

Karê çêkirina marşan, wê di nava civate kurd de wê, pirr pêşketî bê. Her wusa, weke ku çawa ku wê keçikên kurd, dema ku ew li hevdû dicivin û bi naqşan wê gûl, nêrgiz, çîçek û tiştên xweşik wê naqş bikin, wê bi heman rengî jî, dayikên kurd, dema ku ew wan marşan çê dikirin, wê naqşên xweşik di wê de bidina çêkirin. Rengên ku wê li berçav baldar bin û balkêşîya mirov bikişênina li ser xwe wê di wan de bikarbihanîyan. Her wusa, rengên weke rengên sor, kesk, zer, şîn, sipî, xaml û hwd, wê çend ji wan rengên ku wê dayikên kurd wê bi zêdeyî bikarbihanîyan.

Di çêkirina marşan de wê, pirr reng bi hevdû re bikarbihanîyan. Her wusa, dayikên ku wê, hertimî, li rex karên xwe yên ku wê bikiran, wê tevn jî li dar xistiban. Wê tevn kiriban.

Bi wê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku çêkirna marşan û bi teybetî jî çêkirina marşên kûlavî, wê dayikên kurd, wê pirr zêde li ser wê bisekinîyan. Di aslê xwe de ew marşên kûlavî, wê di ancama kedeka komî de wê bûba. Dema ku wê marşa kûlavî were girêdan, êdî di çêkirin, rastkiri, xindirandin û hwd de wê, bi hevdû re ew bikiran. Marşên kurd, wê bi du cûreyan wê pirr zêde wê bikarhanîyan. Cûreyê pêşî, bo ser rûniştinê bû. Di zivistanan de wê, pirr germ ban. Di aslê xwe de weke ku dayikên kurd, car bi car digotin ´marşên kûlavî, marşên germ ên zivistanan bûn ku wê zivistan germ bide derbaskirin bi mirov.´ Ev rast bû. Marşên kûlavî, germbûn. Lê ew marşên kûlavî, cûreyê wê yê din jî, ew bû ku ew marşên kûlavî, ku ew piştî hat çêkirin, wê ji wê **´kûlavê şivanan´** wê bi heta çêkiribûn bû. Ji xwe, navê ´kûlav´ bixwe jî ji wê tê. Kûlavê şivanan li kurdistanê pirr zêde navdar bû û bi nav deng bû. Gelek cûreyên wê dihatina çêkirin. Di sermeya zivistanê de wê mirov, dema ku ew bi rêwîtîyekê ve herê û yan jî ew dema ku weke şivan her bersawalan, wê kûlav li xwe bikira. Wê hingî, telûkeya cemidînê û ankû qufilînê wê derbas bikira. Mirovê ku ew ji sermayê pirr cemidî û laşê wî raharî, wê ji wê rewşa wî re di kurdî de bigotan **´qufilî´** ya. Qûfilî, di kurdî de navê cemidîna laş a. Her wusa, mirov dema ku ew li bersermayê ma û cemidî, wê hingî jê re bêjin ew qûfilî ya. Bo ku mirov ne qûfilî ba, wê kûlav jê re biheta çêkirin. Her wusa çekêtên kûlavî, hinek ji wan(´cûreyek ji wan´) dihatina çêkirin bo ku mirov di jîyane xwe ya asayî de li xwe bikira bû. Lê cûreyek jî wê weke kûlav, wê bi armanca ku mirovê çû bersawalan ku ew li xwe bike, wê çê bikiran. Hingî, dema ku mirov ew kûlav li xwe kir, ew çendî di bin sermayek giran û cemidî de jî ba, wê ew bi wî kûlavî wê germ maba. Wê ew zêde ne cemidî ba.

Çêkirina kûlavan, wê di nava kurdan wê weke kevneşopîyeka pirr kevn ba. Ev kevneşopîya civate kurd, wê civate kurd, hinekî jî zêde pêşketina wê, sedema wê ew bû ku mirovên andamên civatê, wê pirr zêde bi sawalgerîyê ve alaqader bin. Jîyane şîvaniyê wê her wusa di nava kurdan de wê hertimî pêşketî heba. Li dora wê jî, wê çawa sawalan xwedî bikin û wê ji wan sûdê wergirin, li ser wê jî pirr bûbû bûn xwediyê mejiyekî pêşketî. Di mejiyê xwe de wê gelek kifşkirinan di vê warê de wê bidan kirin. Wê li dora şivaniyê û sawal, cohtkariyê û çandinîyê, wê jîyanek civatî a pêşketî bi xwezaye xwe re wê bi rêxistin bikin û wê pêşbixin. Di vê çerçoveyê de wê, temenê dabara xwe ya li jîyanê pirr zêde pêşbixistan.

Jîyane civatê, di vê çerçoveyê de wê pirr zêde pêşbiketî bê.Di nava kurdan de wê, her demê, jîyane şivaniyê wê pêşbikeve. Di aslê xwe de em divê ku bibêjin ku ´koçerî´ hinekî bi jîyane wê re wê rêxistiniya jîyane şivaniyê bê. Mirovên ku wan koçerî dikir, mirovna bi war û xwedî xwedan û mal bûn. Lê li kurdistanê, di demsalna de wê geya û şînahîya hin herêma kurdistanê weke ku wê li ber diclê û firatê wê bibê, wê zêdetir bibê û wê dewelemendtir bûba. Her wusa, dema ku sawalan jî li wan deran biçêra, wê şîr zêdetir bidan. Wê zêdetir, xort, geş û mazin bûban. Bo vê sedemê, wê malbat, ji xwe re bi aşîrî ku wê gelek mal bihevdû re bin, wê ji xwe re konan çê bikin û wê herina wan herêmên wê şînahî û geya lê zêde wê hebe. Li wir, wê demsalekê bi malbatî bi sawalên xwe re derbas bikin. Di hundurê wê demê de wê, ji sawalên xwe heta ku wê ji wan were wê şîr hildin û wê ji xwe re panîr, nîvişk û mast û hwd wê ji sawalan bigirtan bi çêkirinê re. Bi wê re jî, bi qûsandina sawalan re wê gelek hirî bidest bixistan. Bi wê re jî wê ji xwe re tişt di male xwe de wê çê kiriban. Piştî ku demsala wan derbas bû, wê piştre bi sawal û tiştên ku wan ji xwe re çêkirîya weke panir, nîvişk û hwd, vegerîyan li malên xwe.

Her demsale biharê diçûn û dema ku ew divegerîyan li malên xwe, wê hinekî din desttişî û dewlemend vegerîyaban. Jîyane koçerîyê, wê di xate şivaniyê de wê bi jîyane bixwezayê re wê xwe bide nîşandin û domandin. Her wusa, bi wê re jî, wê xwediyê pergalek xwezayî a jîyanî bê. di nava wê jîyanê de kifşkirinên ku mirov bi aqilê xwe re kirina, weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman, wê li ser temenê wê jîyanê û li ser temenê ji wê baş sûd wergirtinê ba.

Li vir, em dema ku bahse jîyane li kurdistanê bikin, em divê ku bi du aliyan re wê hildina li dest. Aliyekî li ser jîyane koçerîyê û xate ya wê ji

jîyane şivaniyê û hwd re hilde li dest. Her wusa aliyê din ê duyem jî, em dikarin li ser jîyane cotkarî û çandiniiyê re wê hilde li dest. Aliyê pêşveçûnên bi jîyane cotkarî û çandiniyê re wê bi xwe re pêvajoyên bi bi ber yên jîyane bicihbûyî ên şariştaniyê ve wê bide jîyankirin. Lê bi wê re jî, wê di dewama wê de w, hin bi hin hinekî ji têgîn, vac û rastîyê xwezayê jî wê dûrketin bibê. Lê vajî wê jî wê bi jîyane koçerîyê re wê xwe bide nîşandin. Koçerî, weke rengê jîyane ku ew ti carî di nava pêvajoyên jîyane şariştanî de ku ew li gorî têgîn û rastîya şariştaniyê ahl û kedî nebûya ya. Lê jîyane cohtkarî û çandiniyê, mirov dikarê divê çerçoveyê de wê werênê ser ziman. Di jîyane cohtkarî û çandiniyê de wê zêdetirî bi jîyankirina bi şariştanî û hwd re wê jîyane bib û wê bi wê re bi jîyane cohtkarî û çandiniyê re wê ahlbûn û kedîbûn wê bibê. Çendî ku wê cohtkarî û çandinî jî temenê wê ji ser xwezayê û sûd girtina ji wê jî bê, lê wê di jîyankirinê de wê tenê li ser ancamên wê re bi jîyane xwe ya şariştanî û civatî re wê bijî. Her wusa, wê di mejiyê xwe de mirovê cohtkar bi karê xwe yê çandiniyê re wê ne weke yê mirovê koçer zêdeyî bi xwezayê re bê. Mirovê koçer, wê bi şivaniya xwe re wê jîyanekê bi xwezayê re wê ava bike. Wê bi wê re fêrî jîyane bike. Wê çawa bi wê û bi xosletên wê bijî, li ser wê re wê kifşkirin, fêrbûn û ezmûnê di mejiyê xwe de dide çêkirin. Ancama pêşveçûn û pêşketinên herdû xatên jîyane koçerîyê û ya cohtkariyê, wê di pêşketinên şariştanî û jîyankirina wê de wê ji hevdû cuda bibin. Weke ku kurd jî di nava xwe de dihênina ser ziman li ser jîyane koçerîyê û ya cohtkariyê dibêjin ku ”mirovê koçer, jîyane wî jîyane li zozana ya. Mirov cohtkar, mirovê ku ew jî yê jîyane wî li deştê ya.” Bi vê rengê wê ji hevdû cudakirina wan werênina ser ziman.

Jîyane deştê, her wusa, jîyane bicihbûyî ya. Mirovê jîyane deştê, ew ji cihê xwe naçê zozana. Ew hertimî li herêma xwe ya. Wê çawa dabara xwe bike, ew li wê di cihê ku ew li wê dijî de li wê dihizirê. Her wusa, bo vê yekê, mirov deştî, wê hertimî ji xwe re weke cohtkar bê û çandiyê bi cûreyên wê re wê bike. Di vê çerçoveyê de ew jîyane xwe bi çandiniyê re derbas dike û dabara xwe jî bi wê re dikê. Lê mirovê koçer, ew çendî ku weke mirov bi cih û ware jî, ew li gorî jîyane xwe ya şivaniyê tevdigirihê di nava xwezayê de. Her wusa ew jîyane xwe bi xwezayê re dihûnê. Mirovê koçer, mirovê şivane jî. Her wusa, mirovê şivan, wê xwedî sawal bê û wê çawa dabara wan sawalan di nava jîyane xwezayê de wê bide kirin, li ser wê re hertimî li w dihizirê. Bo vê yekê, ew xwezayê, şînahiyên wê û her wusa kîjan şînahî û ankû geya baş a û an jî ne baş a,

wê dizanê û wê li gorî wê tevbigerihê. Di vê çerçoveyê de ew weke mirovê ku wê herî zêde karibê xwezayê nas bike bê. Ji xwe ku ew wusa nasnekê, wê nikaribê di nava wê de bijî.Bo jîyankirina bi wê re û her wusa dana jîyankirinê sawalên xwe ev yek wê bo mirovê koçer û ankû yê şivan, wê weke pêwîstînî û pêwîstîyekê bê. Em dema ku di vê çerçoveyê de li pêşveçûnên bi her aliyên jîyanê re dinerê jî, wê ancamên wê cuda bin. Mirovê, koçer, wê bizêdeyî, bi sawal re wê panîr, rûnênîvişk, hirî, mast û hwd, wê zêdetirî bi wê re hebe ku ew diafirênê bi sawalên xwe re. Mirovê cohtkar jî, wê bi wî re bizêdeyî wê genim, nîsk, nahk, tirî, şebeş, û hwd, hertişta ku ew bi vê rengê dihê çandin wê bi wî re wê hebe. Di vê çerçoveyê de wê şêwayekî jîyanê wê bijî. Li kurdistanê, gelek xoslet û teybetîyên ku me dikarin bi jîyane koçerîyê re kifş bikin hena.Her wusa jîyane berî ya demên şariştaniyê, di wê de wê cohtkarî û çandinî û hwd nebê. Wê tenê nçîrkirin û bi wê re ku hin bi hin pêş dikeve kedîkirin û ahlkirna sawalan wê pêşbikeve. Bi wê re jî, ew jî wê bi wan re hin bi hin jîyane xwe bide derbas kirin. Bi vê rengê, ya ku em bi jîyane koçerîyê re dibînin teybetîyên jîyane berî ya şariştaniyê na. Her wusa, piştî pêşketina şariştaniyê, wê êdî ew jî bike ku ew jîyane koçerîyê di nava wan pêvajoyên jîyane şariştaniyê de bijî. Ya ku wê hetimî weke ku kurd wê dihênina ser ziman ku ´wê di temenê nelevkirina jîyane koçerîyê ya şariştaniyê de bê, wê ew rengê jîyanê bê.” Her wusa dîsa kurd li ser vê nelevkirina jîyane koçerîyê bi ya şariştaniyê re dibêjin ku ”jîyane koçer a li zozana û jîyane cohtkar a li deştê, wê ne li hevdû bin.´ Kurdan beremberî gotinên ´jîyane zozana´ û ´ jîyane deştê´, wê gotinên weke **”jîyane torê” û ”jîyane çolê”** jî wê pêşbikevin.

Em dema ku li ser serdemên berê ên hûrî û mîtannîyan jî dinerin, em dibînin ku wê her wusa gotinên weke ´jîyane torê´ û ´jîyane çolê´ wê hebe. Her wusa, di vê demê de jî wê ev gotin werina bi karhanîn. Zerdeşt bixwe jî, tê gotin ku mirovê ku ew tê ku wî bikujê, wê mirovekî ji ´herêma torê´ bê.

Ev rewş, her wusa wê bi xwe re têgînekê bidina dîyarkirin. Jîyane civatî a kurdan, di vê çerçoveyê de wê di nava xwe de wê di serî de wê bi du dîmenên sereka wê di nava xwe de wê xwediyê pêşketinê bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê hertimî, çendî ku weke ku nakokî jî di nava wan herdûya aliyan de wê hebe, wê kurd hewl bidin ku ew ahengekê di nava jîyane deştê û jîyane zozanan de bidina çêkirin. Jîyane deştê, weke jîyane bicihbûyî a bajarîyî û ankû gundûyî jî mirov dikarê werênê ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê jîyane deştê û ankû jîyane torê wê xwe

bide dîyarkirin. Di aslê xwe de jîyane deştê û ankû jîyane torê, wê didina nîşandin ku wê civat, di nava xwe de bi pêvajoyên pêşketina civatî wê serdemek nû ya bajarvaniyê jî êdî wê bidest pêşketina wê û jîyane wê bikin. Her wusa, pêvajoya jîyane şariştaniyê a vê demê ku wê bi gotinên weke ´jîyane deştê´ û ´**jîyane torê**´ re li kurdistanê werê ser ziman, wê pêvajoyek pêşketina bajarvaniyê jî bê di pêvajoyên pêşketina jîyane civatî a li kurdistanê de.

Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku jîyane bicihbûyî û ku ew di nava xwe de pêşketîya û bi kevneşopî û rêzikên xwe yên pêşketinê pêş dikeve, wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, wê xalkîtî û ankû xalknasîya ku ew pêş dikeve, wê di nava xwe de bi ciaknasîyekê re wê bidest pêşketina xwe bike û wê civakatîyekê bidest pêşxistina wê bike. Bi vê rengê wê êdî civaketî wê derkeve li holê. Pêvajoya bajarvaniyê, mirov dikarê weke pêvajoya pêşketina civakatiyê a civatî jî werênê ser ziman. Her wusa ev pêvajoya jîyane şariştanî, wê weke pêvajoyek giring a civatî bê.

Piştî pêşketina van pêvajoyên jîyane civaketî, wê êdî hertişt di cihê xwe de wê were kirin û pêşxistin. Cohtkarî û çandinî wê zêdetirî pêşbikeve. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê nêçîrvanî kêm bibê. Wê sawalên ku ew hatina ahlkirin û ankû kedî kirin, wê êdî were îstihmal kirin. Wê ew werina bikarhanîn di jîyanê de. Di vê çerçoveyê de wê ev pêvajoya jîyanê a civakî ku wê pêşbikeve, wê bi xwe re kedîkirin û ahlkirina sawalan bi pêşketina cohtkarî û çandinîyê re di ahengekê de wê bide pêşxistin. Ev jî, wê pêvajoyek zêdetirî civakî û ku wê di wê de wê xweza êdî wê ne weke berê wê li pêş bê, wê pêşbikeve. Di vê demê de wê bajarvanî, wê bi girseyên mazin re wê were û bijî. Her wusa, ew jî, wê rewş û şert û mercên jîyanê cudatir pêşbixe. Jîyane li kevîya bajaran û ankû hinekî ji bajaran dûr a li gundan û hwd, wê li gorî şert û merc û civaknasîya xwe wê pêşbikeve. Ev jîyane li van deverên kevîyan, wê zêdetirî bi xwezayê re bê û di nava xwezayê de bê. Koçerî, wê zêdetirî li van deveran bi pergalî wê xwe li ser şivaniyê re wê bide domandin. Her wusa, wê zêdetirî, di vê çerçoveyê de ev jîyane di nava xwezayê de wê li vanderan derkeve li pêş. Di aslê xwe de ev rewş, wê ji aliyê civaknasî ve wê du rewşên ji hevdû cuda wê bi xwe re wê bide nîşandin. Her wusa, du rengên jîyanê ên ku wê bi hevdû di nava nakokîyê de jî bin wê derkevina li holê. Jîyane bajarvaniyê ku ew pêş dikeve, wê di nava xwe de wê li ser cohtkarî û çandiniyê û çêkerî (´esnafî´ û ´çêkerîyên weke hesinkarîyê û hwd ku wê di nava xwe de pêşbixe wê jîyane wê bide domandin. Jîyane

li zozana a koçerîyê, wê bi tememî weke ku wê li keviya vê jîyane bajarîyê li aliyê wê yê derve wê bimênê. Lê ew jî, di nava xwe de wê pêşketina xwe li gorî şêwa û rengê jîyane xwe ya bi xezayê re û bi şivaniyê re wê bide domandin. Di vê çerçoveyê de jîyane li keviya a koçerîyê, wê weke jîyane li zozana, wê bimênê. Jîyane li bajaran a bi pêşketina wê re wê weke ´jîyane li deştê´ wê reng û awayê xwe wê bistênê.

Lê li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku mirov nikarê, tenê bi vê rengê jîyane zozanan weke jîyane li keviyê werênê ser ziman. Di aslê xwe de ku mirov, tenê bi vê rengê werênê ser ziman wê ev weke ne fahmkirinekê jî bê. Li vir, ji wê zêdetirî, divê ku mirov jîyane zozanan, bi xosletên jîyane berî şariştaniyê re wê werênê ser ziman. Her wusa, li vir, li kurdistanê wê jîyane, hertimî lingekî wê jîyane zozana a bi xwezayê re bê û lingê din ê duyem jî wê bi jîyane deştê a li bajêr û ankû li navendê bê. Di vê çerçoveyê de wê di aslê xwe de jîyane bi du xatan li kurdistanê, wê hertimî hebûna xwe bide domandin. Xatek jîyane li zozanan a. Xate din a duyem jî wê jîyane li deştê bê.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku ev herdû xatên jîyanê wê ji temen ve bi têgîn û zanebûnî bê jîyîn. Her wusa, ji herdû aliyan û xatan ve wê zanebûn hebê. Wê pêvajoyên pêşketina jîyanê wê hebin. Wê serdemên xwe wê bi jîyanî bijîn. Ev jî, wê aliyekî din ê rengê jîyane li kurdistanê bê. Pêvajoyên jîyane civatî a li kurdistanê, di vê çerçoveyê de wê weke pêvajoyna ku wê di zikhevdû de bi awayekî pirrdîmenîtî wê bijî. Lê ez vê yekê jî werênima ser ziman ku wê ev herdû xat û ali, wê di jîyane civatê de wê weke ku wê hevdû temem bikin wê ji aliyekî ve wê di ahengekê de jîyanê bi xwe re bidina li berçav. Cohtkar bi çandinîya xwe wê, pêwîstînîyên jîyane civatê ên weke genim, nîsk, nahk, tirî û hwd, wê werênê li cih. Her wusa, wê koçer jî, wê ji aliyê xwe ve wê bi çêkirina zêde panîr, rûnnîvişk û hwd re wê biheman rengî bersivê bide. Koçer jî, wê pêwîstîya wî bi genim û nan wê hebe. Her wusa çohtkar jî wê ya wî bi panîr û rûn hwd wê hebê. Ji vê aliyê ve wê hevdû temem bikin. Wê herdû alî jî wê zêde biafirênin û bi hevdû re di çerçoveya jîyane civatî de wê parve bikin. Ev jî, wê êdî temenê wê bê ku wê herdû alî jî hebûna xwe li ser esasê pêwîstînî û pêdivîyan û hwd, wê bi jîyane xwe ya civatî re wê bidina domandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê jîyane civatê, di vê çerçoveyê wê ji aliyê koçerîyê ve wê bi xwezaya xwe re wê bijî. Wê biheman rengî wê ji aliyê cohtkarî û çandiniyê ve jî wê jîyanek

şariştanî a bi temen wê bi xwe re bide pêşxistin û rûnandin. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê bi awayekî xweza, wê di nava civatê de wê her demê, li parastina ahenge di nava van herdû alî û ankû xatên jîyanî de wê li wan were lêgerîn. Jîyane koçerîyê, wê ji aliyekî ve li kurdistanê, wê ne li ser esas û temenê aşîrên kurd ên koçer ve wê xwe bide domandin. Yanî, ev rewş, ne tenê weke rewşa mirovekî û ankû kesekî bû. Wê bi komî wê biheta kirin. Bo vê yekê, wê bihevdû re tevbigerîyan. Wê di aliyê parastinê û bi hevdû re afirandinê û hwd de wê, bi hevdû re tevbigerîyan. Wê bo parastina jîyane xwe wê bi hevdû re tevbigerîyan.Weke malbatekê wê hemû aşîr û hwd, wê tevbigerîya. Wê di nava xwe de wê bi vê rengê têkilî û benên jîyanî wê bi afirandan.

Jîyane civatê, di vê çerçoveyê de wê li kurdistanê, di awayekî de wê xwe derbas bike. Em divê ku pêvajoyên jîyane civatî a li kurdistanê, ji pirr aliyan ve bi awayekî pirr dîmenî wê werênê ser ziman. Her wusa, em dema ku aliyê jîyane koçerîyê li kurdistanê fahm nekê, mirov wê jîyane zozanan fahm nekiribê. Bi wê re jî, dema ku mrov jîyane li zozana fahm nekê, mirov wê di fahmkirina jîyane li deştê de wê kêm bimênê û bi wê re jî mirov, wê weke mirovekî bi lingekî bimênê di fahmkirina xwe de. Her wusa, fahmkirina herdû aliyan wê di çerçoveya jîyane civatî a li kurdistanê de wê hevdû temem bikin. Li vir, bi gotinekê jî bê, ez bibêjim ku wê ti teorîyên ku temenê wan li ser fahmkirina bi pênebarîyê û ankû goçberîyê hwd bê, wê nikaribê jîyane koçerîyê bide fahmkirin. Têgînên li ser goçberîyê, jîyane mirov û ankû aşîrên ku cih û warên ku ew berê lê dijîn ku wê diberdin li şûn xwe û ew diçina devereka din ku ew li wir bijîn. Lê koçer, ne wusa ya. Koçer, ew bi cih û war a. Bi malbat a. Ew, li gorî demsalên salê, tevdigerihê. Di demsalên kurdistanê de wê, di dema sale ku şênî û geya zêde geş û gihayî bê, wê koçer li wê cihê ku ew der ji aliyê çêrandina sawalan ve baş a, wê li vir bigerihin û wê bi sawalên xwe re herina li wir û li wir konên xwe vedin. Piştî ku demsal derbas bû, wê ew jî konên bidina li hev û wê bidest vegerîna li mal û cihên xwe yên ku ew bi malbatî berê lê dijîn bikin.

.

**Şêwaye jîyanê, mal û malbat û têkilîya civatî. ..**

Em dema ku bahse jîyane civatî bikin, em divê ku hebûna malbatê, bi malê re weke rastîyek bingihînî di temenê wê de bi pêşketina wê re werênina ser ziman. Her wusa, rengê pêşketina jîyana civatê, pêşveçûnên jîyanî û hwd, wê xwe bi jîyane malbatî re wê bide nîşandin. Li vir, wê malbat, bê weke pro-tîpa jîyane a bi wê fahmkirin jî bê. Em li vir, divê ku

vê yekê bi teybetî werênina ser ziman ku wê, kevneşopîya jîyane malbatê wê bi demê re wê biafirê. Di nava malbatên kurdî de wê, kevneşopîyek jîyanî wê bi demê re wê bafirê. Her wusa divê ku mirov vê yekê werênê ser ziman, wê di nava jîyane malbatî a civate kurd wê, gelek nîşanakên berî dema şariştaniyê û jîyane wê ya malbatî wê hebin.

Em dema ku li navaroka hundurê wê dihizirin, her wusa mirov vê yekê biawayekî vekirî, em dibînin ku jîyane civatî, ew rengê wê yê ku heya, wê li ser xwe re bi pêvajoyên ku wê bûhûrandina wê têgînê di derbarê xwe de bi mejiyê mirov re bide çêkirin. Malbat, dema ku em wê bikin ku werênina ser ziman, divê ku em wê ji aliyê fizyolojikî, gîyanî û derûnî ve bi teybetî wê hildina li dest. Mirov, weke zindiyekê, wê weke jin û mêr, li hevdû hoyandî wê bidest pêşketin û jîyane xwe bikin. Her wusa, têkiliyên waan ên zayendî ku ew dibin, wê di vê çerçoveyê de jî wê xwediyê wateyekê bin.

Di nava jîyane civatê de wê, di serdemên berî şariştaniyê ên weke peleolîtîk û neolîtikê û hwd de wê bi awayekî vekirî werê dîtin ku jîyan bi li dora jinê bi bûna ji wê a zarokan re wê kombûn çê bibê. Ev rewş, dema ku ew dihên û digihijina dema neolîtîkê, wê bi awayekî vekirî wê werina dîtin ku wê wê jin bi zarokên wê re wê derkeve li pêş. Di aslê xwe de wê jin, ji aliyekî ve wê temenê bicihbûnê bê. Piştî ku zaroka wê bû û pê de, wê êdî ew bi zaroka xwe re nikaribê zêde digerînê de bê. Bo vê yekê wê jin, li deverên ku ew dikarin li wê bijîn, wê bicih bin. Wê li wan deveran wê, demên dirêj wê bimênin. Wê, debara xwe bi nêçîrkirin re wê bikin. Lê demê re wê mirov fêrî nasîna xwarina hinek geyayên ji xwezayê jî bê. Di nava xwezayê de wê gelek sawalên ku ew tenê geya dixwûn, wê hebin. Di aslê xwe de ev rewş, wê li berçavên mirovan bi awayekî vekirî wê were dîtin. Mirov wê bibînê. Wê di destpêkê de wê ji wan weke taqlîdê bike. Ev jî, wê piştre hin bi hin weke rêyek xwe jîyankirinê wê pêşbikeve.

Cûreyên geyayên ku mirov dikarê wan bixwe û bi wan bijî, wê werina kifşkirin. Ev jî, wê li rex nêçîrkirina jîyane mirov wê weke rêyek nû ya xwe jîyankirinê bê di wê dema ku mirov bicih dibê de.

Lê mirov wê bi wê re bi sînor nemênê. Wê bi demê re wê êdî wê bidest kifşkirina bi aqilê xwe bike. Gelek tiştên weke nêçîrkirinê û kifşkirina geyayên ku mirov dikarê wan bixwe, wê bi dûbare kirina wan re wê ezmûn û fêrê bi mirov re bide çêkirin. Ev ezmûn û fêr, wê di destpêkê de wê bihîsîyeta mirov a ku mirov wê hema bêja weke aqilê xwe bikardihênê, wê bi wê re êdî wê bikarbênê. Di vê demê de deng,

bêhnkirin û hwd, wê ew jî, weke rêyna girtinê bin. Her wusa, piştî pêşketina hîsîyeta mirov bi vê rengê bi awayekî teybet, wê êdî ew jî ji mirov bidest wê bike ku ew bibê alikar.

Mirov, wê êdî wê bidest jîyane xwe bi vê rengê bike. Wê hin bi hin wê li ser ezmûn û fêrên xwe re wê bidest jîyînê bike. Dema ku mirov xwarinekê dixwezê, wê ji têja wê, hîskirinê bike. Ew têja ku mirov hêsê kir, wê bike ku mirov wê cardin bixwezê ku ew bixwe. Mirov, di vê çerçoveyê de xwestekên mirov ên ajoyî, wê ew jî êdî wê ew di vê çerçoveyê de wê bidest alîkarîyê bikin. Xwestekên ajoyî, wê piştre wê bina weke ezmûnekê. Piştre jî, mirov wê dûbare wan xwestekan bike. Ev jî, wê bi wê re wê bidest bandûrkirina li mejîyê mirov bike. Mejiyê mirov ê ku ew jî gihaya ku ew êdî di xwe de bigirê, wê êdî wê bidest girtina di xwe de bike. Xêva mirov a ku afirîya ji girtinê re wê êdî bi malik û beşên xwe re wê xwe bi afirênê û wê bidest girtinê bike. Mejî, di vê çerçoveyê de wê ezmûnên ku ew jîn dike, wê bi fêra wan re wê di xwe de bidest pêşxistina aqil bike. Aqil, wê êdî bidest pêşketina xwe ya li jîyanê bike. Di jîyanê de wê mirov, êdî piştî pêşketina aqil re wê bidest bikarhanîna aqilê xwe bike. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku aqilê mirov, wê di vê çerçoveyê de wê bi aqilkirinê re wê, wan ezmûn û fêran wê bi awayekî afrînerî wê bidest bikarhanîna wan bike.

Ev rewş, wê bê temenê wê ku mirov êdî wê biaqilê xwe bidest kifşkirinan bike. Her wusa, wê di temenê van rewşan de bicihbûyîn weke malbatî, wê weynek mazin bileyizê. Bandûra malbatbûnê a li ser pêşketina aqilê mirov, wê pirr zêde wê hebe.

Malbat, wê weke rewşek bingihînî û hîmekî temenî ê ku wê li ser wê re ev pêşketin bibin bin. Malbat, di aslê xwe de wê bi rewşa xwe re wê rewşek xêvî a giring jî wê bileyizê, di van pêşveçûnên mejiyê mirov de. Malbat, weke rewşek bingihînî, wê temenê girtina di meji de jî wê ji aliyê xwe ve wê bide çêkirin. Wê kirinên ku wê werina kirin, wê di nava malbatê de wê bi armancekê wê werina kirin. Ev jî, wê wê kirinê, wê bide jîyankirin bi jîyane malbatê re. Mirov dema ku wê birçî bê, wê ji xwe re xwarinê tederîk bike. Her wusa wê herê nêçîrê. Wê nêçîrkirinê bike. Jîyane destpêkê a seretayî(´îlkel´), wê di vê çerçoveyê de wê xwe bide jîyankirin û domandin. Her wusa wê bide pêşxistin. Dema ku nêçîrkir, wê tişta ku ew nêçîr kir, wê werê hanîn li malê û wê di malê de ku çend mirov hebin û dijîn, wê bi hevdû re bixwûn. Wê bi hevdû re parve bikin. Rastîya pêşî, a malbatê wê li ser esasê parvekirinê wê xwe bide pêşxistin.

Jîyane malbatî, a bi hevdû re ku ew, çendî ku pêş dikeve û pêde diçê, wê li mejiyê wê ezmûn û fêrên bi jîyankirina wê re wê lê zêde bibin. Li kurdistanê, wê fêrbûnên li ser jîyane malbatî re wê dîroka wan zêde kevn herê. Her wusa, ev herêm, li wê herêmên avî û ên ku wê temenê jîyane bicihbûnê ku wê bidina mirov ku mirov li wê bicih bibê, wê zêdetir bide mirov. Minaq, di vê çerçoveyê de nîşanakên ku wê li bakûrê kurdistanê wê ên bo jîyane destpêkê a bicihbûnê wê, têgînek baş bidina me. Minaq, **´şikefta hîlêrê´** a li erxanî û li **´şikefteya hasûnî´** a ku li farqînê, wê di vê warê de wê weke cihna ku wê li wan bicihbûn, wê pirr zû destpê bike. Nîşanakên jîyane bicihbûyî a destpêkê wê tenê li van herêman herê li dora deh-hezaran berî jîyane îsa. Her wusa, şikeft û herêmên li çîyayê zagros, qandil û û hwd, wê weke nîşanakên jîyane bicihbûnê ên zêdetir kevn wê bi xwe re bidina nîşandin**. Şikefte şanîdarê**, bermehiyên ku wê ji wê derkevin, wê vê rastiyê piştrast bikin. Herêmên rojavayê kurdistanê ên weke herêmên Afrînê û herêmên li dora çîyayê kurdan, heta ku ew digihijê, herêmên weke amûdê, qamişlo û gelek deverên din, wê nîşanaka jîyane pirr kevn bidina me. Ev herêm, hinek lêkolîn û lêgerînên bi zanistî ên ne zêde kûr jî wê nîşanakên baş ên di derbarê jîyane bicihbûyî a kevn de wê bidina me. Wê di derbarê jîyane malbatên destpêkê de wê aqilekî baş û mazin wê bide me. Herêmên li dora cizîra bota û nisêbînê ên li bakûrê kurdistanê, wê bi heman rengî, wê xwediyê nîşanakê kevn ên jîyane bin. Herêmên weke herêma stawr, çelê û sasonê, samsûr û hwd, wê herêmna ku mirov dikarê navê wan bi teybetî werênê ser ziman. Dema ku em, digerihin li herêmê, em divê ku werênina ser ziman, em zêdetirî herêmên ku wê di vê warê de wê nîşankên destpêka jîyane malbatan wê bi xwe re bide nîşandin wê werina dîtin. Weke herêmên Erxan û farqînê, herêmên weke stawr, çelê, sason, samsûr û hwd, wê di vê çerçoveyê de weke herêmna ku mirov di vê çerçoveyê de navê wan werênê ser ziman bin.

Nîşanaka jîyane komî a malbatî, wê li van herêman zêdetir wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, çemê xabûr, zap, sason, diclê û firatê û hwd, mirov dikarê bi gelek şaqên wan re werênê ser ziman ku wê li dora wan jîyan cih bi cih wê pêşbikeve. Herêma heskîfê, ku heta roja me jî bermehiyên wê mana, wê nîşanaka malgeh û ankû çêkirina malan di hundurê latên mazin de bi qawartina hundurê wan re wê were dîtin. Lê meletî, elezîz, semsûrê û hwd jî, wê biheman rengî malên ku wê bi qawartina hundurê latan li deverên bilind, wê were dîtin. Ev rewş û rengên çêkirina malan bo jîyankirinê, wê têgih û têgîneka baş bi mirov çê

bikin di derbarê jîyane demên berê de. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku em dibêt ku ji van malan re weke nav, gotina´şikeftê´ jî bi jîyane seretayî a berê re li wê bikin û wê werênina er ziman. Lê ji wê zêdetirî, rastîyek jî li holê ya ku ew malna ku mirov wê di wan de demên dirêj wê bijîn bin. Ev rewşên bi çêkirina malan re wê di derbarê jîyane li herêmê a pêşketî, bi destpêka wê re di derbarê wê de wê têgih û têgînekê bide me.

Em dema ku di xate jîyane li kurdistanê de li wê xate pêşketina malgehê dinerin, em dibînin ku wê hin bi hin pêşketin bi wê re wê çê bibê. Her wusa di demên pirr piştre weke ku em li herêma li Rehayê dibînin malên gilovar weke malên weke **´malên ferîşteyan ên dûkeşî´** û ankû **´dukêşîyên ferîşteyan´** ku ew li herêmên erzirûmê, erzinganê, **Elbaqa wanê**, Reha û herranê û hinek deverên din ên li herêma botanê ku ew hena, wê di vê çerçoveyê de wê di derbarê çêkirina şêwayên malan ên destpêkê ên li kurdistanê de jî wê têgih û têgînekê bidina me. ´Dukêşên ferîşteyan´, bi du şeklan û ankû awayan mirov dikarê wê werênê werênê ser ziman. Awayê pêşî bi kişîn herîkîna avê a bi demê re wê bi xwezayî wê biafirê. Lê awayê wê yên din jî yê ku wê mirov bi destê xwe çê bikin in. Weke ku bişêwayê kirmanî, kurdan li elbaqê, erzûrûmê, erzinganê, Rehayê, meletî, elezîz, semsûr û li gelek deverên ên kurdistanê ku ew hatina çêkirin in. Ev malên dukêşî ên ferîşteyan ên gilover û hinekî biliind, dema ku mirov dikeve hundurê wan de weke ku mirov herê hundurê zerikek mazin a bilind. Di hundurê wê de wê jî gûleka wê ji nîvê wê diserê wê de wê derkeve. Bo vê yekê, ji wan re malên farîşteyan n dûkeşî´ jî were gotin.

Li kurdistanê, ev şêwayên çêkirina malan, wê di destpêkê de wê bên û derkevina li holê. Di destpêkê de wê bi du awayan werina dîtin li kurdistanê. Weke ku wê li meletî, semsûr, elezîz, erzûrûm, û hwd ku bi wê re li gelek deverên jî mirov rastî wan tê, bi kişîna ardê û herîkîna wê, weke awa û şeklna xwe derketina li holê. Dema ku mirovan jî ew kifşkirina, wê di wan de cih bibin. Bi demê re jî wê, gelek li wan zêdekirina bikin. Şêwa û awayê din jî wê bi dest çêkirina, weke li Reha, Erzûrûm, erzingan, meletî, elbaqe Wanê, heskîf û hinek deverên din ên kurdistanê, ku wê bi şêwayê qawartina latan bê û ankû her wusa bi hinek şêwayên din ên bi vê rengê bê, wê were dîtin. Qawartinên li heskîfê, ku di nava xalkê de li kurdistanê, weke ´şikeftên rama´ û ankû weke **´şikeftên heskîfê´** jî dihên bi navkirin, wê piştî derketina malê li holê bi avakirina wê re wê, ewder şikeftên wê weke mal jî wê mirov di jîyanê de

wê bikarbênin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê, pêşketina malê, wê bi demê re wê êdî wê bi awa û reng bistênê.

Mal, dîroka avakirina wê, wê heta destpêka bicihbûna mirov û jîyankirina wan ya di şikeftan de wê herê. Piştî ku mirovan bidest jîyane xwe ya bi malbatî kirin, wê êdî têgîna wê cihê ku ew li wê çê dibin wê bi wan re wê çê bibê. Piştre jî, wê wê cihê ku wê li wê bijîn, wê li wê xwedî derkevin û weke xwedanê xwe bibînin. Wê li vir bijîn. Weke cihê li wê jîyankirinê û ankû di wê de jîyankirinê mal, wê bi têgînî wê êdî wê di mejiyê mirovan de wê bicih bibê.

Ew şikeftên ku mirov di wan de dijî, wê piştre têgîna wê bi mirovan re bidina çêkirin ku mirov weke wê cihê ku ew di wê de dijîn di şikeftê de ew, biheman rengî ji xwe re cihên din çê bikin, wê hizra wê bi mirovan re wê çê bibê. Di vê çerçoveyê de wê pêvajoyên bicihbûn û pêşketina jîyane bicihbûyî ên li kurdistanê, wê pirr balkêş bin. Wê her wusa, piştre di pêvajoyên jîyane şariştanî de wê, ev têgîna avakirina malê wê pêşbikeve. Mirov, wê çi amûr û derfet, di dest de wê hebe, wê bi wan re wê êdî wê ava bikê.

Li kurdistanê, piştî ku jîyane bicihbûyî pêş dikeve û pêvajoyên şariştaniyê destpê dikin, wê kurd malên ji axê, wê ji xwe re çê bikin. Her wusa, wê ew harîya sor ku wê di çêkirina malê de bikardihênin, wê piştre amûr û rêyên zaxmtir kirina wê êdî wê hin bi hin kifş bikin. Malên kurdan, yên ku wê di destpêka şariştaniyê de wê bên çêkirin, wê piçûk li ardê û ji hariyê bin. Çendî ku carna kevirna jî dênina ser hevdû, wê bi hariya sor, wê wan keviran bi sayênin. Bi sayandina wan re wê ji wê hêtan derxina li holê. Minaq, malên ku kurd, di destpêka şariştaniyê de wê ji xwe re ava bikin, mirov dikarê di roja me de jî li hin gundên herêma botanê û her wusa herêmên Rehayê û hwd bibînê. Çendî ku piştre wê bi aqilê xwe de wê zaxmtir bikin û wê li wê zêde jî bikin, lê di aslê xwe de dema ku mirov hinekî li ser wê şêwayê malî ên ku wan ji xwe re çêkirina ku mirov li wan bihizirê, mirov wê di derbarê jîyane wan ya demên berê ên destpêka şariştaniyê de mirov, wê bê xwediyê hinek hizirna. Her wusa, malên kurdan, ên ku wê di pêvajoyên piştre ên şariştaniyê de wê pêşbikevin, wê li gorî pêdivîyên wan wê beşan li wan zêde bikin. Wê hewşên wan hebin. Wê gov û koxên wan hebin. Wê kadînên kayê yên wan di hundurê koxan wê hebin. Wê her wusa, wê kulinên mirişkan wê ji mirişkên xwe re çê bikin.

Mal, wê bi demê re bi pêşveçûnn di jîyanê de wê li gorî wan û jîyane mirov wê hin bi hin ava bistênin. Di serdemên pêşî de wê mal, weke cihna sitergeh bin. Piştre wê bi wê re bina cihna ku mirov karibê di wan de bijî jî bê. Wê hundurê, wê li gorî hêst û ramanên di serê mirov de wê were rast kirin. Her wusa, bi demê re em bi kurdan re dibînin ku wê hin bi hin xalîçeyên naqşkirî û hwd wê werina pêşxistin. Xalîçe, wê tenê hinek naqşên ku wê tenê bo dalaqandina bi hêtên hundur ve ku werina kirin, wê werina çêkirin. Bo wê bi wan re wê ew xalîçe, wê li gorî nirxên bawerî werina çêkirin. Berê, biqasî ku mirov ji nava jîyan û malên kurdan fahm dike ku ew xalîçeyên ku weke nîgaran dihatina çêkirin û bihêtan ve dikirin, wê weke ´nirxna pîroz´ jî wê li wan werê nerîn. Ev rewşa naqşkirinê, wê weke rewşek teybet a destê jinên kurd bê. Wan, hêst û ramanên xwe bi wê dirijandina ser paç.

Naqş, wê weke çandaka civatî ya kurdan a ku wê di pêvajoyên piştre wê derkeve li holê bê. Her wusa, wê her mal wê di wê de ku ji destê jinan derdikeve wê naqşên çêkiri wê hebe. Naqş, wê weke çandekê wê pirr zêde were pêşxistin. Fêrkirina naqşê, wê ji dê bi bûhûrê li keçê. Lê î ro di destê me de nîşanakên wê hena ku wê di demên bûhûrî de wê mêran jî ew naqşkirin û hûnandina bi singan a weke kenzeyan û gorên hirî û hwd, wê biheta çê kirin. Mal, bi wê re dihat xweşik kirin. Wê bi demê re wê, di nava malên kurdan de wê lihêf wê werina çê kirin. Di aslê xwe de lihêf, weke çandak civatî a xas a civate kurd a. Wê, ev jî, wê di pêvajoya pêşketina jîyane koçerîyê û ji wê bûhûrîn û bi wê re pêşketina jîyane bicihbûyî û bi wê re pêşketina cohtkariyê û hwd de wê, bibê. Wê lihêf, wê xas hirî bê. Piştre jî, wê ev bi hevdû re werina nas kirin. Di malan de wê, çêkirina balgihan, lihêf û doşekan cûr bi cûr û her wusa bi wê re naqşkirina keviyên wan bi naqşkirinê û hwd, wê di vê çerçoveyê de weke çandaka civatî êdî wê di nava civate kurd de wê pêşbikeve. Lê ev wê di pêvajoyên piştre ên şariştaniya civatî de wê pêşbikeve. Mirov, çendî ku ew dijî û pêvajoyên jîyankirinê derbas dike, wê bi ezmûn û fêr bibê. Wê ji wan ezmûn û fêran, wê fêrî çêkirina tiştên bi wê jîyankirinê jî bike. Minaq, wê fêrbûna cohtkariyê û çandinê wê were kirin û wê ev hin bi hin pêşbikeve. Bi demê re jî wê amûrên çandiniyê wê bên çêkirin. Bo cohtkariyê û ardkirinê (´kolandina ardê bo çandinê´), wê hin bi hin wê ´gêsn´ wê werina kifşkirin.

Bi dîrokê re, ku mirov bêne ser ziman, piştî ku şariştanî pêşketin, êdî mirovatiyê bidest bikarhanîna amûran kirin. Gêsn, bo ard kolanê afirandin û ew ard çand in. Sênîk, çêkirin bo bi têde xwarinê bixwûn.

Kevçî, çêkirin bo ku mirov bi wê xwarinê bixwûn. Her wusa, dem bi dem ku bi dehan û sadan amûr û cûre lê zêde dibin, amûrên teknîkî pêş dikevin û tên afirandin. ´**Gêsn**´**,** wê amûrê kolandina ardan, razan û warzan bo çandinîyê bê. Di kurdî de gotina gêsn, wê wê weke gotinaka kevn a ku ew bahse rewşa cohtkirina ardê dike bê. Carna jî, bo kolandina ardan kurdan, di nava xwe d eji hevdû re digotin, ´me te ardê xwe gêsn kir.´ Yan jî, digotin ´me te coht kir.´ Cohtkirin û ankû gêsnkirin, wê bo kolandin û amedekirina ardê ji çandiyê re wê bê kirin. Minaq, ´ardê genim´, ew ardê ku wê di wê de genim were çandin bê. Cohtkirina ardê wê bi kûtanê û girêdana wê bi´**nîrê**´ û ankû ´**yûx**´ were kirin. Nîr û ankû yûx, dareke ku dadinên ser patika gayên ku cot dikin û her duwan bi hev girê didin û cot jî bi wê ve girê didin. Nîr, çevenga çewisandin û sitemê e. Bi wê re jî, wê genim were çandin, genim wê bidest derketina ji ardê bike û şîn bibê. Piştre wê ´**simbilên genim**´ wê derkevin. Piştî ku simbilê genim derketin û pê de, wê genim bidest hiştbûnê bike. Ev jî, wê nîşanaka danhevkirnê bê. Bo danahev a genim jî wê, ´das´ werina çêkirin. ´Dasên´ mazin û piçûk ên bo danahevkirinê wê werina çêkirin. Das, wê weke amûreka danhevkirina tiştên çandî a bi hezaran salan bê. Di nava civate kurd **das**, wê weke amûrek navdar bê. Î ro, em dikarin bêjin ku wê di destpêka şariştaniyê de ku ev bi demê re diçê ta dema sûmerîyan jî, mirov dibînê ku wê ew were karhanînî. Das, amûrek çandinîyê ye ku destikek wî yê darîn û gewdekî ya wê heye û tewandîya û bi wê re jî wê aliyek wê tûj bê bo birrînê di dema danahevê de. Pê zadên weke ce, genim, nîsk û her cûre geya dihê çênîn. Piştî ku ew genim hat dayî li hev, wê wê were avçiqandin bo ku ew libên genim ji **simbil**ên wê derkevin. Piştî ku baş hat avçiqandin, wê piştre jî wê, bi ´melhêbên´ fireh û hûrik, wê pêvajo bi pêvajo wê were ´melbêb kirin.´ Wê bi melhêbê, wê genim were **kaşûmelû** kirin. Gotina ´melûyê´ ji berhevkirinê re jî dihê gotin. Dema ku mirov, pambo jî berhev dikir li kurdistanê, ji wê re di nava xwe de digotin, ´**ew melûyê dike**´ û yan dema ku mirov diçû danahevkirina pambo ji wê re digotin **”ew çûya melûyê dike.”** Piştî ku kaşûmelûkirin hat bidawî kirin, wê piştre genim wê bi melhêba bi navê ´doxek´ê wê were kaşkirin bo ku genim û kaya wê ji hevdû were cuda kirin. Kurdan, piştî ku genim û ka, ji hevdû cuda kir û pê de, wê genimê xwe bikina kîsan û çûwal(´cûwal´ kîsê mazin ê navê bû. ´Bala´ jî, wê kîsê herî mazin bê. Kîs jî, wê yê cûwal û ankû balayê piçûk bê.)an û wê hilênin. Wê kaya xwe bikina kîsên mazin ku navê wan

di kurdî de bala na û wê hilênin û wê piştre hin bi hin bidina sawalên xwe.

Wê piştre genim û hwd, bi amûrên weke yn patozkirinê wê were kewş dike û ka û genim ji hevdû cuda bike. Patoz di dawiya sedsala 20'an de li dêla(´şûna´) gêreyê hatiye bikaranîn. Devek û du jêderkên wê he ne. Di devê re bi melhêban kewş dihê xistin û ji jêderkên wê jî zad û ka dihê derxistin. Lê patozkirin, berî ku ev amûrên demên dawiyê derkevin û werina bikarhanîn jî, li Kurdistanê, genim û ankû nîskên ku ku hişk dibû û dihat levdayîn li hevdû, wê bi amûraka ku berfireh û ku bi kevir bê û ankû ku tiştna din bê ku dihata girankirin wê li ser re bi kişandina sawalên weke Ga û ankû sawalên din ên weke ga bihêz wê bihata kişandin û li ser bihata gerandin. Car bi car, ev gerandina, bi roja didima heta ku hûrkirin dibû ji bo ku ve were vaqatandin. Ew amûrên ku ji bo ji bo perçiqandinê dibûn, ku mirov li ser jî di deme kişandinê li ser dirûniştin ji wan re zibar. Piştî ku hûrbûn bû, piştre wê Mêlhêb werina derdixstin û bi melhêbên berhevkirin û jevcudakirinê re wê genim û ka û ankû nîsk û ka wê werina jevcudakirin. Lê piştî ku ew amûrên patozkirinê ên weke ku bi trektoran re tê bikar hanîn ku derket, êdî ew awayê karkirinê jî bixwezê ji holê rabû û winda bû. Lê ew awayê berê bi sadsalan, weke awayê ku dihat bikarhanîn di palayî de. Di palayîyê de bê û an di berhevkirina genim, nîsk û hwd ku hê li ardê bû berhevkirina wê bê, bi alikarîya ku mirovan dide hevdû dikirin. Bi wê jî, piştî ku herkesekî karê xwe bi hev re bi dawî dikirin, êdî wê "şahîya dawîya palayîyê" wê were li darxistin û wê hemû xalk bi hev re têde lev bigihina li hevdû. Ev, weke kevneşopîyekê bû li kurdistanê. Heta roja me jî, li herême botanê û hwd li kurdistanê, ew şahî ne weke berê jî bê hatîya berdewam kirin û hatîya heta dema me. Helbest ku dengbêjan weke "helbestên palayîyê" ku digotin, êdî di van deman de dihat gotin. Wê bi vê rengê, wê hemû malbat li hevdû bicivin û wê şêx û şengê bikin. Malbat, wê bi vê rengê, wê êdî wê bi kevneşopî vê bikin. Wê rewşên xwe yên jîyanê wê biafirênê. Wê mal, jîyane di hûndûrê wê de wê, bi vê rengê were pêşxistin. Wê têgîhiştina malbatê di malê de bi kar û xabete bi wê re dihê re kirin wê were pêşxistin. Zadê ku wê di ancama wê palayîyê de wê were bidest xistin, wê jîyaene malê wê were domandin bi wê. Ev rewş jîyanî, wê li kurdistanê, wê bi demê re bikevneşopî wê pêşbikevin. Li kurdistanê di nava civate kurd de wê malbat, bi kevneşopî û hebûna wê re wê, hertimî di çerçoveya têgînek pîroz de wê li wê nêzîkatî were kirin. Bo vê yekê, hebûna malbatê wê ti carî newê nîqaş kirin. Wê herkesek, di

malê de wê di çerçoveyeka hîyererşîyeka ku wê piştre bi demê re wê pêşbikeve, wê rêz û hûrmeta xwe ji malbatê û endamên wê re wê bide nîşandin. Lê wê ji jêr ber bi jor ve wê heta ku wê mazin hebin, wê bê dayîn nîşandin. Hertimî jî mazin jî divê ku bi wê hêskirina xwe nêzîkatiyê bikin û bidina nîşandin.Rastîya malbatê ku wê li kurdistanê bi civate kurd re wê pêşbikeve, ew divê ku mirov wê bi serê xwe wê hilde li dest û fahm bike. Bi wê re wê rastîya malbatê û ya malê bi navê wê re wê baş were fahmkirin.

Di malên xwe de wê kurdan, cihê genim ku ew navê wan ´kûwar´ bûn wê çê bikin. Cihê ´ka´yê jî ku navê **´kadîna ka´** wê çê bikin. Gotina "malê" ya di kurdî de wê weke gotinaka pirr kevn bê. Î ro, em dizanin ku wê di dema qasît, gûtî, hûrî û mîtannîyan de jî wê ev gotin di kurdî de wê were bikarhanîn. Ev gotina, berî zayinê di dora duhezar salan de hatîya biarhanin. Di demên qasîtî, gûtî, hûrî û mîtannîyan de û di zimanê wan de gotina mal heya. Rastîya malê bi awayê pêşketina wê ya li kurdistanê re wê, xwediyê pêvajoyna demdirêj bê. Her wusa, mal, wê çêkirina wan, li gorî rewşên jîyanî û demsalî bin. Li kurdistanê, gelek malên ku ew dihên çêkirin, bi gelek cûreyên wan re wê ew werina çêkirin. Em dikarin, bi wê re jî, wan baş fahm bikin. Kurdan, ji malên xwe bixwe re digotin ”malên axî.” Ji ber ku mal, ji axê dihatina çêkirin wusa ji wan re dihat gotin. Her wusa, wê serbanê wê û hêt û hundur û binê wê jî wê ji axê ba. Ew malên axî, di zivistanan de jî wê pirr zêde wê germban. Lê bo ku ew mal, dilopên ava baranê di hundurê wê de newin û serbanê wê bizaxm bê, wê hertimî serban, wê bagor li ser bigerandan.Her maleka ku ew dihat çêkirin, wê **bangor**ê wê jî li ser serê wê ji kevir biheta çêkirin. Destikê ku wê biavêtan bangor, wê di demên berê de wê ji daran ba. Bangor bixwe wê zirev û dirêj û gilover ba. Wê li her aliyên wê wê qûla cihê ku dar biketîyayê û ew bigirta wê biheta çêkirin. Piştre jî, dema ku wê baranê dest pêş bikira, wê ew bangorê pirr zêde giran, wê ew ´qaysikê wê´ biheta bi wê ve girêdan û wê werîsek piçûk jî bi wê ve bi heta girêdan bo kişandinê û wê êdî wê ew bangor bi kişandina wê re wê li serban, wê bi gerandinê bi heta hanîn li wê serê û li serê din, heta ku axa serban pirr dewisî ba û ku wê av di wê re ne bûhûrî ba li hundûrê malê. Car bi car jî ew qaysikê bangor, wê li şûna ku ew ji darê bê, wê ji hesin ba. Bi teybetî, di serdemn dawîyê de wê ew **qaysikê bangor** ji hensin hatiba çêkirin.

Malên axî, wê weke malên ku wê zivistanan germ û hevînan jî hînik ban. Di vê çerçoveyê de wê ew mal bihetan çêkirin. Malên axî, wê beş bi

beş bi hetan çêkirin, piştre jî, li rex w, li gorî pêdîvîyan, wê beşên din lê zêde bikiran. Kurdan, hertimî, wê gov û koxên xwe yên bo sawalan, yan wê li tihêlên malê wê çê bikiran û yan jî, wê li pişt malê çê bikiran. Lê di her halûkarê de wê derîyê gov û koxan wê li hewşê jî vebûba. Dema ku wê gov û kox li pişt xanî bi heta çêkirin, wê çaxê, heta devera ku wê derîyê govê û ankû koxê lê biheta vekirin, hewş jî sînorê wê li pêşîya wê re biheta bûhûrandin. Hewşên malan jî wê hêtên wan, hertimî heta qamekê wê bilind bi keviran bi heta çêkirin. Piştre jî, wê bi daran bilind bikiran. Bi teybetî, hertimî hêtê hewşê  ku ew diket dahma gov û koxê de wê herî hindik wê du qaman wê bilind ba. Ber ku ew hêt, dayikan, wê bo çêkirina ´pêvadan´ ku wê lê bixistan bikardihanîn. Dema ku wusa bilind û dirêj ba, wê hingî derfeta zêde ya pêve kirin û ankû pêve dana pêvedanka wê lê biheta kirin.

Lê dema ku mijar bibê gov û kox, em divê ku li vir tiştekî din jî bibêjin, wê hertimî hewşek teybet ku wê tenê derîyên wê li gov û koxê vebûban wê biheta çêkirin. Ev jî hêtên wê tenê weke qamekê bûn û ankû bin qamekê re bûn. Ev bi teybetî navê **´teyere sawalan´** lê dihat kirin. ´teyera sawalan, wê weke hewş û ankû ku cihê ku wê tenê sawal di wê de biheta hiştin bû. Wê sawal, di hevînan de wê li wê bihetan hiştin. Car bi car jî, wê ser wê biheta girtin ku sawalan karîba di wê de di sihê de bijîyan.

Li kurdistanê, germa nava rojê a germ, wê her wusa, bihişta ku herkesek di wê demê de xwe biavêta hundur binê sihwanan. Hertimî, wê kurdan, li pêşîya derî û ankû xênî(´mal´), wê sihwan çêkiriban. W hertimî marş li bin wê sihwanê danîba û wê li bin wê êdî wê xwarinên xwe bixwarinan û piştre jî wê li bin wê ji xwe re rûniştiban û civatên xwe li darxistiban.

Mal, wê li kurdistanê, wê li gorî şert û mercên wê bi hetan çêkirin. Bi wê re jî wê, li gorî jîyane xwe biadilandan. Her wusa, dema ku mirov diçû, male kurdekî ku ew ji kîjan beşa bawerîya civatî ba, mirov wê ew ji male wî fahmkiriba. Ku ew êzîdî ba, mirov wê ji wê fahm bike. Ku ew ji beşek din ya bawerîyên li kurdistanê ba, mirov wê biheman rengê, wê ev fahm kiriba. Mal, her wusa ku carna kurdan jî ji xwe re û di nava xwe de dihanîna ser ziman û gotin ku ´mal rastîya mirov a.´ Her wusa, bi wê rengê ew dihanîna ser ziman. Dema ku bahse malê dikirin, bi wê re w bi vê rengê wê gelek hizir bi hanîyan li ser ziman.

Malên kurdan, ên demên destpêka şariştaniyê, biqasî ku mirov kifş dike, wê bi sê tiştan bihetan çêkirin, beşek, wê ji daran ba. Beşek wê ji

keviran ba. Beşa din jî wê ji axê ba. Beşa ji axê, wê piştre wê pirr zêde were pêşxistin û li her deverê wê belav bibê. Axa sor a li kurdistanê ku ew baş dihat rehnkirin û piştre zûwa kirin, wê pirr zêde zaxm bûba. Miinaq, kurdan, dema ku harîya sor bo çêkirina tifik, tanûran û kuwaran çê dikirin, wê harîya xwe çê bikiran, wê hinek xwê ya şor jî bikiran nav de. Car bi car jî wê hinek ka jî bixistan nav da bo ku ew zaxm bûba. Piştre wê di hundurê hefteyekê de her roj, ew av daba û avçiqandiba. Wê her roj, ew hatî bi heta tevlîhevdan. Piştre dema ku wan qinyat pê dihanî ku ew harî êdî ew hatîya wê rewşê ku ew dikarê êdî were bikarhanîn, wê êdî ew harî bidest bikarhanînê bikiran. Piştî ku ew dihat çêkirin, wê êdî piştre hin ew biheta sayandin. Piştî çêkirina malekê ji hariyê û sayandina wê, wê di wê de agir bi heta pêxistin, Wê ev pêxistina agir, weke qayimkirina wê, biheta şîrove kirin.

Car bi car jî kurdan malên xwe dema ku wan çê dikir, wê li deverên ku wê li wan kehnî heba wê çêkiriban. Hertimî dema ku mal çê dikirin, wê devern avî bijartiban. Lê cihên kehniyan, wê cihna ku ava wan ji bin ardê derdiket bin. Ava kehniyê, hertimî weke ava herî baş û paqij jî li wê dihat nerîn. Ava kehniyê diherikî. Li ser wê herîkîna wê mirov dikarî kêzînan bo cemidandina tiştên xwe çê bikiran. Lê carna jî wê kurdan, malên xwe li deverek wusa çêkiriban ku wan av di bin kevîyek malê de didan herikandin. Ew ava ku wan di bin malê re didan herikandin, wê weke kêzîna cemdandina tiştan wê bikarbihanîyan. Wê mast, dew, panîr û hwd, wê hetimî bidanîyan binê malê nava wê ava cemidî bo ku ew cemidî ba.

Ev jî, weke karekî pirr baş û xweşik ku dayikên kurd ew pirr baş dikirin bû. Wê, zanîban ku wê çawa ew bikiran. Di wê ka û xabetê de ew, weke pirr bizane û pîspor bûn. Minaq, wê hertimî devê xwe danîban wir bo cemidandinê. Piştî ku cemidî wê bihanîyan û wê bixwaran. Lê devera weke sihwanê ku wan li pêşîya malê çê dikirin û li wê dirûniştin, wê li kevîya wê hertimî cêrekî mazin dênin û wê ew tişî dev bikiran ku wê ji wê ahlê mal vexwartiba. Bi wê re jî, wê kevçîyên mazin ên darî heba. Ev kevçîyên mazin ên darî jî kurdan ji wê re digot ´heskî.´ `Heskî´, weke kevçîyên mazin ê darî bû. Ev kevçîyên mazin ê nav heskî, wê weke kevçîyê ku wê bi wê xwarin çêkiriban, wê xwarin levdaban û wê xwarin ji xwe re vala kiriban. Bi wê re jî wê kevçîkên piçûk ên ku wan bi wê re xwarin bixwara wê ji xwe re çê bikira. Ev keçîkên piçûk ên ku wê bi wan xwarin bixwara jî, ew jî ji darê bû. Bi wê re sênîkên ku wê di wê de xwarin bixwaran jî, di destpêkê de wê ji daran ba. Her wusa bi wê re bo av vexwartinê û ankû bo dev vexwartinê wê zerikên darî wê bihetan

çêkirin. Lê axlabê jî, bo vexwartina dew wê zerikna bi destî wê bihetan çêkirin. Ew zerikên bi destik, wê piştre jî tayek bi destîyê wê ve girêdaban û wê bi wê re ew bi destikê cêr ve girêdaban bo ku ew hertimî li wir ba.

Wê di hundurê rojê de ew dewê ku dayikan keyendibû, wê bikiran ku ew vexwertiban. Lê pirr carî, ji ber ku wan gelek çê dikir, wê ti carî ew dewê ku wan çê dikir, wê xilas nebûba. Êdî ew dewê ku wê maba heya êvarî, wê di çêkirina xwarinên weke meyîrê de wê bikarbihanîyan. Carna jî wê, geyayê weke tolikê, kereng, gûriz û hwd wê bidan hevdû û wê ew pêşî di nava avê de bikelendan û piştre jî, wê di nava rûn da bi qalandan û piştre jî, wê ew dew berdana li ser wê û wê hinekî rawastandiban û piştre wê bihevdû re li ser sofreya xwarinê wê bixwaran.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî werênima ser ziman ku wê geyayê weke kereng, tolik, guriz, parpar û hwd, bi gelek cûreyên din ên geya ên weke wan re wê ew bi hetan berhev kirin û wê bikiran xwarin. Çêkirina wan jî, pirr xweş bû. Geyayê weke sîrikê, ku ew hinekî weke pîvanê û ankû sîrê tûj bû, wê ew jî biheta xistin nava panir de. Sîrik û carna jî sîr, wê weke hinek şîni û ankû geyayê ku wê dayikên kurd bikira nava panîr de dema ku wan panîr çê dikir de. Bi wê, têj û tahma panîr xweş dibû. Panîrê ku wê dayikan sîrik û ankû sîr bixista navê de wê ji wê re bigotan ´panîrî sîrikî.´ **´Panîrê sîrikî´,** wê weke panîr herî xweş û bi têj û tahm wê biheta dîtin. Ev panîr, dema ku ew piştî çêkirinê, ku ew hat xistin hundurê cêran û hat binardkirin weke demekê, wê ew hê zêdetir xweştir bûba. Panîrê sîrikî, divîyabû ku ew demek dirêj di nava ´şoravk´a xwe de maba, heta ku wê qaym û qaysa xwe bigirta. Heta ku wê têj û tahma xwe ya rast wê derxista li holê. Ava panîrê sîrikî jî, wê bi teybet bi heta amede kirin.

Cûreyên geyayên li kurdistanê ên weke kereng, tolik, gûriz, parpar û hwd, wê cûreyna geya ku wê hertimî dayikên kurd ew bidanhev û ew di çêkirina xwarinan de ew bikarbihanîyan. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi teybetî werênê ser ziman ku wê gelek cûreyên geyayê ku wê ew bidanhev wê bikiran xwarin wê heba. Ew jî, wan nas dikir. Kîjan cûre wê baş ba û biheta xwarin, ew dihat naskirin. Wê ew biheta danahev. Li kurdistanê, navê şîniyên weke kereng, tolik, guriz, parpar û hwd, wê pirr zêde bi heta naskirin. Ev cûreyên geya, wê biheta çêkirin weke xwarinê. Lê hinek cûreyên geya hebûn ku ew dihatina danahev û piştre şiştin û li ber xwarinê ew dihatina xwarin. Minaq, **raşal** cûreyek ji wan cûreyên geya bû. Geyay weke raşalê, tûj a. Li ber xwarinê dihê xwarin. Ew di

sarifandina xwarinê a di zikê mirov de pirr baş a. Her wusa bi wê re dihat bawerkirin ku ew hem ji mejî re û hem jî ji laşê mirov re pirr baş a.

Li kurdistanê jîyane malê, wê bi gelek awayan were pêşxistin. Wê ew jîyane malan, hertimî bi wê rengê wê were pêşxistin. Di xwezayîya jîyanê de wê mirov, fêrî fêrbûna ji xwezayê bibê. Teybetmendiya civate kurd û pêşketina nava wê, ew a ku ew bi xwe bixwe wê pêşketina xwe ji xwezayê fêr dibê. Bi wê re jî, wê pêş dixe. Li vir, em nikarin bibêjin ku ew pêşketinên wê yên ku ew di xwe de bi mejûya xwe re çê dike ne xwemal in. Pirranîya wan jî xwemal in. Her wusa, li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê, bi wê lingê xwe yê bi jîyane xwezayê re wê ezmûn, fêrbûn û cerbên xwe wê bi xwe re bijî. Her wusa, li vir ling jîyane şivaniyê û ankû koçerî, wê bi awayekî wê temenê vê ezmûn, fêrbûn û cerbên ji xwezayê wê biafirênê. Bi demê re û ankû di pêvajoyên piştre ên şariştanî de pêşketina jîyane civakî, wê bi wê re jîyane deştê û ankû cohtkarî û çandinî jî wê bi wê re di ahengekê de wê pêşbikeve. Ev şêwa, wê jîyane civatê ya ku wê êdî bi şariştanî, wê pêşbikeve. Piştî pêşketina jîyane deştê, wê ezmûn, fêr û cerbên jîyane koçerîyê û ankû ya jîyane koçerîyê, wê ji gelek aliyan ve wê ji pêşketinên jîyane deştê û hwd re wê bê temen. Wê bi hevdû re wê ev herdû lingên jîyanê, wê di şêwayekî de wê hevdû temem jî bikin. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê jîyane deştê û ya zozana, wê bi hevdû re wê bikevina nava ahengekê de. Nakokîyên jîyanî ên ku wê di nava wan de hebin jî, wê ne bin asteng ji pêşketîya bihevdû re di anengekê de pêşketina wan re. Bo vê yekê, jîyane civatî w li kurdistanê wê hertimî lingê wê yê xwezayî wê li pêş hebe. Hertimî, wê pirsgirêka bajarîyê û ya gundîtîyê, wê xwe li ser van lingan re wê bide dîyarkirin. Mirov nikarê vê pirsgirêkê tenê li ser pirsgirêkên şariştanî ên navendîya bajarî ya keviyê re werênê ser ziman. Ji wê zêdetirî, wê bêhtirî xwediyê wê wateyekê bê. Jîyane li kurdistanê, em divê ku wê jî werênina ser ziman ku wê ev herdû lingên jîyane deştê û ya zozana, wê rengê jîyane civatê li kurdistanê bi pêşketina wê re wê bidina kişfkirin. Jîyane civatê, wê bi wan re û bi ezmûn, fêr û pêşketinên wan ên cerbî re wê xwe bijî. Em dema ku bahse pêşveçûnên li kurdistanê bikin, em divê ku bi wê dîrok û mejiya wê ya civatî a bi pêşketina wê re bikin.

.

**Li kurdistanê bi cohtkarîyê re weke karekî, pêşxistina ahlkirin û kedîkirina sawalan**.

Ku mirov ji kîjan aliyê binerê, mirov divê ku werênê ser ziman ku jîyane civatî a li kurdistanê, wê xwediyê pêvajoyna giring û pirr demdirêj bi dîrokê re bê. Dîroka civatê, li kurdistanê, em dema ku li ser hebûna civate kurd re wê bikin ku werênina ser ziman, em dikarin li ser nîşanakên wê yên ku di nava jîyane civatê de hena, heta serdemên kevn ên berî demên şariştanîyê ên weke yên neolîtîkê û yên destpêka şariştaniyê em bibin. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re pirr baş fahm bike ku wê jîyane civatî a li kurdistanê, wê destpêka wê li ser esas û temenê şivaniyê bê. Her wusa jîyane şivaniyê wê xwe bi rêxistin bike û bide domandin. Di vê çerçoveyê de em dema ku bahse jîyane şivaniyê û xwe bi rêxistinkirina wê ya li kurdistanê dikin jî, em di cih de jîyane zozana a koçerîyê bibîr dikin. Jîyane koçerîyê, wê rengê jîyane civatî a ku ew li gorî hebûna xwezayê pêşdikeve bê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê jîyane civatî a bi destpêka kombûna mirovan re ku wê bibê, wê her wusa, li kurdistanê weke ku em bi xosletên wê re bi jîyane zozana û ankû jyane koçerîyê re dibînin, wê heta dema neolîtîkê wê herê.

Jîyane koçerîyê, wê weke jîyane civatî a ku ew êdî hin bi hin dihê birêxistin bê. Wê mirov cih ji xwe re kifş bike û wê li wê cihê bidest jîyankirinê bike. Wê ji xwe re xwedanê bidest afirandinê bike. Xwedan(´milkîyet´), wê mirov bide bicih kirin. Bi wê re jî wê mirov ji xwe malan çê bike. Mal, wê pêşî li kurdistanê bi jîyankirina di şikeftan de bê. Her wusa, şikeftên ku weke malan hatina bikarhanîn, wê li dora rehayê, meletî, elezîz, erzûrûm, erzingan, elbaq û hin herêmên din ên herêma botanê û rojavayê kurdistanê wê xwe bidina dîyarkirin. Bi wê re jî mirov divê ku werênê ser ziman ku wê gelek deverên bi vî rengî wê li başûr û rojhilatê kurdistanê wê hebin. Herêmên li dora çîyayên zagrosan û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê gelek nîşanakan bi xwe re wê bide nîşandin kirin.

Li kurdistanê jîyane şivanî, her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi wê re werênê ser ziman ku wê hin bi hin li gorî xosletên bi cihbûnê, wê xwe bidest pêşxistinê bike. Mirov, dema ku ew bicih dibê, wê bidest girtina di destê xwe de sawalan bike. Wê ji wan sawalan sûdbigirê. Pêşî, sawalên ku ew dihêna nêçîrkirin, wê werina xwarin di nava malbatê de. Andamên malbatê, wê bi wê re wê debara xwe bikin. Li kurdistanê, nêçîrvanî, wê piştî bicihbûnê jî wê xwe demek zêde dirêj weke temenekî rengekî jîyanê ê xwe dabarakirinê wê bide domandin. Lê bicihbûna jîyanê re û bi pêşketina wê re wê mirov, fêrî hevnasîna xwezayê bin. Her

wusa, wê bi demê re wê bidest ahlkirina sawalan bikin. Ahlkirin û kedîkirina sawalan, wê hin bi hin jîyane mirov a ew xwe bi nêçîrkirinê re li ser lingan digirê, wê reng bigûharênê. Wê nêçîrvanî dawî li wê newê, lê wê nêçîrwanî, weke berê wê newê kirin. Piştî ku mirov, bidest girtina sawalan bizindî bikin bo ku wan ahl û kedî bikin. Her wusa, wê ahlkirina sawalên malê û xwedî kirina wan, wê bi jîyane cohtkarîyê û çandinîyê re ku ew pêş dikeve re wê zêdetir derkeve li pêş. Cohtkarî û çandinî, wê li vir, teybetmendî û xosletên jîyanê û jîyankirinê jî wê bi xwe re wê bide gûharandin. Wê mirov, bidest pêşxistina derfetên jîyanê di cihê ku ew li wê di dijî de bike. Çendî ku wê dike jî, wê gerîna mirovan bi komî wê kêm bibê. Her wusa, wê mirov dem û jîyane xwe wê bi cohtkarî û çandiniyê re wê pêşbixe. Bi wê re jî wê sawalan sax bigirê û wê wan di hundurû de bigirê. Ev jî wê bi xwe re hin bi hin kedîkirinê wê werênê. Bi kedîkirinê re kurdan, rêbazên **´xasandinê´û hwd,** wê pêşbixin. Her wusa, sawalên weke hasp û hwd, wê di dema ahlkirin û kedîkirina wan de wê werina xasandin jî. Xasandin, wê weke rêbazakî ahlkirinê wê di destpêka jîyane de wê were pêşxistin. Sawala ne kedî û ahl, weke sawal bejî û kûvî di nava civate kurd de dihê bi navkirin û ser ziman. Sawalên bejî û kûvî, wê piştî ku re hatina girtin, wê werina kedî kirin. Sawalên bejî û kûvî, wê hov bin. Wê pirr zêde hêrîşkar bin. Minaq, hasp, dema ku ew ne hatîya ahlkirin, wê bi gez û pehînan wê xwe bike ku ew biparêzê. Di nava kurdan de wê ji sawalên mazin ên weke haspan û hwd re ku ew bejî na û ne kedî na, ku ew hatina girtin wê bihetina ´ahlkirin.´ Ahlkirin, wê ji kedîkirina sawalên bi vê rengê ên weke haspan ên mazin re wê biheta gotin. Lê sawalên weke kew, kevok, û hwd ku ew dihatina kedîkirin, wê ji wan re zêdetirî gotina ´kedîkirinê´ wê biheta bikarhanîn.

Li kurdistanê, weke çandaka kedîkirinê, hê di destpêka jîyane şariştaniyê û pêşketina wê de wê kedîkirin wê bibê. Piştî ku jîyane bicihbûyî a civatî destpêkir û pê de wê êdî kedîkirin li dora wê êdî wê pêşbikeve. Sawalên weke kuçik, meh, bizin, hasp û hwd, wê weke sawalên ku wê pêşî wê werina kedîkirin bin. Bi jîyane nêçîrkirinê re wê kêdîkirin jî wê bi wê re wê di ahengekê de wê pêş bikeve.

Sawalên ku ew dihên ahlkirin û kedîkirin, wê êdî wê li dora wê male ku ew li wê hatina kedîkirin bin. Wê fêrî wê bibin. Kedîkirin û ankû ahlkirin, w ji aliyekî ve jî fêrkirin û alimandin bê. Sawal û ajal, wê li ser tevger û alimandinan re wê ahl bibê. Di kurdî de sawal ku ew hatî ahlkirin û ankû kedîkirin, ew sawal êdî weke ´sawala hir´ dihê bi navkirin. Sawala hir, weke sawala di rewş û halê xwe de ya hatî kedîkirin

jî ya. Zêde ne bi tevger a. Wê hêrîşê nekê. Sawalên weke sa û ankû kuçik ên ku ew ne hatina kedîkirin, wê sawalên ku wê hêrîşan dikin bin. Bi wê re jî, sawalên weke bizin, gisk û hwd ên bejî û ne kedî, weke sawalên kûvî na. Ev sawal, wê li çîyê bijîn. Herî zêde ew, weke sawalên pirr bazek in.

Sawala ahlkirî û ankû kedî kirî wê weke sawala ku ew di xizmeta xwediyê xwe de bê. Ew sawal wê êdî ne xwdiyê xosletên sawalên bejî û nekedî bê. Alimandina sawalan, wê ahlkirin wan jî bê. Di aslê xwe de ahlkirin û ankû kedî kirina sawalan, nîşanaka wê ya jî ku ew dikarin fêr bibin û fêr dibin jî. Her wusa, sawal li ser fêrbûn û alimana tevgeran û naskirina cihê re wê kedî bibê.

Rewşa kedîkirinê wê li ser hin rewşên mêylî ên bi mejî re bibê. Ev rewş, wê di temenê fêrbûnê de bê. Mirov dikarê wa rewşan weke rewşna fizyolojikî jî werênê ser ziman. Sawala kedî û ahlkirî, wê bi demê re weke sawala malê bijî. Dema ku ew ji mal derkeve û herê jî, wê piştre ew rêya xwe bibînê û were malê. Her wusa, wê li vir, wê bijî. Sawal, dema ku ew li wir nêzîkatîyê ji xwediyê dibînê, xwarinê digirê û hwd, wê ev rewşna ku wê sawalê bikişênin bin.

Li kurdistanê, çanda kedîkirina sawalan, wê bi jîyane şivaniyê re wê xwediyê dîrokek pirr zêde kevn bê. Her wusa, sawala nekedîkirî û neahlkirî, weke sawala hov û bi wê re ´har´ jî dihê dîtin li ser rewşên wên hêrîşkirinê û hwd re. Lê hinek sawal jî ew mêyla wan ya ahlkirinê nîn a. Ew jî, weke sawalên ku ew nayêna kedîkirin û ahlkirin li wan dihê nerîn. Minaq, gûr weke sawaleka ku ew nayê kedîkirin û ahlkirin li wê hatîya nerîn.Lê kuçik, ew hê di serdemên destpêka şariştaniyê û ankû bicihbûna mirovan û bidest jîyankirinê de kedî bûya. Rewşa jîyane mirov a di destpêka wê de wê, nêçîrwanî pêşketî hebe. Li kurdistanê, piştî destpêka serdemên şariştaniyê re wê nêçîrwanî jî wê xosletên xwe li gorî wê bide rastkirin. Minaq, mirovên ku wê herina nêçîrkirinê, wê ´tajîyên ku ew bi wan nêçîrkirinê dikin´ wê xwe ji xwe re peyda bikin. Tajî, weke cûreyekî ji malbate kuçikan a û pirr bazek a. Li gorî rewşa nêçîrwan tevdigerihin. Nêçîrwanî, wê di demên destpêkê de wê, gelek sawalên ku ew di xwezayê de wê hebin, wê bina armanca nêçîrwanan. Her wusa, piştre li kurdistanê, bo nêçîrkirinê, wê mizraq wê bên kifşkirin. Piştre jî, wê tîrûkavan wê werina kifşkirin. Lê li kurdistanê, çendî ku wê hin bi hin hinekî wê nêçîrwanî jî wê xwe bide domandin jî, lê wê hin bi hin ew êdî newê kirin. Wê mirov, pêdîvîyên xwe wê ji sawalên xwe yên ku ew kedî kirina wê ji wan bidest derxistinê bikin. Minaq, çêlek, meh, bizin û hwd,

wê hinek ji wan sawalên ku wê şîr bidin bin. Bi wê re jî, wê sawalên piçûk ên malî ên weke mirişk, alok, kew, qaz, ordek, û hwd, wê werina kedîkirin û wê li malê werina çêkirin. Li malê, minaq, wê mirîşk were rûniştandin û wê hêk bên xistin li binê, ew hêk, wê piştre bina çîçik. Ew çîçik, wê mazin bibin û bina mirîşk. Bi heman rengî wê bi sawalên din ên malî re wê bê kirin. Dema ku mirîşk, li ser hêkan hat dayîn rûniştandin, wê ji wê rewşa wê ya rûniştinê re wê bê gotin ”kurk.” ”Mirîşka kurk”, wê hêka nekê. Wê tenê li ser hêkan rûnihê heta ku ew hêk ji wan çîçik derkevin. Piştî ku ew hêk ji wan çîçik derketin, wê êdî wê mîrişk, wan mazin bike.

Ev rewş û gelek rewşên bi vî rengî wê bi demê re cihê nêçîrwanîyê jî bigirin. Lê nêçîrwanî, wê ji dema sûmerîyan ve li kurdistanê di nava civate kurd de wê hebe. Nîşanakên vê jî pirr zêde hene. Her wusa destana gilgamêş û gelek destan û bineterên nivîskî ên ji wê demê, vê vê yekê di xwe de bi şêwayna werênina ser ziman. Di demên sûmerîyan de wê nêçîrwanî, weke jîyanekê bê. Lê li vir dema ku em nêçîrwanîyê weke şêwayê jîyanekê hildina li dest, weke ku em li kurdistanê dibînin, em divê ku wê bi jîyane şivaniyê re wê bi hevdû re werênê ser ziman. Şivanî, wê rexakî wê nêçîrwanî bê di demên berê de. Lê wê piştre ev rewş wê bi gûharê. Şivanî, wê piştre, weke ku em li kurdistanê ji wan demên destpêka şariştaniyê û heta roja me ku em dibînin, wê bi xwedîkirina sawalên ku ew hatina kedîkirin re wê jîyane xwe bide domandin. Şivanî, wê di vê çerçoveyê de wê weke şêwayê xwedîkirina sawalan û ji wan sûdgirtinê bê, weke ku em bi koçerîyê û hwd re dibînin.

Her wusa, di vê çerçoveyê de em divê ku werênina ser ziman ku wê nêçîrwanî, wê bi hûnerî wê were pêş û derkeve li holê. Mirov, çendî dikarê bigirê û ankû zant bike, wê bi wê re werênê ser ziman. Di demên destpêka şariştaniyê de wê mirov, nêçîrwaniyê bikin û wê sawalan nêçîr bikin û wê dabara jîyane xwe bi wê bikin. Wê jîyane xwe bi wê re bidomênin. Wê ew nêçîra ku wan kirîya, wê xwarina wan bê. Lê piştre, hin bi hin wê nêçîrwanî, bi xwe re wê pêvajoyên gûharandinê wê derbas bike. Minaq, di destpêkê de wê nêçîrkirin bi şêwayê kuştina sawalan bê. Piştre wê, ev bi gûharê, wê bi girtin û kedîkirin û ankû alhkirinê re wê gûharînê bike. Lê çendî ku wê gûharîn bibê jî, wê di nêçîrkirinê de wê kuştina sawalan bi tememî ji holê ranekê. Şêwayê bi kuştinê nêçîrkirin, wê şêwayê nêçîrwaniyê ê herî hov bê.

Nêçîrwanîya piştre wê temenê wê li ser ahlkirin û kedîkirinê bê. Wê sawal werina girtin û wê werina kedî kirin. Di nava xwezayê de wê,

gelek cûreyên sawalan wê hebin. Mirov jî, wê wan nêçîr bike. Minaq, wê haspan nêçîr bikin. Wê haspan bigirin û wê piştre ahl bikin. Ew ahlkirina haspan, wê li kurdistanê weke çand û pêşketinaka wan ya civakî a pirr zêde wê kevn bê. Wê bi demê re li kurdistanê wê gelek şêwayên nêçîrkirinê wê werina kifşkirin. Çêkirina xefkan û hwd, wê were û bibê. Li kurdistanê, weke ku bûya gotinaka xalkê jî, wê rewşa ´kewê´ wê were ser ziman. Kew, li kurdistanê, dema ku wê di demên berê de wê were nêçîrkirin, wê pêşî, kewek ku berê ew hatî girtin û kedîkirin, wê bê danîn li hundûrê xefkek ku ew hatî vedan. Piştre wê kewên din wê werina cem wê kewê. Her kewa ku ew hat cem wê kewa di xefkê de wê ew jî bikeve xefkê de.

Bi wê re jî wê ´**dahbik**´ di nêçîrkirinê re wê werina bikarhanîn. Dehbik, amûrek nêçîrvaniyê ye ku bi giranî ji bo girtina çûkan û ajalên bi zerar yên wek rovî, mişk, gur û hirç û hwd, dihê bikaranîn. Lê dahbikên wê bi wan teyrik û çûkan nêçîr bikin jî wê werina çêkirin. Ew dahbik jî, wê dehbikên ku wê ji mûyê teriya hespan û bi girêdana xilboqî dihê çêkirin. Li ser sergoyan ankû wê jî li ser reşahiyek li nav berfan dihê danîn û pê beytik, kevok, çîq û ankû reşçêlek û çûkên hwd, dihên girtin. Lê li kurdistanê kurdan di nêçîrkirinê de wê bi demê re wê amûrên din jî ên ku wê bi wan nêçîrkirinê wê kifş bikin. Ew amûr jî, wê weke ´**qosk**(jê re ´nêçik´ jî tê gotin**)´, ´berkahnîk´** û hwd bin. Qosk, di nêçîrkirina çûk û tayrikan de wê werê bikarhanîn. Berkahnîk jî wê di nêçîrkirina sawalên piçûk û bazek ên weke kîvroşkan û hwd wê were bikarhanîn. Kurdan, di demên xwe yên berê de wê berkahnîk, wê di pevçûnên ku wan kirina de jî wê bikarbênin.

Bi vî rengî, wê gelek şêwayên nêçîrkirinê wê werina çêkirin. Em dibînin ku wê di dema sûmerîyan de wê li kurdistan û mesopotamîya wê mizraq wê werina kifşkirin û bikarhanîn. Ev amûrên xwe parastinê na jî. Her amûrê xwe parastinê, wê di nêçîrkirinê de wê werina bikarhanîn. Piştre wê tîr û kavan wê piştre werina kifşkirin. Tîr û kavan, wê weke kifşkirineka mesopotamiya a herî kevn bê. Î ro di destê me de vegotin û lêkolîn hena ku em dikarin li wan binerin û bibêjin ku wê care pêşî tîr û kavan li kurdistan û mesopotamiya wê were kifşkirin û wê bikarhanîn. Bi wê re jî bi heman rengî mirov dikarê bo girtina haspan û ahlkirina wan û li wan sûwarbûna wan jî vê yekê bibêjê, Her wusa, ev rewşên ku wê care pêşî li ser van axan rû bidin, wê piştre belav bibin û bibina malê pirranîya xalkên din ên li herêmê û ne li herêmê jî. Mîtra weke pêxemberekî axa kurdistan û mesopotamiya ya.Ew berî zayîna îsa li gorî ku mirov ji

binterên nîvîskî kifş dike, li dora hezar û sêsed salî û wan dijî. Mîtra bixwe jî, ew hizrên xwe yên olî di xate bawerîya xwe de dihênê ser ziman. Lê mîtra, ew dema ku tefsîra wî dihê kirin, ew weke nêçîrwanekî jî ew dihê tevsîr kirin. Her wusa tîr û kavana wî ya ku ew di destê xwe de digirê, wê piştre di bawerîya wî de were pîroz kirin. Î ro, dema ku wê li ´falan´ were meyîzendin, wê beşa falê ya bi navê ´tîr û kavan´ jî wê hebe. Ev, wê ji vê rewşa mîtra were û biafirê. Tîr û kavan, em dizanîn ku wê di kalikên kurdan re wê pirr zêde wê were bikarhanîn. Di dema desthilatdarîya kurd a medîya de em dizanin ku wê beşeka ji mirovên naqandî di nava artişa medîya de wê hatibê perwerde kirin ku ew karibê li ser haspan sûwarbûyî ku ew karibê tîr û kavan bikarbênê wê hebe. Ev rewşa van wê demê ên bi hûner, wê di derbarê pêşketina wan de wê têgînekê bide me. Lê bi wê re jî, wê vê jî wê bide nîşandin ku wê di wê demê de wê tîr û kavan were bikarhanîn bo nêçîrwaniyê jî.

Î ro, em dikarin bibêjin ku wê li ber diclê û firatê li kurdistanê û ankû mesopotamya wê jîyane bi komî wê di dem û serdema neolîtîkê ku wê ji salên li dora duwanzdeh hezar salan û heta deh û ankû ne hezar salan, wê weke serdemek kombûnê û bi têgînbûnê bê. Di vê demê de wê mirov, bicihbûnê bikin. Wê di cihê ku ew di wê de dijîn, wê bixwezin ku ew temenê domandina jîyane xwe biafirênin. Her wusa, wê cohtkarîyê pêşbixin. Wê bi wê re jî, wê sawalan hin bi hin kedî bikin bo ku ew wan di jîyane xwe de ji wan sûd wergirin.

Em dikarin bibêjin ku wê serdema neolîtîkî li kurdistanê û herêmên wê, wê li dora duwenzdeh hezar salan wê destpê bike. Dibêt ku ev dîrok kevntir jî herê. Lê berî dema neolîtîkê di serdema peleolîtîkê de jî wê destpêka kombûnê wê hebe. Ev jî, dide nîşandin ku wê ji ya ku em dizanin zêdetirî wê dîroka jîyankirina bi komî a mirovan li kurdistanê wê kevn herê. Herêmên Reha, amed, herêmên botanê ên weke Şirnax, nisêbîn, hezex, Cizîr û hinek herêmên din ên ber çîyayê cudî heta ku wê bigihijê herêmên çolemergê û çelê û hwd, wê di qadek mazin de wê ev rewş bibin. Kifşkirin li ´xirabreşkê´, didina nîşandin ku wê ev rewşa jîyankirinê a li herêmên weke herêmên kurdistanê ên weke Rehayê, wê temenê jîyanê kevntir wê herê. Herêmên berfiratê ên rojavayê kurdistanê û heta ku digihijê Rehayê û ji wir jî heta ber çîyayê kurda, wê di vê çerçoveyê de temenê jîyane zû bicihbûyî wê bi afirênê. Avîbûna herêmê û daristanên wê ên gurr, wê temenek mazin bide çêkirin.

Çendî ku wê komîtî pêşbikeve, wê hin bi hin cohtkarî, şivanî û her wusa kedîkirina sawalan bi wê re wê pêş bikeve. Piştî jîyane bicihbûyî ku

ew pêşdikeve û pê de, wê êdî li gorî wê lêgerînên xwe jîyankirinê wê bibin. Her wusa, çemên mazin ên weke diclê û firatê û çemên din ên li kurdistanê, ku ew weke bahrna piçûk in, wê mirov ji wan jî wê xwe bidina jîyankirin. Her wusa girtina masîyan û hwd jî, wê bi wê re pêşbikeve. Girtina masîyan, wê piştre jî wê di serdemên şariştaniyê de wê bi awayekî pêşketî jî wê bibin. Pêşî, mirovan, wê xefkan çê bikin û bi wê masîyan bigirin. Yan jî wê bi mizraqên xwe wê bigrin. Lê piştre di serdemên şariştaniyê de wê bi aqil ji wê re rêyên din ên masîgirtinê wê bên kifşkirin. Minaq, kifşkirina ´şewk´ bo girtina masî, wê vê rastiyê bi xwe re werênê ser ziman. Weke ku çawa ku wê gotina ´masî´ ku weke navê masîyê avê ya, wê di dema sûmerîyan de jî wê di kurdî de ew hebe. Her wusa, weke wê, bi heman rengî wê gotina **´şewk´**ê jî wê hebê. Ev herdû gotinên ji kurdî, wê vê rastiyê baştirîn piştrast bikin û werênina ser ziman.

Kedîkirina sawalan, wê piştre wê weke beşek ji jîyane mirovan bê. Wê mirov, minaq, weke ku ew haspan di dest de bigirin, wê ´hefsarên´ ku wê bi serê wan ve bikin û bi wan haspan bikişênin û ankû bidina meşandin, wê bên çêkirin. Bi hefsar re wê ´çêkirina kûrtanan´ jî wê bibê. ´Kûrtan´, wê weke cilik û ankû tişta ku ew dihê danîn li ser pişta sawalên weke haspan ku wê tiştan dênina li ser wê û bi wê bar bikin a. Çêkirina hefsaran û hwd, wê di şêwayekî çêkirina gêsnan ku wê bi wan ardan bikolîn bo çandinîyê û hwd de bê. Kedîkirin, wê weke aliyekî giring ê jîyane civatî a bicihbûyî wê bi wê re wê hebûna xwe bide domandin. Mirov, wê haspan, gayan û hwd, wê di kar û xabetên xwe de wê bikarbênin. `Ga´, wê weke sawalaka ku wê di nava çanda kurdistanî de wê weke ku wê bi pîrozîyê ew ji dema sûmerîyan û piştre heta dema mîtratiyê û hwd, wê bên parastin. Di ola kurdistanî a yazdaniyê de jî wê ev hebe. Di pêşketina jîyane bicihbûyî de wê mirov xwe çawa bi wasif bike, wê bi heman rengî wasîfîyan ji sawalên ku ew di jîyane xwe de bikardihênê wê bi wan re bike.

Kedîkirina sawalan, wê weke çandakê wê di nava kurdan de wê pêşbikeve. Her wusa, rewşa kedîkirina sawalan li kurdistanê, wê weke rewşek teybet xwe bide dîyarkirin. Li kurdistanê, ji serdemên destpêkê ên şariştaniyê ve wê weke çandakê wê pêşbikeve. Em bo ku baş rewşa kedîkirina sawalan fahm bikin, em divê ku di serî de li pergale jîyanê a ku ew li kurdistanê pêşketîya li wê binerin. Wê ev pergale civakî a ku ew pêşketîya wê, bi rengê pêşketina xwe re wê di derbarê wê de wê aqilekî baş bide me. Her wusa li kurdistanê, em dema ku wê rewşa kedîkirina

sawalan fahm bikin, em divê ku wê jîyane şivaniyê baş fahm bikin. Jîyane şivaniyê û ankû weke bi şêwayê wê yê ku ew di nava civate kurd de ji destpêka pêşketina jîyane komî ve ku ew heya jîyane koçerîyê, wê rastîya wê baştirîn bi me bide ravakirin.

Kedîkirin, wê bo domandina jîyane bicihbûyî ku ew were dayîn domandin bê. Bo vê yekê, jîyane bicihbûyî û ankû pêşketina wê ya bi civatî, wê her wusa bi wê re kedîkirin weke pêdivîyekê wê xwe bide dîyarkirin. Lê li vir, em divê ku vê yekê jî fahm bikin ku ew jîyane cihbûyî ku wê bi wê re wê kedîkirin û ahlkirina sawalan pêş bikeve, em divê ku wê kedîkirin û ahlkirina sawalan weke pêdîvîyekê jî bi wê re hildina li dest. Mirov, bi jîyane xwe ya ku wê ew bi wê bi cihbûnîya xwe re bijî, wê hin bi hin wê pêdîvîyên wê jîyanî wê kifş bike. Wê bi wê re wê, bi ezmûngerî wê bicerb wê fêrê bi wê re bidest bixe. Fêrên ku wê mirov di mejiyê xwe de ew bidest bixe, wê mirov di wê jîyanê de wê hin bi hin bi aqilê wî re derxe li pêş. Piştî pêşketina jîyane komî û pê de, wê di destpêka jîyane komî de wê pêşî di destpêkê bi nêçîrkirinê wê mirov jîyane xwe bidina domandin. Lê piştre wê mirov, wê rewşên din wê pêşbixin. Cohtkarî û çandinî wê were pêşxistin. Bi wê re jî, wê şivanî pêşbikeve. Şivanî û bidest xwedîkirina kerîyên sawalan, wê bê temenê dabarakirina jîyane a malbat û komên ku ew bicih bûna na.

Serdema neolîtîkê wê, di wê de ev karên cohtkarî û çandinîyê, bi komî bihevdû re jîyankirinê û bidest pêşxistina malbatê, şivanî û berhevkirina kerîyên sawalan û hwd, wê hin bi hin pêşbikeve.Ev serdem, wê bê weke seremek navber jî ku wê ji serdema dirêj a pêşketina mirov a peleolîtîkê û heta pêvajoya serdemên şariştaniyê û hwd. Di aslê xwe de wê di serdemên peleolîtîkê de wê, mirov bidest pêşxistina amûrên ku ew karibê xwe bi wan jîyan bike û biparêzê. Bi teybetî dema dawî a serdema peleolîtîkê de wê mirov bo ku ew karibê xwe ji hêrîşên sawal û ajalên xeternek bi parêzê, wê amûrên xwe parastinê wê pêş bixe. Her wusa, wê bidest jîyankirina bikomî a di şikeftan de jî wê bike. Bi hevdû re bi komî jîyankirin, wê hin bi hin wê derkeve li pêş. Di vê çerçoveyê de wê xûy û tevgerên mirov wê bi jîyan û xwezaya wê re wê awa û şekil bistênin. Di vê demê de wê mirov bidest bikarhanîna keviran û bi awakirina wan jî bike. Xîzkirinan jî bikin. Gelek xîzkirinên li hêtên şikeftan ên li kurdistanê, wê ji van serdeman mabin bin. Bo vê yekê, ev weke ´dema kevir´ jî dihê bi nav kirin. Di serdema dawî a bilind a peleolîtîkê de wê mirov, wê hin bi hin fêrî jîyane bi hevdû re bikin. Em bi vê re jî kifş dikin ku wê li kurdistanê li herêmên bakûr, rojava, başûr û rojhilatê kurdistanê,

li deverên bilind û avî û yên ku ew dikarin xwe biparêzên, wê bicihbûn bibê. Her wusa, wê şikeftan bidest bikarhanîna weke malan bikin. Jîyane di şikeftan de wê di serdema dawî a peleolîtîkê de wê bi awayekî vekirî wê zêdetirî wê pêşbikevê. Mirov, wê weke ´malbatên mazin´ wê bi hevdû re wê bijîn. Ev malbatên mazin, wê bihevdû re nêçîrê bikin. Wê di parastinê de wê bi hevdû re bin. Wê bi hevdû re li hemberî telûkeyên ku wê werina serê wan, wê bisekin in. Ev rewş, wê hezaran salan bi ser xwe ve bi jîyane mirov a bi komî û ankû weke malbatên mazin ku ew bi hevdû re dijîn re wê ser wê re bide derbas kirin. Ev jî, wê bi mirovan re wê xûyên jîyanî û hwd ên bi hevdû re bi jîyankirinê wê biafirênê. Mirov, wê fêrî hevdû bibê. Mirov, wê bibînê û wê bi hîskirina xwe wê fahm bike ku ew bi hevdû re bin wê çendî bi hêz bin. Wê xwe xort hîs bikin. Hîskirina bigirseyê re wê xwe zêdetirî bide hîskirin. Mirov, dema ku ew vê yekê bi hîsî bi xwe re kifş dike, wê êdî wê bi komê re wê bijî. Wê bi hevdû re wê heman şikeftê wê parve bikin di jîyankirinê de. Wê di nava heman komê û ankû malbata mazin de wê têkiliyên zayendî wê dênin. Wê bi wê re wê zaroyên komê wê bi afirin.Herwusa, wê ev rewşên bi vî rengî jî, wê girêdanê hin bi hin bi xwe re û bi cihê re wê bide çêkirin.

Ji vê demê û pê de wê mirov, serdema nû ya neolîtîkê wê bijî. Mirovê ku ew êdî di şikeftan de bicih bûya, wê şikeftên xwe weke cihên jîyanê wê ji xwe re bike mal. Wê hin bi hin têgîna malbatîtîyê wê pêş bikeve. Di aslê xwe de wê di vê serdema bi navê neolîtîkê de wê hin bi hin hinekî têgîn jî wê pêşbikeve. Mirov, wê di mejiyê xwe de wê bidest dîtinê bike. Wê toteman biafirênê. Wê mît û ankû mîtolojî wê biafirin. Bi wê re têgînên anamîst wê pêşbikevin. Miirovê ku ew di nava malbatê de dihê dunyê, wê ew xwe aîdî wê hîs bike. Hîsa xwe aîdî malbatê hîskirin, wê pêşbikeve. Ev jî, wê weke aliyekî din ê giring ê pêşketina malbatê a di vê demê de bê. Serdema neolîtîkê, mirov dikarê weke demeka ku wê ew jîyane ku ji serdemên dawî ên peleolîtîkê û hwd ve ku wê di şikeftan de biawayekî malbatî ku wê bidest pêşbiketina xwe bikê, wê li ser wê re gelek dem û pêvajo derbas bibin bê. Ev jî, wê di vê şêwayê jîyanê de wê di mejiyê mirovan de wê hîs, hiş û her wusa hîssîyeta aîdîyetê wê bi afirênê.

Serdema neolîtîkê, wê weke serdemeka ku ev pêvajoyên pêşketînê ê bi jîyane mirov re û bi mejiyê mirov re ku ew weke ku pêşketineka mazin bi xwe re dana çêkirin bin. Mirov wê bi van pêvajoyan wê xwe bi pêşketineka aqlî re wê bibînê. Wê mirov, ji şikeftan wê derkevin. Lê ew şêwayê jîyane di şikeftan de wê di mejiyê mirov de wê ezmûnekê bi

mirov re bide çêkirin. Ew bi hevdû re di şikeftê de jîyankirinê de wê xûyan bi mirov re bide çêkirin. Ev ezmûn û xûy, wê di temenê wê de bin ku wê mirov wê ji şikeftan derkeve û wê li deveran wê ji xwe re sitergehan wê çê bike. Ev jî, mal in. Li deverên avî û hwd, deverên ku ew dikarin li wê bijîn, wê sitergehan wê çê bikin. Li ser vê re mirov dikarê hema bibêjê ku wê di vê demê de wê şêwayê avakirina malan wê êdî hin bi hin wê derkeve li holê. Bi wê re bi wê avakirina malan re wê çawa di wê de bijî, wê êdî wê li rê û rêbazên wê bigerihê. Şêwayên ku wê mirov di vê dema ku ew ji xwe re malan ava dike de ku wê bi wê bijî, wê nêçîrkirin, şivanî û danahevkirina kerîyên sawalan û her wusa bi demê re fêrbûna cohtkarî û çandiniyê û hwd bê. Mirov wê li ser van şêwayên jîyanê re wê hin bi hin pêşketinê di jîyane xwe de bide çêkirin, wê xûyên xwe biafirênê, ezmûnê bidest pêşbixe û her wusa wê fêrî jîyanê û jîyankirinê bibê.

Di malê de wê mirov, wê fêrî jîyankirinê bibê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werinê ser ziman ku ev serdema neolîtîkê, wê jîyane şivaniyê di wê de wê pirr zêde li pêş bê. Çendî ku ew hin bi hin mirov bi jîyane xwe re wê fêrî cohtkarî û çandiniyê û hwd bibê jî, lê wê mirov şivaniyê û nêçîrkirinê di vê demê de wê zêdetirî li pêş bijî. Wê bi şivaniyê û nêçîrkirinê re wê jîyane xwe bide domandin. Şivanî, wê weke pergalekê wê pêşbikeve. Mirov, wê bi wê re fêrî wê bibê ku wê mirov çawa bi malbatî ku ew bicihbûya û bi wê jîyane xwe re wê ji xwezayê sûdwergirê û wê bijî. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê mirov, di vê çerçoveyê de wê hin bi hin fêrî xwezayê bibê. Çendî ku fêr bû, wê serdest jî bibê. Şivanî, ji aliyê jîyanê ve wê mirov zêdetirî xort bike di nava wê jîyane mirov a di nava xwezayê de. Her wusa, di serdema peleolîtîkê de wê mirov, ji ber ku ew karibê xwe ji hêrîşên sawalên xeternek bi parêzê wê bi komî tevbigerihê û wê bi hevdû re bijîn. Lê di serdema neolîtîkê de wê mirov, li vê xalê wê serdestiyê wê bi xwe re bide çêkirin. Her wusa, wê di dema neolîtîkê de wê kerîyên sawalan bike bindestê xwe de weke yên xwe. Wê wan ji xwe re bigirê. Wê zant bike. Mirov, wê bi vê re wê weke ku wê bi ser tirseka xwe ya mazin ya bi xwezayê re jî wê were. Şivanî, wê mirov, li zindiyên nava xwezayê ku ew dijîn wê serdest bike. Şivan bixwe jî ew, mirovê ku xwedî sawal û ku li ber wan a li Çolê ya. Şivantî, li kurdistanê, xwediyê awayekî jîyanî ya.Minaq Koçertî, jîyane wan, jîyane şivantiyê ya. Mirovê şivan, di derbarê, xweza û dordora ku ew diçiyê de, wê nas dike û zane ku wê çi bike. Li Kurdistanê, di van demên ku şer li kurdistanê di demê

de dibê jî, şivantîyê xwe bi awayekî daya domandin. Ya ku wê temenê, di her rewşê de ku ew karibin rabin serxwe jî bin wê ev bê. Wekî din jî, şivantî, ji ber ku li ser temenê bûna xwedi sawaltiyê ya, êdî ku derfet ji mrovan re namêne ku sawalan xwedî bikin, êdî ji holê dirabê. Li şûna wê, wê malgehên xwedîkirinê wê di pêvajoyên jîyane şariştanî de wê derkevin li holê. Di demên berê de, şivantî, teybetmendî û xosletekî jîyane civate kurdistanê ya berê jî ya. Civake kurd, wê bi xosletên wê yên demên berê pêşketina şariştaniyê wê bijî. Di aslê xwe de wê jîyane civake kurd a li kurdistanê, wê di derbarê pêvajoyên jîyane demên berî şariştaniyê ên dema neolîtîkê û heta ku wê ya hinekî berî wê jî, bi rengên xwe yên jîyanî ên weke bi jîyane şivaniyê û ankû pergale ´jîyane koçerîyê´ re wê werênê ser ziman. Jîyane koçerîyê, wê li gorî xosletên jîyane dema neolîtîkê a şivanî ku ew li gorî rewş, şert û mercên xwezayê dijî wê xwe pêşbixe, pêşve bibe û bide jîyankirin. Piştre jî,dema ku wê dem bi bûhûrê demên şariştanîyê û ku dem dibûhûrê, wê jîyane koçerîyê, wê weke rengekî jîyanê ê ku ew xwe dervî wan pêvajoyên şariştaniyê dihêlê wê li holê wê bimênê. Li kurdistanê bi jîyane civatî a civate kurd re wê pirrdîmenîya wê, di vê çerçoveyê de bi giştayî wê li ser koçerîyê re bi lingê xwe yê jîyane ´zozana´ bi lingê xwe yê jîyane bajarîyî a şariştanî re wê lingê ´jîyane deştê´ wê bide nîşandin. Ev herdû lingên jîyanî, bi xwe re û di xate ya pêşketinê de bi jîyane civakî re li kurdistanê, wê xwediyê xatek pergalî a pêşketina civatî bin. Çendî ku w di roja me de wê jîyane koçerîyê wê weke rengê jîyane li keviya jîyane bajarvaniyê a şariştanî li herêmên bilind ên weke wê li gund û hwd, wê bijî jî, lê di aslê xwe de wê ji zêdetirî weke xateka pêşketinê a jîyanî a heta serdema neolîtîkê ku ew xat heta roja me dem bi dem di xwe de li gorî pêşketin û gûharîn jî daya çêkirin û tê **bê**.

Her wusa ev jî, wê bi mirov re li xwe bawerbûnekê wê bide çêkirin. Mirov, sawalan nas dike. Xosletên wan nas dike. Wê çawa li wan serdest bibê û wê çawa ji wan sûdbigirê, wê berî hertiştî wê fêrî wê bibê. Ev fêrbûn, wê fêrbûneka mazin bê di jîyane mirov de. Piştre jî, wê hin bi hin bi demê re wê li wê fêrbûna mirov wê bi ezmûnî fêrbûn lê zêde bibê. Jîyane şivaniyê, di vê çerçoveyê de wê pirr zêde wê pêşbikeve. Wê mirov bi wê re wê jîyane xwe ya bicihbûyî û rûniştî wê pêşbixe. Jîyane şivaniyê, wê di vê çerçoveyê de wê weke şêwayekî jîyane bicihbûyî û rûnîştî û ku ew bi xwezayê re dijî wê pêşbikeve. Naskirina sawalan ku wê çawa mirov bi wan jîyane xwe bide domandin û wê çawa di nava xwezayê de wê bi wê re bijî, wê bi jîyane şivaniyê re wê pêşbikeve. Ev

xosletên ku em bi jîyane şivaniyê re ji wê demê kifş dikin, em wan bi jîyane koçerîyê a li kurdistanê re wan dibînin. Her wusa, ev pergale koçerîyê a li kurdistanê ku ew bi hezaran salan heta roja me hebûna xwe daya domandin, wê ew reng û şêwayê jîyane şivaniyê a bi xwezayê re bê ku wê ew bi demê re bi ezmûnî wê dem bi dem xwe pêşbixe û hertimî wê li gorî demê xwe bi xosletên nû re wê bide jîyankirin.

Wê di vê serdemê de wê civatên di şivaniyê de zane wê pêşbikevin. Wê çawa di nava xwezayê de wê karibin bijîn, wê çawa karibin, xwarinê ji xwe re bibînin û wê xwe bidina domandin, wê bi wê re wê bi zanebin. Çendî ku wê di van deman de wê hin bi hin hişkirin wê piç bi piç wê pêşbikeve jî, lê wê ji zêdetirî wê şert û mercên jîyanî û xwezayî wê bandûrê li jîyane mirov bikin. Her wusa, wê mirov li gorî wê jîyane xwe wê biadilênê. Jîyane civatî a seretayî, wê destpêkek wê di vê demê de wê bi şert û mercên xwezayê re wê xwe bide jîyankirin. Her wusa, mirov, wê bi wê re wê ezmûnên xwe jî hin bi hin pêşbixe. Wê şivanî, weke şêwayekî jîyane civatî wê xwe bide pêşbixistin. Her wusa pergale jîyane şivaniyê wê bi jîyane civatî re wê xwe bide pêşxistin. Wê bi demê re wê ´civatên şivan´ wê xwe bidina domandin. Koçerî, wê li kurdistanê, ji aliyekî ve wê ew civate şivan jî bê. Ev rewş, wê bi pêşketina civatê re ku wê civat çawa karibê xwe bijî, bide domandin û biparêzê û wê xwe ji xeterîyên din ên xwezayê biparêzê, wê di çerçoveya wan de bê. Mirov, wê bi van xosletan wê xwe pêşbixe. Weke şêwayekî wê li **kurdistanê** koçertî û ankû koçerî, wê konê xwe ava bikin û wê di wê de bijîn. Li Kurdistanê koçerî, jîyane kurdên ku ew bi sawal ve mijul dibin û di nav deşt û zozanan de diçin û tên in dihênê ser ziman. Ev awayê jîyanê, li kurdistanê bi hezaran salan doma ya. Bi serê xwe koçerî, ku jê re koçertî jî tê gotin, xwediyê pergaleke xwe ya teybetî ya jîyanî a bi xwezayê re ya. Kurdên koçer, konên wan hena û reş in. Sawalên wan yên ku ew bi wan bar dikin û yên ku bi wan re dijîn ên weke meh, bizin, çêlek û hwd, hena. Bi teybetî, her sal ji herêmên kurdistanê ên weke Serhadê, wê bi sadan malbatên ku ew koçerî dikirin dihatina ber Diclê û firatê û li wir, demsalekê di man û piştre ku ew demsala wan buhurt, êdî divegerîyan male xwe û ankû cihên ku ew ji wê hatibûn. Bi vê rengê li kurdistanê, ew bi jîyaneka bi xwezayê re dijîn. Li gorî demsalên xwezayê wan jîyane xwe diadiland. Wê jîyane wan, weke jîyaneka şivanî ba. Wê li gorî sawalên wan adilî ba. Her demsal, li kîjan herêmê wê geya geş baş û gur mazin bûba, wan jî wê sawalên xwe bi kerî bidan pêşîya xwe û biçûyan wir. Yanî, bi gotinaka din, ew jîyane wan jîyane şivaniyê bû.

Bi demê re wê bi wê jîyane bicihbûyî re wê weyn û rola mirov yek bi yek wê xwe bide dîyarkirin. Mirov, wê çawa bijî, wê bi wê rengê wê xwe salix bike. Her wusa, bi awayekî xweza, wê jina ku ew zarokan dihênê dunyê wê li malê bê û wê li zarokan binerê û wê malê bi adilênê. Her wusa bi wê re jî mêr, wê li derve bê. Wê nêçîrê bike û şivaniyê bike. Her wusa, wê zadê malê werênê. Serdema neolîtîkê, mirov dikarê weke serdema civatên şivan jî werênê ser ziman. Bi demê re kifşkirin û pêşxistina cohtkarî û çandiniyê, wê temenê destpêk û pêşketina pêvajoyên şariştaniyê jî bê. Ev pêvajo jî, wê li kurdistanê weke ku mirov ji bermehîyên ku em li herêmên rojava, başûr û rojhilat û bakûrê kurdistanê kifş dikin, em dibînin ku wê ev pêvajoya pêşketina cohtkarî û çandiniyê wê herê heta li dora deh-hezar salan berî zayina îsa. Dibêt ku ev dem hê kevntir jî herê. Bi wê re jî, mirov dibînê ku serdemên neolîtîkê wê li kurdistanê di pêvajoya li dora çardeh û sêzdeh hezar salan de wê bijî. Ji van deman û pê de wê pêvajoyên şariştanîyê wê hin bi hin êdî destpê bikin. Kifşkirinên li Xirab-reşkê, li dora Reha, amed û herêmên din ên botanê û li herêmên din ên rojava, başûr û rojhilatê kurdistanê, didina nîşandin ku wê pêvajoyên şariştaniyê û pêşketina wê heta li dora sêzdeh û dowenzdeh hezar salan wê hebê. Her wusa, ev jî, bi xwe re wê dide nîşandin ku wê li kurdistanê, wê serdemên neolîtîkê, wê pirr zêde ji ya ku tê ser ziman wê kevntir bê.

.

**Pêvajoyên destpêka şariştaniyê û pêşketina gundbûn û bajarbûnê li kurdistanê**.

Pêvajoyên destpêka şariştaniyê, wê bi serê xwe weke pêvajoyeka ku wê di wê de destpêka şariştaniyê hatibê kirin û her wusa ku wê hê serdema berê şariştaniyê a neolîtîkê´ jî ku bermehîyên wê dihên dijîn bê. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê weke pêvajoyeka ku wê di zikhevdû de wê herdû serdem jî wê di vê demê de ku wê bi hevdû re bijîn bin. Di vê demê de wê hin bi hin jîyane civatî wê pêş bikeve. Wê gundîtî wê pêşbikeve. Gund, dêw in. Dihî na. Mirov wê bi hevdû re û di rex hevdû de wê bijîn. Wê malan ava bikin. Wê kerîyên sawalan ji xwe re xwedî bikin. Wê jîyanekê bi vî rengî wê ji xwe re wê ava bikin.

Di vê çerçoveyê de wê rewşek teybet wê derkeve li holê. Gundîtî, wê di destpêkê de wê her wusa mirovan pêşî li ser pêşketina aqil û bi dîtina bi wê re wê bi hevdû re bide naskirin. Mirov, wê hevdû nas bikin. Ji xwe, heta vê demê jî, wê weke ku wê li kurdistanê li ser rewşa aşîran û hwd re ku wê were dîtin, wê gund jî di rewşa malbatên mazin de bin. Mirovên

ku ew di wê de dijîn, wê mirovên ku hevdû nas dikin û bi xwûnê ve ku ew bi hevdû ve girêdayî bin. Di vê çerçoveyê de wê di rewşekê de wê bi hevdû re wê bijîn. Wê bi hevdû re wê jîyanekê ava bikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê êdî wê bi wê re wê mirov jî wê hin bi hin wê bi zêdeyî wê bi jîyane xwe ya ku wî avakirî ve wê girêdayî bê. Wê nêvî bi nêvî wê têkiliya xwe ya bi xwezayê re wê bi sînor bike. Her wusa wê dema ku ew pêwîstî bi wê dibînê wê herê nava xwezayê. Piştî ku mirov jîyane xwe bi vê rengê avakir, wê di demên nêçîrkirinê, birina kerîyên sawalan li çolê bo çêrandinê û hwd wê derkeve nava xwezayê. Wekî din jî, dema ku ew bixwezayê tiştekî weke ji xwarinê re ku ew bide hevdû wê herê nava xwezayê. De ne, dema ku mirov, di jîyane xwe ya bicihbûyî de ku ew dijî, wê zêdetirî wê hin bi hin cûreyên geya ên ku ew bixwe ji xwe re dike xwarin wê kifş bike û wê piştre berhev bike û wê bixwe. Ev rewş, wê bi pêşxistina rewşên çandinîyê re wê zêdetir bibê. Gundîtî û pêşketina wê, di aslê xwe de nîşanaka wê ya ku wê hin bi hin çandinî jî wê pêşbikeve û wê gundî weke malbatên mazin wê bi jîyane xwe ve wê bi wê ve wê girêdayî bin. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê rewşek teybet wê derkeve li holê. Mirov, wê hin bi hin wê fêrî wê bibê ku sal bi sal û ankû demsal bi demsal çendî û çiqasî ew divê ku ew karibê bi wê jîyane xwe bide domandin biafirênê, wê karibê wê kifş bike. Ev jî, wê bi demê re wê hin bi hin wê pêşbikeve.

Mirov, bi pêşxistina çandiniyê re wê li rex şivaniyê û hwd, wê rewşek din ya jîyanî wê ji xwe re biafirênê. Kerîyên sawalan, wê ji xwe re berhev bike. Ji sawalan wê şîr hilde. Ji wî şîrî, wê fêrî çêkirina mast, panîr û hwd bibê. Wê ji çermê sawalan, wê ji xwe re cilên ku ew li xwe bike wê çê bike. Bi wê re jî, bi demê re wê ji hîrîya sawalan, wê fêrî çêkirina cilikên li xwekirinê bê.

Jîyane gundîtîyê, wê hin bi hin wê pêşbikeve weke malbatek mazin. Wê bi hevdû ve wê bi têkilî û bendên jidahî wê girêdayî bin. Wê hin bi hin xalknasîya xwe ya li gund wê biafirênin. Wê şêwayên têkiliyên xwe wê bi afirênin. Wê bi hevdû re wê çandiniyê bikin û wê bihevdû re wê zadê xwe yê ku wan ew çandîya wê bidina hevdû. Ev rewş, wê rewşek têkiliyê ya teybet wê bi xwe re wê bi afirênê. Bi demê re wê mirov bi afirandina xwe re wê rewşa xwe ya jîyanê wê xweş bike. Ji çandinîya xwe wê mahsûlê xwe wê baş hilde. Wê ji kerîyên xwe yên sawalan, wê zêdetirî fêrî sûd girtinê bibê. Ev jî, wê bi demê re wê jîyane mirov xweş bike. Her wusa, wê bi wê re jî wê bergirên xwe yên parastina ji hêrîşên ku wê ji nava xwezayê û ankû aşîrên din wê li wan bibin wê bigirê. Bi wê

re jî, wê bo jîyane baş wê biparêzên wê bi bergirên wê re wê li gund wê pêşbikevin. Her wusa, wê sawalên xwe hin bi hin li deverên ewla û ku ewder bi geyayê xwe gurr a, wê bidina çêrandin. Dema ku ew vê yekê dikin û dibînin ku ew zêdetirî şîr dihildin, wê êdî vê rewşê zêdetirî wê pêşbixin. Mirov, wê di jîyane xwe de wê zêdetirî xwezaye li dora xwe jî wê nas bike. Wê zanibê ku wê kûder baş şîn bê û geyayê kûderê wê baş bê. Bo vê yekê, wê kerîyên xwe yên sawal, wê li çolê wê bigerênê. Bi wê re jî wê sayên xwe yên şivan wê bi xwe re bo parastinê wê bi hawênê.

Ev rewşa gerandina kerîyê sawalan, wê weke xûyekî bizanînî a ji demên berê ên serdema neolîtîkê jî wê mabibê. Her wusa wê di vê demê de wê mirov, wê hin bi hin deverên baş kifş bikin ku ew sawalên xwe li wê biçêrênin. Bo vê yekê, dema ku deverek baş kifşkirin, wê malbat jî wê bi sawalên xwe re wê herina wir û li wir bi demsalî bimênin û li wir sawalên xwe bidina çêrandin. Ev rewş, wê piştre jî, hinekî din bi zanebûntir wê xwe bide domandin. Li kurdistanê, ev rewşa gerandina kerîyên sawêl li çolê li deverên şîn ên baş, wê piştre jî wê xwe bide domandin. Ev rewşa malbatên şivan bûn. Her wusa, wê gelek malbat bi hevdû re wê vê rewşê bikin. Bi vê rengê, wê bi hevdû re hem hevdû jî biparêzên û hem jî wê karibin sawalên xwe li deverên baş bidina çêrandin.

Piştî pêşketina jîyane gundîtîyê jî wê ev zanebûn di serê mirovan de wê hebe. Her wusa, weke xûyekê, wê ev rewş were dayîn domandin. Li gund jî, wê malbatên şivan wê hebin. Ew jî, wê bi wê zanebûna xwe ya ku wê ew zanibin ku wê kûder baş şîn, bi fireze û bi geyayê baş bê, wê kerîyên xwe yên sawêl wê bidina wan deveran. Lê bi wê re jî, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku mirov, bi têgîn û têgihiştina bicihbûyî ew dijî. Ew dizanê ku ew ji kûderê hatîya wir. Bo vê yekê, dema ku ew demsal xilas bû û geyayê wê deverê hin bi hin kêmbû, wê ew malbat jî wê bi hevdû re wê vegerihina devera ku ew ji wê hetina weke koçerên kurd ku ew wê di roja me de dikin.

Gundîtî, wê nêvî bi nêvî di nava xwezayê û jîyane xwe de bê. Mirov wê li gund, wê bi derfetên xwezayê re wê bijî.Lê wê hin bi hin li gund, fêrî çêkirina wan derfetan jî bê. Çandinî, wê hinekî ev bê. Çandinî, rewşek rewşek nû ya pêşketî a ku wê ew di temenê pêşketina jîyane civatî a dema şariştaniyê de jî bê. Her wusa, wê ev rewş, weke rewşeka ku wê rewşa jîyane şivaniyê jî bi xwe re ji gelek aliyan ve wê hem bide gûharandin û wê hem bi sînor bike. Malbatên mazin ên şivan, wê li rex wê, wê êdî wê jîyane xwe wê bijîn. Lê em divê ku vê yekê jî werênina

ser ziman ku wê afirandina malbatên mazin ên şivan a weke çêkirina mast, panîr û berhevkirina hîrîyê û hwd, wê weke afirandinên ku wê ew malbata şivan ku wê bi malbatên din ên ku ew bi çandinîyê re mijul dibin re wê parve bike jî bê. Bi heman rengî, wê malbate cohtkar a ku ew çandinîyê dike jî, wê afirandina xwe wê bi malbate şivan re wê parrve bike. Bi vê rengê, wê di ahenge jîyanê de wê weke ku wê hevdû temem bikin bin. Jîyane kurdên cohtkar ên ku ew jîyane deştê dijîn û jîyane kurdên koçer ên ku ew jîyane zozana dijîn, wê vê rewşê bi xwe re biawayekî vekirî werênê ser ziman.

Di nava jîyane gundîtîyê de wê mirov, hin bi hin xwarinên ji xwe re çê bikin. Wê cûreyên xwarinê kifş bikin û wê çê bikin. Mirov bi çêkirina xwarinê re ew giştîya wê astê ku ew êdî dema ku wê xwarinê çê bike ku ew li têj û tahma wê ya xweş bigirihê bê. Wê bi vê rengê, wê tiştn cûr bi cûr bike nava hevdû û wê xwarinên cûr bi cûr wê çê bike. Her wusa, ji şîrê ku ew ji sawalan digirê, wê mast, panîr û hwd wê çê bike. Her wusa ji hirîya ku ew ji sawalan digirê, tiştên ku ew li xwe bike û di malê xwe de ew li ser rûnihê û ankû titşên din ên ji malê re pêwîstin, wê çê bike. Wê ji xwe re werîsan çê bike. Wê çê devê kahniyên avê û wê meyizênê ku wa av hinek li xwerê ya û ew nikarê xwe bigihênê wê, êdî wê mirov wê bo xwe gihandina ava kahniyê a hinekî li xwerê, wê **´dêwlên avê´** wê çê bike û wê werîs bi destikê wê ve girê bide û wê bi wê re biavêjê nava avê, ku ew **dêwl**, tişî av bû, wê piştre ew werîsê ku serîyek bi dewlê ve girêdayî û serîyê din di destê mirov de ya, wê êdî wê bikişênê jor. Bi wê re jî wê dêwla xwe tişî av wê hilişênê ji nava avê.  Bi vê rengê, wê çareyan ji xwe re bo avê jî wê bibînin. Dêwl, weke amûrekî ku di nava civate kurd de wê, pirr kevn hatibê kifşkirin bê. Her wusa, bi dêwlê wê ji kahnî û ankû ´bîrên avê´ wê av biheta kişandin.

Bi vê rengê, wê wê malên ku ew ne li rex herîkînên avê hatina çêkirin, wê bi wê rengê wê ava xwe jî hildin. Lê gelek ji wan jî, ji xwe re teyere diçandin. Di hundurê teyerê de wê ´mişar´ yek bi yek ku ew di wan de fêkî û hwd dihat çandin, wê bi çandan.Wê ji deverên avî jî wê ´şirikên avê´ wê çêkiriban ku ew di wan de ji deverên avî ku wê heta wê devera ku wan li wê çandinî kirîya wê av bihanîyan. **”Şirikên avê”,** rêyên avê ên ji keviyên çem û ankû golên avê ku wê li deverên çandiniyê ku wê bihetan herikandin bûn. Ji wan re dihat gotin ´şirik.´

Ev rewş, wê rewşna pêşxistina temenê jîyanê ê li gundan bûn. Her wusa, bi vê rengê wê jîyane xwe di cihê wê de wê pêşbixistan. Bi vê re wê, temenê jîyane xwe biafirandan. Bi wê re jî wê, temenê çandiniya xwe

wê biafirandan. Hinekî bi vê rengê di cihê xwe de dîtîna çareserîyan ji jîyane xwe re bo domandina wê, wê weke şêwayekî pêşxistina jîyane bicihbûyî a şariştanî ba. Ev rewş û rewşên weke vê, wê hin bi hin zêde bûban. Bi wê re wê bi demê re wê malbat wê li gund jî wê zêde bibin. Bi wê re jî, wê malbatên nû wê hin bi hin wê deverên nû wê ji jîyanê re wê vekin. Wê deverên nû ên jîyanê wê kifş bikin. Wê gundên nû wê ava bikin. Gundên kevn jî, wê mazin bibin. Wê hijmara andamên wê yên ku ew di wê de dijîn, wê zêdetir bibin. Bo vê yekê, wê hin bi hin ew jî bi ber bajarbûnê ve wê herin. Pêvajoya piştî gundbûnê wê bajarbûn bê. Derûnîya bajarbûnê, wê ji ya gundbûnê cûdatir bê. Wê gûndbûn, wê zêdeyî li ser esasê xizmtiyê bê. Wê bi bendên jidahî wê bi hevdû ve wê girêdayî bin. Wê bi têkiliyên xwe re wê bi hevdû re wê bi sînor bin. Lê bajar wê ne wusa bê. Bajar, wê fireh bê. Weke wê firehiya wê û zêdebûna girseya wê, wê derûnîya wê jî wê fireh bê.

Bajar, derketina wan li dike dîrokê,wê nîşanaka pêşveçûnên nû jî bê.Herwusa bi pêşveçûnên dema sûmerîyan ên bi bajarvaniyê re ku em dibînin, wê vê rastiyê bi jîyane şariştanîyê re wê piştrast bikin. Serdemên sûmerîyan ên şariştaniyê û bajarwaniya wan, wê her wusa nîşanaka pêşveçûnên nû bin. Bajarvanî, wê bi têgînek welatî wê xwediyê heyînekê bê. Bo vê yekê, wê weke ´bajar-welat´ekî bê. Wê bi wê rengê pêşketina xwe bide nîşandin. Her wusa, bi vê re jî wê pêşketinên nû ên jîyanî wê bi aqilî wê hin bi hin derkevina li holê. Her wusa, aqil û pêşveçûnên di wê de wê, di vê demê de wê êdî wê zêdetir derkevina li pêş wê jîyane mirov rêya wê bidina nîşandin. Di vê çerçoveyê de pêşketina têgînên bawerîyî û hwd, wê bibê. Ol, wê weke rengekî hizrê ku wê mirovan di hizrekê û zanebûnê de wê bigihênê hevdû û wê şêwayekî civatî wê bi vê rengê wê bi xwe re wê di wê rengê pêşketina bajarwaniyê de wê pêşbixe. Her wusa, wê ev şêwayê hizir, wê mirovên ku ew bigirseyî li bajêr dijîn, wê li dora xwe bigihênê li hevdû. Bajarvanî, di vê çerçoveyê de wê bi pêşketina wê re di ahengekê de wê hizra bawerîyê jî wê derkeve li pêş.Herwusa, bi wê re jî wê li wê serdest bibê. Hizra bawerîyê, wê weke nîşanak û destpêka pêvajoyek nû bê. Her wusa, em dibînin ku wê di vê çerçoveyê de wê hizra bawerîyê, were pêşxistin. Hizra bawerîyê, aliyê wê yê derûnî ku ew bi hevdû re li hevdû digihênê hevdû jî wê hebe. Mirov, wê di vê demê de wê bi vê derûnîyê wê bixwezê ku ew bijî. Xwe bi wê derûnîya girseyî ku ew têgîn wê salix dike, wê xwe bihêztir hîs bike.

Pêvajoyên şariştaniyê, wê weke pêvajoyna teybet ên ku wê li ser aqil û pêşketina re wê pêşbikevin bin. Wê rastkirin, adilandin û kifşkirina wê bi aqil bibê. Pêvajoyên şariştaniyê ên li kurdistanê, wê her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê dîrokek pirr demdirêj a bi pêşketina şariştaniyê re wê dênê li ber me ku ew hildina li dest û fahm bikin. Jîyane pêvajoyên şariştaniyê, wê li kurdistanê, ji dema sûmerîyan û hwd ve wê destpê bike. Pêvajoyên şariştaniyê ên sûmerîyan, wê zû bidest pêşketina xwe bikin. Her wusa, nîşanakê wê wê heta ku wê destpêka pêvajoyên şariştaniyê li kurdistanê wê li dora neh û ankû heşt hezar salan re wê destpê bike. Lê hin bi hin kifşkirinên weke ên li xirabreşkê ku ew derdikevina li holê, vê dîrokê hê kevntir dibin.

Jîyane civakî, wê di pêvajoyên şariştaniyê de wê gav bi gav wê li ser aqil re wê pêvajoyên xwe yên pêşketinê wê bijî. Mirov, wê bi wê civatîtîyê, wê gava xwe bi pêş de biavêjê. Her dem, wê bi wê pêşketina civatî û şîroveyên ku wê bi aqil li ser wê re wê werina kirina re wê pêşketina xwe zêdetirî bi pêşde bibê. Em li vir, divê ku vê yekê werênina ser ziman ku wê piştî destpêka pêvajoyên şariştaniyê û hwd, wê êdî wê dem bi dem wê hanîna li ser ziman a aqil wê bibê. Aqil, hanîna wê ya li ser ziman, wê temenê kifşkirina rast û nerastiyên jîyane civatî jî bê. Bi wê re wê jîyane civatî, wê êdî wê pêşketina xwe wê bide dîyarkirin. Wê di vê çerçoveyê de wê têgînên olî û hwd, wê bi bawerî wê weyn û rolek mazin wê bileyizin. Piştî pêvajoya destpka şariştaniyan, wê di xate pêvajoyên pêşketina jîyane civatî a li kurdistanê û ankû li ber diclê û firatê de wê bi têgîn û bawerîyê re wê hizrên ´yazdanî´ wê derkevina li pêş. Hizrên yazdanî, wê hin bi hin wê zêdetir bin. Her kom, gund û ankû bajar wê yazdanên wê ên ku mirovên wê bi wê bawer dikin wê hebin. Kom û gund, wê zêdetirî vê kifş bikin. Wê her rewşekê yazdanekî wê kifş bikin. Rewşa salixkirinên bi yazdanî ên mîtolojiya sûmerîyan û hwd, wê vê rastiyê bi awayekî vekirî wê bide dîyarkirin. Bi wê re jî wê, li ser rengê jîyanê û her wusa hewldana fahmkirina destpêka jîyanê û hwd, şîroveyên ku wê werina kirin wê werina kirin.

Piştî pêşketina aqil, wê mirov di derbarê jîyan, xweza û destpêka jîyane û hwd de wê bike nava mereqê de. Bo vê yekê, wê li ser van rewş û xalên ku wê bina mijara mereqê, wê aqil li ser wan re wê bê meşandin. Her wusa di vê çerçoveyê de hewldana fahmkirina mirov, wê di temenê wê mereqa mirov de bê.Di vê çerçoveyê de wê dem bi dem mirovên ku wê derkevin û wê aqil li ser wan xalan werênina ser ziman wê hebin. Wê di vê çerçoveyê de wê, xalên ku wê bina mijara hewldana fahmkirinê wê

destpêka jîyanê ji kûderê bê, wê mirov cardin bijî piştî ku ew mir, wê dawîya jîyanê li kûderê wê destpê bike û hwd, wê, wê ev xal û nûqteyên ku wê li ser wan pirr zêde wê aqil were meşandin bê.

Ev rewşên ku wê bina mijarên jîyanê ên fahmkirinê, wê aqil jî wê li ser wan wê were fahmkirin. Şariştanî jî, ew a ku wê çendî ji van mijaran re şîrove hanî wê aqilê xwe pêşde bibê û wê xwe weke ku wê bi temen bike. Bo vê yekê wê hewldana gihandina van xalan li şîroveyekê wê bibê. Em dema ku wê mîtolojîya sûmeran li wê û li navaroka wê dinerin, em dibînin ku wê hewl bidin ku wê şîroveyê ji wê re werênin. Hewldana fahmkirina rewş û awayê dunyê bixwe jî wê bi sûmerîyan re wê hewl bê dayîn ku were fahmkirin. Sûmerîyan, bawer dikir ku ´dunya, weke tepsîyekê ya û mirov li ser wê dijî.´ Dema ku ji wan re hatiba gotin ku ´dunya gilover a´. Wê bigotina weke bersiv, wê hingî mirov ji ser wê bişamitê û bikeve. Ji xwe, di vê çerçoveyê de wê, hinek şîrove û gotinên wan jî wê hebin. Bi wê re ew devera ku mirov ji dunyê ket wê bikeve kûderê, li ser wê valahîyê jî aqil meşandina. Ew valahî, weke ´valahîya bêbinî´ hanîna li ser ziman. Em dema ku wê xate şariştanîyê a wê de ku em dihizirin, em dibînin ku wê di vê xatê de wê hin bi hin wê şîrove wê li ser şîroveyê wê werina kirin. Şîroveyên bawermendên yazdanî û ankû êzdayî ku wê bi meleke tawis re li ser afirîna jîyanê, dunyê û her wusa xwezayê ku ew dihênina ser ziman, wê rengê şîroveyên destpêkê ên di derbarê jîyanê, destpêka jîyanê, dunyê û her wusa feze û gerdûnê de bin. Mirov, wê van mijaran wê piştre wê pirr zêde wê li ser wan aqil bimeşênê. Aqilê xwûdê, wê were ser ziman. Her wusa, wê hertimî cihê herî fireh û ku wê dunyê û jîyanê jî bike nava xwe de wê bi aqilê xwûdê re wê were hanîn li ser ziman.

Ji dema sûmerîyan û bi vir ve ku li kurdistanê dem tê û dibûhûrê, wê hin bi hin wê di vê çerçoveyê de wê aqilên nû wê werina hanîn li ser ziman. Di serdemên qasît, gûtî û piştre di serdemên hûrî û mîtannîyan de wê, li ser van rewşan wê pirr zêde wê aqil wê were hanîn li ser ziman. Dem bi dem hanîna aqil li ser ziman wê li ser ya dema bûhûrî re bê û wê bi pergaltir wê were hanîn li ser ziman. Wê li kurdistanê, di dema sûmerîyan de wê, şîroveyna pirr zêde ku wê li hevdû bikin, wê werênina ser ziman. Piştre jî, wê di demên qasît û gûtîyan de wê li ser wan hizran re wê hizrên nû wê werênina li ser ziman. Gûtîyî, wê zêdetir bi aqil werênina ser ziman û wê bi hevdû re di ahengekê de wê bi teherî wê werênina ser ziman. Aqilê gûtîyan, wê weke aqilê felsefîkî bê. Wê bi wan

re zêdetirî aqilê ku wê navaroka wê û navenda wê gotinên weke gotinên ´gerdûnê´ û hwd wê li dora wan aqilê xwe wê werênina ser ziman.
Gûtîyî, wê zêdetirî li ser stêrzaniyê û her wusa hebûna jîyanê, û hwd wê werênina ser ziman.

Gutî, di dirokê de yek ji pêşiyê kurdan e li çiyayê Zagros û li kêlêka çemê Zap û zagrosê jiyan e, 2700 sal beriya zayînê, welat û desthilatdarîyek xort û serbixwe sazdikin û tênê heta Mezopotamya, lewre axa wir gelek xweş û bijun bû. Di sala 2649'an a pêşiya zayînê de hêrîş dibin ser sumer û akadiyan welatê akadiyan ji zevt dikin du qerna wan îdare dikin, peşe di sala 2400'î ya beriya zayînê de bi biraye xwe gele lololîyan re yekbunê çêdikin desthilatdarîya wan bi vî rengî gelek xort û pêşve diçe. Lê piştre li hember akadayî dîsa mexlûb dibin û diçin warê xwe yê kevn çiyayê Zagrosê. Piştre di sala 2270'î ya beriya zayînê de di dema keyê asûriyan Salmanasarê yekem de bi wan re şereki giran datinin. Navê keyê dawî yê gutiyan Tîrîgan bû. Guti dema wan de, serdestîya wan pirr mazin hebûya. Bi teybetî, li dora Çîyayê Cudî û heta ku digihişt ber Zagrosan serdestîya wan mazin hebûya. Ku dikeve bakûrê Şirnaxa Roja me de û ji Şîrnaxa Roja me 35 kîlometre dûr a ji navendê Bajarê dema berê bi navê "finîkê ku Mîrên kurd ên botan wê hertimî ji xwe re wir weke cihekî seyrangehê bihardihînin jî, kirmanên wir, ji dema wan in. Kirmanên bilind, peykelê mirovên li ser hasp sûwar û hwd, çend ji wan bermehîyên ku mana ji wê demê û hê jî li wir ku heyîna xwe diparêzên in.

Aqilê gûtîyan, wê weke aqilê şariştanî ê bi pergal bê. Gûtîyan, wê di dema xwe de wê li ser xweza, jîyan, gerdûn, feze,stêr û hwd,wê aqil werênina ser ziman.Bi wê re jî wê gelek mijarên din ên bi vî rengî wê mijara aqilê wan bin. Aqilê gûtîyan, wê di jîyanê de wê pirr-yazdanî bê. Lê di aslê xwe de wê di giştîya xwe de wê bi çerçoveyeka yek-yazdanî bê. Gûtîyan, di vê çerçoveyê de wê pergelek aqil wê pirr baş wê li dora gotina ´yazdan´ û ´xwûdê´ wê biafirênin. Bo vê yekê, ew pêvajoyên şariştaniyê ên dema sûmerîyan û hwd, wê weke pêvajoyên aqil ên bi şêwayê mîtolojikî bê. Sûmerîyan, wê di serdemên wan de wê dem bi dem û cih bi cih wê şîroveyên yazdanî wê werênina ser ziman. Lê di pêvajoyên piştre ên sûmerîyan de wê, ew şîrove wê bi demê re wê wê werina levhanîn. Bi wê rengê, wê şîroveyên ku wê werina kirin, wê werina levhanîn. Serdemên dawî ên sûmerîyan û ankû serdema duyemîn a sûmerîyan, wê di vê çerçoveyê de wê wê şîroveyên mîtolojikî wê pirr zêde wê werina hanîn li ser ziman. Ew yekkirina têgînî, wê piştre wê bê

temenê pêşketina desthilatdarîyên ku wê pêşî hemû bajarî bikê dest de û piştre jî wê, bi têgîna metingerî wê dest bê avêtin li bajarên din. Bi vê rengê têgîn yekkirinê, weke têgîneka metingerî wê ancamê derxe li holê.

Ev aqilê ku wê bixwezê ku wê di dest de bike yek, wê ancama wê aqilê hatî yekkirin bê. Piştre jî, wê ew bajar-welatek wê bê desthilatdarîya li hemû bajarên din. Bi vê rengê, şer û pevçûnên wê di serdemên dawî ên dema sûmerîyan de wê weke nîşanaka vê rastîyê bin. Piştre wê serdema qasît, loloyîyan û gûtîyan wê weke serdemên ku wê hin bi hin wê vê aqilê şariştaniyê wê bi rêxistin bikin bin. Her wusa, yazdanên dema qasît, loloyîyan û gûtîyan, çendî ku wê bi têgîna pirr-yazdanîyê jî bin, wê bi têgîhiştineka gelemper a gerdûnî wê xwe werênina ser ziman. Her wusa, wê di çerçoveyekê de wê ew yazdan hemû jî wê werina bicihkirin û bi wate kirin. Ev jî, wê were wê wateyê ku wê bi awayekî ku mirov hê bi tememî ne gihiştina têgihiştina wê jî bê, wê di çerçoveya bawerîyê de wê hemû yazdan, wê bi wasîf, erk û wateya wan re wê werina bicihkirin. Weke ku wê çawa, wê bi têgîna xirabûn û başbûnê wê hûrmûz û ahrîman wê werina xistin berhevdû di çerçoveyekê de. Li vir, wê gotina ´bawerîyê´ wê bikeve pêvajoya afirandina olek giştî a ku wê hemû yazdanan di nava xwe de wê bi wate û erka wan re wê bicih bike. Di mîtolojiya sûmerîyan de wê, têkiliyan yazdanan, wê bi weke bav, kûr û xizmtîya wan ya bi hevdû re wê were danîn. Ev rengê têkilîdanînê, wê bi şêwa û awayekî din wê were hanîn li ser ziman. Gûtîyan, wê li dora gotina yazdan, wê hemû werênina ser ziman. Gûtîyî, wê hema bêja wê bi awayekî olek yek-yazdanî ku wê navaroka wê tişî yazdan hatibê kirin bê. Gotina yazdan, wê bê danîn li ser hemûyan re. Wê bi wê re wê cihê yazdan wê li azmana wê li ser dunyê û yazdan û mirovên li dunyê re wê were danîn. Li azmana ya herî dijwar roj a û dunyê rohnî dike wê yazdan bi wê re werênina ser ziman. Gûtîyan, di vê warê de mirov dikarê bibêjê ku wê bi têgihiştînîya olî ya bi rengê felsefîkî ku ew dihê hanîn li ser ziman wê weke ku ew şoreşekê wê di dema xwe de wê bikin û wê bi wê re werênina ser ziman. Wê di çerçoveya bawerîyekê de wê bijîn. Bi wê re jî, wê ji yazdanên xwe yên ku ew bi xirabî jî tefsîr dikin wê boraqan bidin û ji yazdanên xwe yên ku ew başî tefsîr dikin re jî wê boraqan bidin. Ji wê jî weke ku em piştre ji avêstaya ku wê zerdeşt binivîsênê ku em ji wê dixwnin wê bêjin ´daēva.´Armanca wê, ew a ku wê bi boraqên ji yazdanên xirab re ku ew xwe ji xazaba wan rizgar bikin û ji yên baş re jî ku ew wan biparêzên ji xirabî û qaza û belayan.

Pêvajoya şariştanîyê a bi qasît-gûtîyan re wê weke pêvajoyek giring a biaqil bê. Wê bi wê re wê pergalek aqilî were afirandin û pêşxistin. Lê çendî ku ew bi vê rengê pergalek pirr zêde pêşketî bi aqil pêş dixin û şîroveyan bi wê li ser mirov,jîyanê,xwezayê,gerdûnê, fezeyê, stêrzaniyê, azmanan, binêardê û serêardê, dojeh û bihûştê û hwd, wê şîroveyên giştî wê pêşbixin jî, wê bi tememî wê ji xwezayê dûrnekin. Di serdema wan de wê, jîyane zozana a koçerîyê û ya deştê a cohtkarîyê û hwd, wê bi hevdû re wê di dema wan de wê bi hevdû re were dayîn domandin.

Î ro, em dikarin bibêjin ku wê gotinên weke gotinên ´zozana´ û hwd, wê di dema qasît-gûtîyan de wê werina bikarhanîn. Pişt wan re wê di dema hûrî û mîtannîyan de jî wê hebin û werina bikarhanîn. Di çand û zimanê kurdî de gotinên weke gotina ´zozana´, wê gotinên ku ew bi vê rengê wê bi pergal rengê jîyanê bi xwe re dihênina ser ziman bin. Pergale jîyane civatî li kurdistanê, wê di van deman de wê biawayekî bi aqil pêşketî û ku pêş dikeve, wê di rêya xwe de wê bide domandin. Jîyane civatî a li kurdistanê, hertimî di hemû pêvajoyên xwe yên şariştanî ên civatî de wê ji xwezayê û jîyane xwezayê qût wê pêşketinê bi xwe re çênekê. Wê hertimî bi şêwayekî wê jîyan bi xwezayê re wê were hizirandin. Ev rewşa pêşketina civate kurd a bi mejûya wê re wê mohra xwe li bawerîyên wê yên ku wê bi dîrokê re pêşbikevin jî bixe. Herwusa bawerîya êzdayî, di wê de cejnê serê avrêlê(´nîşanê´), cema şêx Adî û hwd, weke van wê gelek şêwayên pîrozkirinên bi xwezayê re bin. Wê cejnên weke cejna serê avrêlê, wê cejnên ku wê bi xwe re wê hewl bidin ku wê rêz û hûrmeta mirov li hemberî xwezayê ku ew pêşbixin bin. Jîyane civatî, wê di vê çeçoveyê de wê di dema qasît-lolo-gûtîyan de wê pêvajoyna demdirêj ên civatî wê bi xwe re bidina derbas kirin. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê, ol û bawerîya êzdayî a kurdistanî ya civate kurd, wê di dema qasît-lolo-gûtîyan de wê bi pergalî wê xwediyê pêşketinaka bi aqil bê. Di vê demê de em dibînin ku wê gûtîyî pirtûkxaneyan ji xwe re çê bikin û di wan de aqilê xwe yên ku wan nivîsandina bi nivîsarî û ankû bineterî wê di wan de tomar bikin. Di vê çerçoveyê de em vê yekê jî dibînin. Piştî wan re wê ev rewşa wan li herêmê wê bê minaq, minaq keyên aşîrî ên di sedsale 14´na de ku ew tên wê van rewşan ji xwe re weke ku wê minaq bigirin. Li kurdistanê, pêvajoyên pêşketina aqil, wê weke aliyekî ku em bigiştî di temenê pêşveçûnên şariştanî de werênê ser ziman bin. Bi civatî, wê ji van deman û pê de wê li kurdistanê di nava civate kurd de wê xwe li ser aqil re bi rêxistin bikin. Lê çendî ku wê xwe li ser aqil re bi vê rengê bi şêwayên

weke yên bi bawerîyê û hwd re wê bi rêxistin bikin jî lê wê, hertimî xweza weke aliyekî ku wê bi berxwe ve wê bikişênê bê. Bo vê yekê wê bi aliyekî mejiyê xwe re wê hertimî wê bixwezin ku ew bixwezê re bijîn. Lê bi aliyê din ve wê bixwezin ku ew wê şariştanîya ku ew pêşdixin jî bi ancamên wê re bijîn.

Li kurdistanê, wê pêvajoyên pêşketina civatî, wê di vê çerçoveyê de wê hertimî weke ku wê di nava xwe de wê nakokîyna biparêzên wê pêşbikevin. Her wusa, wê ev jî wê, di reng û şêwayê weke yê jîyane zozana û jîyane deştê û hwd de bê. Li kurdistanê, dema ku mirov hewl bide ku mirov civate kurd fahm bike, heta ku mirov bi mejûya wê re bi gotinên weke ´jîyane zozana´ û ´jîyane deştê´ re wê fahm nekê, mirov wê nikaribê bibêjê ku mirov wê fahmkirîya. Hertimî, dema ku mirov şîroveyekê li ser civate kurd pêşbixe, ji ber vê yekê, divê ku mirov wê şîroveyê hem ji aliyê gotina ´jîyane zozana´ ve wê hilde li dest û piştre jî ji aliyê gotina ´jîyane ´deştê ve wê hilde li dest. Bi vê rengê, tenê şîroveyek jî bê, wê herî hindik ji van herdû aliyan ve wê bi xwe re nêzîkatîkirinê ji mirov wê bixwezê.

Heta roja me, jîyane zozana ku ew bi jîyane koçerîyê´ re hatîya heta roja me bi pêşketina xwe re weke ku ew jîyaneka ´goçberî´ lê hatîya nerîn. Di çerçoveya hin aşîrên ku wê li herêmên asya ku wê cih û warê xwe bihêlin û wê hertimî herina deverên din û wê bixwezin ku wê bijîn ên goçber ve nêzîkatî hatîya kirin. Em li vir, divê ku wê dûbare binî xîz bikin û werênina ser ziman ku wê ti şîrove û teorîyên ku ew temenê wan li ser ´goçberîyê´ bê, wê ne karibin rastîya civate kurd werina ser ziman û ne jî wê karibin rastîya jîyane koçerîyê a li kurdistanê werênina ser ziman. Jîyane koçerîyê, weke pergalek jîyanî a bi têgîna neolîtîkî ku wê di dema pêvajoyên şariştanîyê de wê karîya xwe xwe bijî û bide jîyandin, mirov dikarê wê şîrove bike û werênê ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de destpêka vê pergale jîyane koçerîyê, wê heta heta serdemên neolîtîkê û berî wê li komên bi civatî ku ew pêşkevin û jîyane şîvanî li herêmê dijîn bin. Di vê çerçoveyê de wê jîyane koçerîyê, wê rastîyek dîrokî ya pirr kevn bi destpêka mirovatîyê û pêşketina mirovatiyê re wê bi xwe re wê bihawênê û biparêzê. Dema ku wê dem were pêvajoyên şariştanîyê li kurdistanê, wê di serdemên sûmerîyan û hwd de wê, ev jîyane civatî, wê bixwezê ku ew xwe bide jîyandin. Wê bikeve nava tekoşîna wê de. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê tekoşîna hebûnê bide. Şêwayê jîyane koçerîyê a bi xwezayê re wê li ser keda ku wê bidest jin û mêr bi hevdû re wê ava bike. Di vê demê de wê kifşkarîya jinê weke ku

mirov wê kifş dike wê bi wê re wê zêdetir bê. Ji aliyê jinê û rastîya wê ve li jîyanê dihê nerîn. Ber vê yekê, wê zagonên wê yên ku wê werina nivîsandin jî wê di vê çerçoveyê de bê. Zagonên lipît îştar ku wê çendî bi demê re wê hin bi hin wê hin gûharînna jî wê bi xwe re wê derbas bikin jî lê wê, li gorî ve rastîyê bin di nava pêvajoyên jîyane şariştanî ên ku wê pêşbikevin de.

Yazdanên jin, wê di vê demê de wê mohra xwe wê li rengê jîyan, têgîn û dîroka herêmê bixin. Ev jî, wê bi wan re bê. Her wusa, ev rewş, wê weke rewşek teybet bê. Di nava ol û bawerîyên kurdistanî de wê jin, hertimî wê aliyekî pîroz wê bi xwe re wê di nava wan de wê werênê ser ziman. Mirov nikarê, weke ku di roja me de dihê kirin, tenê wê bi hin şîroveyên mîtolojikî re werênê ser ziman. Li vir, her wusa, ev rewşên jîyane civatî ên bi civate kurd re ku wê jinê weke nirxekê pîroz bibînê, wê hertimî xwe bide dîyarkirin. Hertimî di parastgehên berê ên bawerîyên kurdan de wê jinek ku wê bi gotina xwe re wê rastîyê bide dîyarkirin wê hebe. Heta ku ev rewş, wê bi ola êzdayî re wê di cihê wê yê pîroz ´laleşê´ de wê heta roja me jî wê were. Ev rewş tenê bi serê xwe wê gelek rastîyan ji me re bide vegotin. Her wusa bi wê re di dema wê de em divê ku vê jî werênina ser ziman ku wê di nava civate kurd de wê ´kevneşopîya hemawîyê´ wê weke kevneşopîyek jina kurd a pîroz bê ku wê bi civate wê re daya domandin. Her wusa, bi wê re wê jina kurd, di nava civate xwe de wê ya hertimî ku wê xwediyê gotina dawî bê. Yanî, bi gotinaka din wê xwediyê gotina kifşkar bê. Piştî destpêkirina pêvajoyên şariştanîyê, wê ev rewş, wê xwe bidina domandin. Minaq, dema ku wê du aşîrên kurd wê werina ber hevdû ku wê bihevdû re şer û pevçûnê bikin û ku jinek kurd çû û di nava wan de sekinê û hemawîya li serê xwe di nava wan de avêta ardê, wê hingî herdû alî jî wê dev ji hêrs û pevçûna xwe ya bi hevdû re bikin. Ev wê weke rûmetekê bê ji wan re. Yek ji wan aliyan jî wê nikaribê li hemberê vê destûra pîroz bisekinê û bibêjî na. Herkesek wê herê bike. Ber vê yekê, bi destûra xwe ya pîroz, wê jina kurd, wê di nava civate kurd de wê hertimî bê weke ya ku wê aramî û aşîtîya navxweyî ku wê parastîya bê.

Em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman wê ev destûrên pîroz ên civatî ên civate kurd ku wê rastîya jina kurd di nava civate wê de werênina ser ziman, wê di demên qasît, lolo, gûtî û naîrî, hûrî û mîtannîyan de jî wê xwe bide jîyandin û domandin. Mejûya civate kurd, bi dîroka wê re dema ku mirov wê dike ku wê hilde li dest û fahm bike,

wê bi fahmkirina pêvajoyên wê yên bi pêşketina civatî re wê van aliyan bi awayekî vekirî weke rastîyên wê raxê li berçavan.

Pêvajoyên şariştanîyê ku wê ji serdema sûmerîyan wê bi ber roja me ve werin, wê hin bi hin jîyane civatî wê bi ast, rada û pîvana wê re wê pêşbikeve. Rastîya civatî, wê li kurdistanê, wê pirr zêde wê pêş bikeve. Em î ro, bi ewla û êmînî dizanin ku wê li kurdistanê di serdema sûmerîyan de wê nivîsandin wê were kifşkirin û pêşxistin. Di aslê xwe de wê, demên sûmerîyan, ji ya ku em î ro dizanin di derbarê wan de wê zêdetirî kevntir bê. Her wusa, hin bi hin jî nîşanakên ku ew derkevina li holê, wê di vê temenê û çerçoveyê de bin. Pêvajoyên jîyane şariştanî n piştî serdemên sûmerîyan ku wê bi qasît, lolo, gûtî û hwd re li kurdistanê bi civate kurd re wê xwe bidina domandin, wê weke dem û pêvajoyna şariştanî ên ku wê bi aqilê pêşketî û rêxistinkirî ku wê pêş dikevin bin. Pêvajoyên piştre ku wê bi civate kurd re li kurdistanê bi gûtî, hûrî û mîtannîyan re wê xwe bidina domandin, wê pêvajoyna ku wê bi aqilê pêşketî bin. Bi gotinaka din wê weke ku di roja me de dihê hanîn li ser ziman, wê bi rengê pêşketina aqil ê ´felsefeyê´ bê. Di serdema hûrî û mîtannîyan de têgînên kes û têgînên filosofîkî ên weke melekê tawir û mîtra û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê pirr zêde wê watedar bin. Mîtra, wê pergelek olî ya pirr zêde bi aqilê felsefîkî pêşketî wê birêxistin bike. Wê şêwayekî wê yê hemdem wê pêşbixe ku wê bê malê gelek xalk û bawerîyên li herêmê jî.

Bi wê re jî, divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê jîyane civatî, wê di vê çerçoveyê de wê li ser têgînên aqilî re wê werê bi rêxistin kirin. Mirov, wê bi aqil li jîyane xwe binerê û wê pêşbixe. Her wusa, nivasarên têgînî ên ku wê weke ku mîtra dihênê ser ziman, wê piştre wê bê mal û temenê pêşketinên hizirkî, felsefîkî, bawerîyî û civatî jî li herêmê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê di çerçoveyek civatî wê were hanîn li ser ziman. Aqil, wê bidest rêxistinîya jîyanê bike. Lê aqil, çendî ku wê di nava xwe de wê pêşketinê çê bike, wê bi heman rengî wê di nava civatê de jî wê çê bike. Hanîna hizir li ser ziman, wê temenê pêşveçûnên civatî û aqilî ên bi demê re jî wê bi xwe re biafirênê.

Pêvajoyên civatî wê li kurdistanê, piştî serdema hûrî û mîtannîyan, wê wê bi awayekî hemdem wê hebûna xwe bide domandin. Em dikarin, ji gelek aliyan ve pêşketina dema hûrî û mîtannîyan bi aqilî ji ya roja me ya sedsale 21´ê jî pêşketîtir werênina ser ziman. Ji aliyê têgîna civatî û felsefîkî û hwd ve wê serdema me ya sedsale 21´ê jî wê hê neçûbê li pêşîya ya zanîna serdema hûrî û mîtannîyan. Em î ro, ku li reng û şêwayê

pêşketina roja me ku wê ast, rada û pîvana wê dinerin, em dikarin vê yekê bi awayekî bi rehetî werênina ser ziman. Hûrî û mîtannîyan, wê serdemek civatî ya bi hezaran salan wê bi pêşketina wê re wê dîyarî hemû mirovatiyê bikin. Lê bi wê re jî em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê serdema civatîtîya hûrî û mîtannîyan, wê piştre wê bi demê û dîrokê re wê rastî hêrîşên mêtingerî werê. Ya ku wê, wê xate pêşketina civake dîrokî ya hûrî û mîtannîyan ku ew ji demên sûmerî, qasît, lolo, gûtî, naîrîyan û hwd ku wê heta wê demê wê bijî, wê bikeve bin pêvajoyên hêrîşan de. Ev pêvajo, wê bê weke pêvajoyeka ku wê hebûna civakên dîrokî wê bê xistin bin pêvajoyên hêrîşan û bi wê re tûnakirinê de jî. Ya ku wê pişte mohra xwe li dîroka civakan wê bijî bi hebûna serdestîya desthilatdarîyên ku wê bi demê re pêşkevin jî li herêmê wê ev bê. Piştî dema hûrî û mîtannîyan wê dema medîya, ji vê aliyê ve wê li kurdistanê bi pêşketina wê re weke demek ku mirov divê ku wê ji pirr aliyan ve hilde li dest û fahm bike bê. Temenê pêşketina serdema medîya li herêmê, wê li ser nirx, pîrozî, mejû û dîrokîya ji dema sûmer, qasît, lolo, naîrî, gûtî, hûrî û mîtannîyan bê. Di vê xatê de wê hevgirtineka civakî wê bi pêşketina medîya û civatîtîya wê re wê li herêmê derkeve li holê. Yê ku wê bi hizrên xwe yên ku wî hanîna li ser ziman wê temenê vê pêşketina civatîtîya medîya çê bikê jî wê zerdeşt bê. Zerdeşt, hizrên wî yên bi avêstayî wê temenê wê pêşketinê di serdemên hemdem de wê bide afirandin. Ew pêşketina ku wê piştî hûrî û mîtannîyan wê bi medîya û civatîtîya wê re wê bi têgînên avêstayî re wê biafirê, wê piştî wê re jî wê bi serdemeka nêzî hezar salî re wê hebûna xwe bi pêşketina xwe re wê bide domandin.

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê serdema hûrî û mîtannîyan, weke serdemek pêşketî bê. Wê weke serdemeka ku wê bi aqil felsefîkî ku wê xwe bide pêşxistin bê. Zane û filosofên weke mîtra û hwd wê pêşavaniyê ji wê demê re bikin. Di serdema şariştaniyê de wê, her wusa, aqil, bi hanîna wê ya li ser ziman re wê bidest kifşkirina di jîyanê de wê bike. Bi wê re divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê serdema hûrî û mîtannîyan wê weke serdemek dîrokî ya pêşketî bê. Em li vir, divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê pêşveçûnên piştre ên civatî, wê destpêkeka wan ya biaqil û hwd, wê ji serdema hûrî û mîtannîyan wê hebe. Di vê çerçoveyê de em dema ku serdema xwe ya ku wê bi aqilê felsefeyê pêşdikeve ku em bikin ku wê şîrove bikin û fahm bikin, em divê ku wê serdema hûrî û mîtannîyan baş fahm bike. Serdema hûrî û mîtannîyan, wê pêşveçûnên dema qasît, lolo û gûtîyan jî di xwe de

wê şîrove bike, ji wan hevgirtinekê derxe û wê bi wan re temenê xwe bide çêkirin û pêşxistin.

Serdema hûrî û mîtannî, wê di vê çerçoveyê de wê ji aliyê civatîtîyê ve wê temenekî baş ji hebûna civatî re. Piştî hûrî û mîtannîyan re wê pêşveçûnên civatî ên ku wê bibin, wê pêşveçûnên dema hûrî û mîtannîyan ji wan re jî bê temenek. Piştî hûrî û mîtannîyan re wê hem li kurdistan û dervî kurdistanê wê pêvajoyên civatî wê destpê bikin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de wê li ser wê temenê wê pêşveçûn bibin. Piştî serdema hûrî û mîtannîyan wê li herêmê li kurdistanê wê xate pêşketina civatî wê hebûna xwe bide domandin. Lê vê carê, wê li ser aqil re wê bide domandin. Her wusa, serdema Medîya a piştî serdema hûrî û mîtannîyan re wê weke serdemeka ku wê bi aqilê felsefîkî wê xwe li herêmê bide afirandin û pêşxistin. Di aslê xwe de piştî serdemên civatî ên dema medîya, wê bo serdema me ya ku em di wê de dijîn wê weke destpêkekê bê. Ji vê aliyê ve divê ku mirov wê hilde li dest.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê baş fahm bike ku wê serdema medîya, wê piştî hûrî û mîtannîyan re wê derkeve li pêş. Piştî wanqas hêrîş û pevçûnên ku wê li ser ava hûrî û mîtannîyan ku wê bi wan re werina kirin, wê desthilatdarîya wan û herêmên wan weke ku wê werina kavil kirin. Ji rewşek bi vê rengê pêşketina medîya, wê hem ji aliyê têgînî ve weke têgîneka nû bê û hem jî ji aliyê xwe afirandina ji nû ve a li demê ve wê weke pêvajoyek nû bê. Desthilatdarî, piştî ku ew pêş dikevin, wê hebûna xalkan ji xwe re weke telûke wê bibînin. Dema ku ew ne li gorî desthilatdarîya xwe hebûna xalkekî bibînin, wê ji xwe re mubah bibînin ku wê xalkê jî bi hebûna wê re ji dîrokê bibin. Ev rengê pêşketina desthilatdarîyê ku wê bi awayekî dijmirovî wê hebûna xwe ji deman bi bûhûrandin li deman, wê dîroka xalkan jî weke dîrokek şer û pevçûnan wê bide nîvîsandin.

Di dema medîya de wê weke ku ew çawa ku wê di dema mîtannîyan de wê derkeve Mîtra, wê piştî wî re li ser şopa wî û xate yazdaniyê wê Zerdeşt wê derkeve li pêş. Zerdeşt, wê bi hizrên xwe yên ku ew bi pirtûka xwe ya bi navê ´avêsta´ re ku ew dihênê ser ziman re wê dîrokekê ji nû ve bi civatîîtîyê re wê li herêmê bide nivîsandin. Her wusa, wê civatîtîya piştî wê demê wê çawa bê û wê xwediyê çi rengê pêşketinê bê, wê zerdeşt wê temen û rengê jî wê weke ku ew werênê ser ziman. Medîya bixwe bi civatîtî û desthilatdarîya wê re wê weke ancamaka têgîn û têgihiştina hizrên zerdeştîyê ên di avêsta de ku ew dihênê ser ziman bê. Piştî Medîya-zerdeşt-avêsta re wê serdemeka nêzî hezar salî wê bi hizir û

pêşketina zerdeştitiyê û xate wê re wê were bûhûrandin. Bi demê re wê ´civatên avêstayî´ wê biafirin. Rastîya zerdeştîtîyê wê li herêmê dîrokê bi xwe re bi sedsalan wê bide nivîsandin. Piştî Zerdeşt-avêsta-medîya re wê li herêmê pêşveçûnên civatî û felsefîkî û hwd ên ku wê bibin, wê ji gelek aliyan ve wê wî û hizrên wî û pêşketinên ku wê di ancama jîyankirina li gorî zerdeştitîyê de ku wê bibin, wê ji xwe re bikina temen. Piştî Zerdeşt-avêsta-medîya re wê bi heştsad salî piştre wê Manî derkeve. Manî, wê li ser şopa wî derkeve. Manî, wê civatîtîya Zerdeşt-avêsta-Medîya bi hizrên xwe derxe astek, radeyek û pîvanek hê bilindtir.

Ev pêvajoyên ku wê bi aqil û zanebûnê re wê temenê xwe çê bikin û wê destpêkan bi xwe re bidina destpkirin, wê giring bê ku ew d destpêkê de ew xwediyê aqil û zanebûnek rast bin. Zerdeşt bixwe di destpêkê de dihênê ser ziman ku ´wê aqilê rast tevger û gotina rast bi xwe re bênê.´ Bi vê yekê, ew destpêkê giring dibînê û wê dihênê ser ziman. Giringiya ku Zerdeşt daya jîyane civatan, xalkan û her wusa xwezayê, wê xwe bi felsefeya wî re jî wê werênê ser ziman. Zerdeşt, wê xwediyê aqilek, zanebûnek û felsefeyek rast bê bo mirovatiyê.

Piştî Zerdeşt re wê Manî, di vê çerçoveyê de wê bi heman rengê wê weke destpêka pêvajoyekê bê. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku wê Manî, li gorî pergalek civatî ya ku ew bi aqil hatîya tefkîrkirin û hizirîn, wê li navaroka civatê bi zanebûnê re wê bihizirê. Piştî Manî re wê li kurdistanê zane û filosofên ku wê bi hizira civatî wê derkevin, ên weke Mazdek, Hûrem, babek û hwd wê derkevin. Piştî wan re jî wê li kurdistanê di çerçoveya hebûna civatî û pêşketina wê de li ser wê xate civatî û domandina wê êdî zaneyên civatî wê derkevin. Minaq, piştre zaneyên civate kurd ên li kurdistanê ên weke Şêx Adî, siltan Sahaq û hwd wê derkevin. Wê di şopa wan de jî wê gelek zane û mazinên civatê wê derkevin. ..

Li vir, em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku wê jîyane civatî li kurdistanê wê ji destpêka pêvajoyên şariştaniyê û heta vê demê, wê hertimî rastî mudahaleyên ku wê li hebûna wê bên kirin wê rastî wan were. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî bi awayekî başî werênê ser ziman ku ji serdemên şariştaniyê û heta vê demê, wê dem bi dem şer û pevçûn li ser axa kurdistanê ên ku wê li hemberî civate kurd û civatên din ên herêmê ku wê bidestê desthilatdarîyan wê were meşandin, wê dawî li wan newê. Di dema sûmerîyan de jî ev bûya. Piştre di dema qasîtan de, di dema lololiyan de, di dema gûtîyan de, di dema naîrîyan de, di dema hûrîyan de, di dema mîtannîyan de û her wusa di dema medîya û

piştre jî ev wusa domiya ya. Civate kurd û her wusa civatên herêmê, di nava wan herîşan de karîna ku ew hebûn xwe bidina domandin û werênina heta vê demê.

Piştî serdema medîya, wê li kurdistanê wê serdemên nû ên civatî wê destpê bikin. Li kurdistanê, weke ol û bawerîyên civatî n bi sedsalan, wê olên yek-xwûdayî ên yazdanî wê werin û pêşbikevin. Weke çawa melek tawîsîtî, hizrên olî ên berî wî, piştî wî Mîtra û mîtrayîtî û piştre Zerdeşt û zerdeşteyîtî û heta ku wê bigihijê ola êzdayî a serdema şêx Adî û hwd, wê di vê çerçoveyê de wê bibê. Piştre jî, li herêmê ku wê ji vê yek-xwûdayîya yazdanî sûd bigirin, yek-xwûdayîyên semewî w pêşbikevin. Bi wê re cihûtî, mesîhî û piştre îslamî jî wê wusa bin. Her wusa, ev hizir û pêvajoyên bawerîyê, wê bi teybetî wê hertimî şern û pevçûnna wan ên li herêma kurdistan û mesopotamya ên bi xalkan re wê hebin. Çendî ku ev bawerî bixwe jî wê bi temen û hîmê xwe wê ji wê xate yek-xwûdayîya yazdanî û herêma wê kurdistanê û ankû bi navê wê yê din mesopotamiya, wê ev xat û herêm wê bina armanca hêrîşên ku ew li wê xatê û herêmê ku ew birêxistin dikin werin. Her wusa wê ev xate civatî a li kurdistanê a bi hezaran salan a dîrokî, wê hertimî rastî hêrîşan were. Pêvajoyên hêrîşên bi şêwayên bişavtinê û ankû bi rengên hêrîşên fizîkî wê, hertimî li wê xate civatî a dîrokî a kurdistanî were. Her wusa piştî hatina ola îslamê, hêrîşên wê yên li ew li ser wan hêrîşên ku ew li ola êzdayî re ku ew li civate kurd û kurdistanê dike û piştre jî rejim û desthilatdarîyên herêmê ên weke yên sefewî û osmanîyan û hwd ku ew hertimî li hebûna civate kurd pêşbixin û bi demê re bidina domandin, wê di vê çerçoveyê de weke hêrîşên xadar û zalimane ên ên bi armanca tûnakirina civate kurd bin. Piştî wan re rejim û desthilatdarîyên ku wê di dema wan de werina avakirin ên weke yên weke îran, tirkiya, îraq û sûrî, wan pêvajoyên herîşên zilamanê û bêahlaq ên li hebûna civate kurd wê bidomênin. Bi vê re jî divê ku mirov vê yekê jî werênê ser ziman ku ev hêrîşên bi armanca ji dîrokê birina hebûna civake kurd a dîrokî li kurdistanê, wê di sedsale 21´ê de jî wê li berçavê hemû cihanê wê bidomê. Wê rejimên herêmê ev civake dîrokî ku em dîroka wê ji destpêka pêvajoya şariştaniyê li herêmê destpê dike, wê hebûna vê civatê li berçavê hemû cihanê wê bidomênin. Her wusa, şerê jenosîdkirina vê civake kurd a dîrokî, wê bi rejimên herêmê ên weke rejima tirk re wê li berçavê hemû cihanê wê heta sedsale 21´ê 2016´an wê bidomê. Em nûha, dîroka civake kurd a dîrokî ji destpêka pêvajoyên şariştanîyê û berî pêvajoyên şariştanîyê ji dema neolîtîkê û heta dema me ku em nivîsênin, em dîroka civatek ku ew wusa

xwedîyê dîrokek kevn a û ku ew di bin pêvajoyên jenosîdkirina hebûna xwe de ya em dihênina ser ziman.

Abdusamet Yigit, kurdistan, Cizîra bota, 2016.

……………………….
……………